# Rewan

**Dilawerê ZENGÎ**

# Rewan

**(Gotar û Lêkolîn)**

**Mafê çapkirin û belavkirinê parastî ye**

Navê pirtûkê: Rewan (Gotar û lêkolîn).

Daner: Dilawerê ZENGÎ

Pêşgotin: Dilovanê Deştê

Kombiyûter: Şengo Dumilî.

Derhêner: Royar ZENGÎ.

Rojavayê Kurdistanê-Qamişlo

Çapa Yekemîn

2017

*Diyarî*

***Ji bo giyanê bavê min ê gorbuhiştî 'Ismaîlê Mihemedê Emê' yê Dumilî***

***Ji bo giyanê diya min a gorbuhiştî 'Dayka Pakrewanan' Ferîda Elî re***

***diyarî û pêşkêş dikim.***

**Dilawerê Zengî**

**Qamişlo - 2017z 2629k**

# Pêşgotin

Dîroka Kurdî di dirêjaya xwe ya bi hezarên salan de, ji zengîntirîn dîrokên netewan e. Ew di pir qonaxan re derbas bûye. Bi sedan şahî û serkeftin, wiha jî şîn û xemgînî bi ser netewa Kurd de hatine. Her bûyerek bûye bingeh ji mifadarî û sûdewergirtinê re. Di encamê de, di her qonaxekê de kesin bejinbilin û payedar, helbestvan, çîroknivîs, rewşenbîr, ronakbîr, nivîskar, ... HWD, di nav netewa Kurd de rabûne; lê, kesayetiyên ku bi bêhtir ji erkekî ji van radibûn, û pênûs û mejî bi hev re dikirine heval pir kêm bûn.

Belê, kesin navdar mîna Melayê Cezîrî, Ehmedê Xanî, malbata Bedirxaniyan, Erebê Şêmo, malbata Celîlî, Wezîrê Nadir, Hacî Qadirê Koyî, Cigerxwîn, Namî, Tîrêj, ... hd, rabûn û roleke girîng di şiyarkirina miletê Kurd û bilindkirina hestên netewî de lîstin. Lê, ji salên heftêyan û vir de, kesên ku bi hişê xwe rewşenbîr, û bi xameyên xwe ronakbîr in, yên ku xwedî pênûsên azad, û xamebazên nelayangir in,

ji hemî qonaxên berê hindiktir in. Hêja ye em zanibin ku, nivîskarê gewre û bejinbilind Dilawerê Zengî yek ji van hindikan e. Lê gelo, Dilawer kî ye?

Navê wî İbrahîm e; ew kurê İsma'îlê Mihemedê Emê yê Dumilî ye. Mihemedê Emê – bapîrê İbrahîm – pir zengîn û dewlemend bû. Ew serwerê êla xwe bû. Mihemedê Emê ji Bakurê Kurdistanê, gundê Qewmik, parêzgeha Sêrtê ye. Ji ber dijwariya şerê di navbera Rosiya Qeyser û Turkiya Osmanî de, bapîrê Dilawer (Mihemedê Emê) ji welatê xwe, ser sînorê Rosa, bi êla xwe ve ber bi Başûr ve koçber dibê. Di rêya penaberiyê de, diz û neştelcî mal û mewdanê Mihemedê Emê bi tevayî talan dikin. Diya Îsma'îl di ava Dicla de, û bavê wî li Wêranşarê jiyana xwe ji dest didin. Bavê Dilawer û birayê xwe qonax bi qonax, rêya xwe ya penaberiyê berdewam dikin ta ku li binya xetê, li Amûdê bicih dibin. Diya İbrahîm Ferîda qîza Eliyê Heskê ye. Ew jineke jîr û zana, welatparêz û merovhez bû. Ev xeyset jî di şewata sînema Amûdê de baş têne xuyakirin.

Di Mijdara sala 1960-î de, şewata sînema Amûdê bi sedan zarokên bêguneh di nav agirê xwe de veşartin. Ji qedera malbata İsma'îlê Emê bû ku, YADÊ FERÎDA bêhtir ji 10 zarokan ji êgir riha bikê, bêyî ku li zariwên xwe bipirsê, çunkî di baweriya wê de, hemî zarokên Amûdê yên bê guneh zariwên wê ne. Ji ber vê jî ew bi navê DAYKA ŞEHÎDAN tê binavkirin, û herkesî jê re digot: YADÊ. Di encama vî agirî de, kurekî YADÊ FERÎDA di nav koma pakrewanan de jiyana xwe ji dest didê, û yê dî demeke dirêj dimênê dîlê birînên wî agirê bê dil û bê hest.  Lê, piştî heşt mehan, bûna İbrahîm hinekî dilê wan şa kir.

Hêja ye em zanibin ku, helbestvanê gewre yê gorbuhişt Seydayê Tîrêj navê (Dilawer) ji İbrahîm re pêşinyar dikê. Bê dudilî, İbrahîm jî vî navî dipejirênê. Piştî xwendina xwe ya seretayî û navendî li Amûdê bidawî dikê, û ji ber sedemên hejarî, belengazî û xizaniyê, İbrahîm ji dibîstanê dûrdikevê. Di sala 1979ê de, bavê İbrahîm koça dawî dikê û diçê ber dilovaniya Xwedê. Wiha jî barekî giran dikevê ser milê Dilawer. Du salan

mamostetiyê li dibîstanan dikê. Lê, mixabin ku bi mûçeyê xwe yê mehane nikarîbû malbata xwe xwedî bikê. Ji ber vê yekê, İbrahîm, weke piraniya xortên Kurd, ji bo kar berê xwe didê bajarê Şamê. Li zangoya Şamê dibê karmend, û 8 salan di vî karî de berdewam dikê. Lê, destdirêjiya (Şaxên Ewlekariyê) yên rijêma Sûriyê pir asteng di pêşiya wî de didanîn da ku nikaribê kirasê hejarî û belengaziyê ji xwe dûr bikê. Wan navê wî weke (kesekî metirsîdar) di nav lîsteya kesên dijwelat de danîn, û bi sebareta vê yekê jî, karê wî ji dest digirin û ew bêkar dihêlin. Ji xwe, ev behaneya binçavkirina her merovekî Kurd bû, nexasim kesekî xebatkar weke Dilawer.

Ji aliyê binyata civakî û êldariyê ve, ev hinek ji kurtejiyana İbrahîmê Emê û malbata wî bû. Lê, malbateke wî ye dî hebû, ew jî ya wêjeyî bû. Dilawer di gasîna wêje, çand û rewşenbîriyê de xwedî jiyaneke piralî ye. Lê, ka em vê pirsê bikin: Gelo, çawa Dilawer ev rê ji xwe re pejirand? Piştî bavê wî koça dawî dikê, Dilawer û malbata xwe di jiyaneke pir zor û dijwar re

derbas dibin. Rojekê diya wî çend gotinan jê re dibêjê û didê xuyakirin ku du kes di civaka me de binavûdeng dibin û dibine cihê rêzdariyê: Kesê dewlemend û yê rewşenbîr. Dilawer jî baş tê digihê ku ew nikarê bibê yê pêşî; lewra wî berê xwe da rêya rewşenbîriyê... rêya çand û wêjeyê. Ev şîreta YADÊ FERÎDA bandoreke balkêş li hiş û mejiyê wî dikê.

Rêya Dilawerê Zengî ye dûr û dirêj di nav bax û gulistanên çand û wêjeya Kurdî de ji Amûdê, û li ber destê Şêx Sedredînê Bavê Kal dest pê dikê, nemaze di warê xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî de. Şêxê welatperwer Sedredîn bandoreke balkêş li kesayetiya wêjeyî ya Dilawer dikê, nemaze piştî seydayê nemir Cigerxîn û helbestvanê hêja seydayê Tîrêj pê didê naskirin. Ji cem van hersê lehengên çand û rewşenbîriya Kurdî, Dilawer dest bi xwendina wêje û helbesta Kurdî ya Klasîk dikê; lê, di heman demê de jî wî jibîr nedikir ku, nûjenî û nûkirin beşekî sereke ye, nexasim di helbestê de.

Dûrketina Dilawer bi wî awayê neçar ji dibîstanê kuleke mezin di dilê wî de dihêlê, û ew pir xemgîn dikê. Lê, wî xwe radestî bêhêvîbûnê nekir, û dest bi xwendina pirtûkan kir. Dilawer dema xwe ya vala, nemaze piştî dûrxistina wî ji kar, bi gera di navbera pirtûkxanan de, û xwendina pirtûkan derbas dikir, nemaze yên li ser dîrok, wêje û zimanê Kurdî. Lê, ew baş tê digihê ku xwendina wêjeya cîhanî jî pir girîng e, lewma xwe jê bêpar nehiştibû.

Dilawerê Zengî bi dehan berhemên nirxbilind û sûdar bi herdu zimanên Kurdî û Erebî li pirtûkxana Kurdî zêde kirine. Çîrokên wî ji jîwer û jiyana Kurdî ya rojane hatine hûnandin; kurteçîrokên di pirtûka (Berî Heyv Hilê) de hin nimûne ne ji payebilindiya pênûsa wî. Xebata wî di fêrkirina zimanê Kurdî de xebateke balkêş û xuya ye. Birêz Dilawer di vî warî de ne tenê nivîsiye, lê belê wî bêhtir ji pirtûkekê li ser ziman û rêzimana zimanê Kurdî wergerandiye, weke nimûne Gramêra Zimanê Kurdî (Kurdmancî), ya nemir Celadet Alî Bedir-Xan. Wergerandin di navbera herdu zimanên Kurdî û

Erebî de jî li cem Dilawer cihekî pêwîst girtiye. Dilawerê Zengî bêhtir ji dîwanekê, û bi dehan helbest ristine, û dîwana wî ya pêşemîn ku di sala 1985ê de weşandiye (PÊDARÎ) e. Ew cîhaneke taybet di nava baxên helbestên xwe de ava dikê, û hestên xwe di naveroka wan de bi hosteyî li ber xwendevanan dideynê.

Dilawer di demeke pir kin de gelek helbestvan, ronakbîr, rewşenbîr, wêjevan û torevanên klasîk yên navdar û welatperwer nas dikê, weke Yadê Rewşen Bedir-Xan, Apo Osman Sebrî, seydayê nemir Cigerxwîn, seydayê Tîrêj, Bêbuhar (Yûsiv Berazî),.... hd. Rast e, wî pir sûde ji ger û geşta bi wan re wergirtiye, lê di heman demê de jî, wî berhemên wan didane çapkirin û belavkirin, da ku li ber destên her xwendevanekî Kurd bin. Ji aliyekî dî ve, ew bandoreke mezin li jiyana wî ya ramyarî û wêjeyî dikin. Ev yek di gotarên wî yên ramyarî de baş zelal e. Ev pirtûk (Rewan) jî yek ji encamên vê têkildariya wî ji nêz ve bi wan lehengan re ye.

Di navbera bergên (REWAN) de, Dilawerê Zengî hewil didê ku jiyana miletê Kurd ji aliyê wêjeyî, ramyarî, çandî, civakî û siyasî ve zelal bikê. Bêguman, wî karîbû di çend gotaran de, bi gotinine xweş, şêweyekî hêsan û awakî rastgo qonaxeke balkêş ji dîroka miletê xwe li ber çavên me deynê. Di şirovekirin û ravekirina jiyan, berhem, xebat û têkoşîna hin ji serwerên navdar di civaka Kurdî de, ji dawiya sedsala 19ê û vir ve, Dilawer li ser pirsgirêk û nexweşiyên miletê Kurd radiwestê, û li gorî bîr û baweriyên xwe çareseriyê jî ji wan re destnîşan dikê. Bi şêweyekî torevanî, wî hin kesayetiyên bejinbilind (Mîr Celadet Bedir-Xan,Osman Sebrî, Qedrî Can, Rewşen Bedir-Xan, Seydayê Tîrêj, Hesen Hişyar ê Serdî, Yûsuf Berazî (Bêbuhar) û Isma'îl Umer) di vê pirtûkê de civandine, û beşdarî û bandora wan di avakirina civakeke zana û pêşketî de baş daye xuyakirin.

Di pirtûka xwe (REWAN) de, Dilawer xwendevanên Kurdiyê ji bîr, bawerî, hizir û ramanên xwe bêpar nehêlane. Di vê derbarê de, ew bi hestekî berpirsiyar li ser têkildariya di

navbera ronakbîriyê û siyasetê de rawestaye. Ev jî di gotarên (Ne Dikin û Ne Dihêlin Em bikin, Rûpelin Winda 1927 – 1957, Danasîna Komela XOYBÛN-ê) baş zelal e. Ji bilî vê jî, di nava du gotarên nirxbilind de, ew li ser pêwîstiya zimanê Kurdî û bandora wî di xwenaskirin û xwepêş-xistina miletê Kurd û serkeftina wî de radiwestê û zelal dikê.

Dilawerê Zengî ne tenê helbestvan e; lê belê, ew wêjevan, çîroknivîs, wergêr, dîroknivîs, zimanhez, şirovekar û ravekar e jî. Ew axêverekî payebilind e. Di baweriya min de, çendî li ser kesayetiya Dilawerê Zengî bête nivîsîn qet wê ne hemberî xebata wî ya ramyarî û rewşenbîrî, ne jî wê yeksaneyî welatperwerî û welatparêziya wî bê. Lê, hêja ye em zanibin ku hin helbestvanên gewre helbest jê re kirine diyarî, weke: Ehmedê Şêx Salih, Seydayê Tîrêj, Bêbuhar, Hadî Behlewî, Qehar Silo û Ebdurehîmê Mûşî yê ku çar helbest jê re diyarî kirine.

Gulana 2629k/2017z

**Dilovanê Deştê**

# Em Û Zimanê Me...![1]

**‘Şerma mezin ew e ko mirov**

**nezanê xwendin û nivîsandina**

**zimanê xwe be’ ‘*Hawar*’**

Miletê Kurd mîna her miletekî xwedî çande, tore, dîrok, folklor û ziman e. Xwedî şaristaniyeke sipehî û kevnare ye. Roleke pir mezin di şaristaniyên herêmê de lîstiye. Lê mexabin, ji ber berjewendiya dukelên setemkar, Kurdistan bûye çar perçe. Bi wê perçebûnê re daxwaz û xwestekên gelê Kurd jî hatine guherîn, çande û wêjeya wî jî hatiye talankirin. Herweha, ji dezgehên neteweyî, ji ya lêkolîn, lêgerîn û pêşxistina zimên, çande û hebûnên civakî û dîrokî hatiye bêparhiştin.

Ziman, ji destpêka danûstandinên civakî hatiye holê, û hemû peywendiyên civakî li ser hîmê wî pêk tên.

“Ziman dilê jîndar ê çandê ye, hîmê zanava neteweyî ye. Di nav sedsalan de, di nav jiyanê de, bi xebat, tevbûnî û tevkariya bi milyonan

[1] Kovara Pirs-hejmar:(27-28),payîza 2002 – zivistana2003.Sûriye.

kesan çêbûye, dewlemendiya hiş; hest û nêrînên mirovan nîşan dide. Ziman dîdarê şehrezayî û bajarvaniya gelekî, û neynika giyan û bîra wî ye. Sermayê wî yê dîrokî ye. Evîna zimên, di cihekî de, evîna gel e, evîna welêt e”. (K. Nezan, K. Hêvî, hej.1)

Îro li riwê gerdûnê, di navbera gelan de nêzîkî du sed zimanî têne peyvandin. Ev ziman ji hev hatine cihêkirin û nav li wan hatine danîn.

Zimanê Kurdî di girûpa zimanên Îranî de ye, ku ew jî şaxek ji zimanê Hindû-Awrupî ye, ku ji zimanên Kurdî, Farisî, Efxanî û Tacikî pêk tê. Weke ku tête gotin, ev ziman berê di nav kurdan de bi bîst zaravayan ve dihate peyvandin. Paşê di pêvajoya dîrokê de guherînên aborî û civakî ew daxistine çar zaravayan. Ango: Kurdmancî, Zazakî (Dumilkî), Soranî û Hewramî. Li gor hindek dîrokzanan tête gotin ku Kurdan di xwendin û nivîsandinê de cara yekemîn tîpên Mîxî bikar anîne. Piştî ku xaka Kurdistanê ji aliyên ereban ve bi navê misilmantiyê hate dagîrkirin, û hem jî berhemên rewşenbîrî, û wêjeyî hatin şewtandin. Kurdan jê bi şûn de tîpên Erebî bikaranîn.

Çendî Kurd demeke dirêj di bin desthilatên sitemkar û zordar de mane jî û ger çiqas karbidestên ku kurd bindest hiştine jî, her û her zimanê Kurdî gotinên xwe yên resen parastine, û bi qedexekirina xwe ve jî gelek kêm ne ketiye.

Di roja îroyîn de, hewqas talankirin, meşextkirina bi deh hezaran ji mirovan û valakirina gund û bajarokên Kurdan, çi li Bakur û Başûr, û çi li Rojava û Rojhilat Kurd ji koka jîna xwe ya civakî hema hema hatine birîn, û dûrî xak, rewîşt, gerdiş û rabûn û rûniştina xwe mane. Bêdiro, di bin van nîr û rewşan de, berî her tiştî mirov kesayetiya xwe winda dike. Kesayetiya gelan, nasnameya neteweyî ye. Hebûn û nebûn e. "Mercê heyînê a pêşîn ziman e". Ziman nasnameya gelan e. Dijminên me bi hemû çekan şerê hebûna me dikin. Berî her tiştî, şerê zimanê me dikin. Axaftin û nivîsandina bi zimanê bav û kalan qedexe ye. Bivênevê, zimanê Kurdî di dijwariyê de ye. Zimanên fermî (tirkî, erebî, farisî), bi riya xwendegeh, dibistan, êzge û wêneguhêzan re derbasî bajarok û gundên me bûye. Koçberbûna gundiyên Kurd ber bi bajarên mezin yên ku navendên çandên serdest in, ramyariya bêgidiya dukelên ku dest danîne ser welatê me û dixwazin bi hemû awayan rêç û

şopa kurdîtiyê, çanda kurdî û ziman ji riwê erdê rakin. Veguhestinên ciyakî dikin ku roj bi roj axaftina bi kurdî di nav nifşên nû de paş ve biçe. Îro em ketine rewşeke wilo ku pirîcar hêzên welatparêz ên kurd, rêxistin û tevgerên kurd di civînên xwe de, di nav hev de, bi Erebî dipeyivin, bi Erebî diramin û bi Erebî dinivîsin. Bêguman, şerê çandeyî pareke hîmî ya şerê azadiyê ye. Ev şer ewê tenê bi alîkarî û hevkariya hemû welatiyên me, bi hemû kurdên dilsoz dikaribe serkeve.

Zimanzanê nemir Celadet Bedirxan dibêje:

**"Ziman mercê heyînê a pêşîn e. Yekbûna Kurdan jî bi yekîtiya zimanê Kurdî çê dibe. Yekîtiya zimanî bi yekîtiya tîpan dest pê dike".** (K.Hawarê).

Heya îro zimanê me bi sê elfabêyan belav dibe: Latînî, Erebî û Kirîlî, û di nav wan her siyan de cudahiyên rênivîsê pir in. Hebûna sê elfabêyan ji zimanê kurdî re, hebûna sê sînoran ye. Reng e, ew jî bi rewşa gelê Kurd û welatê wan Kurdistanê ve girêdayî ye.

Zana û helbestvanê mezin Ehmedê Xanî dibêje: **(Vî zemanî herkes mîmarê dîwarê xwe ye).**

Dîwarê ku me ji dijminan biparêze, ziman e. Ziman, kesayetiya wî miletî bicî dike. Vêca, berî her tiştî divê em li zimanê xwe xwedî derkevin. xwedîderketin ji rêber, zana û rewşenbîran tê xwestin. Ziman jî mîna; heybereke jîndar e; dijî, nesax dikeve û dimire; hişk dibe û geş dibe. Heger em guh nedinê, û xwedî lê dernekevin, ji mafê zimanê me ye ku ew li welatparêziya me gilî bike. Di vî warî de zanayê mezin Se'îd Norsî dibêje**:**

**”Zimanê me yê ku di geşbûn û pêşveçûyînê de weke dara Tu be, bi qabilyet e ji bona ku weha hişk û perîşan, ji zimanê medeniyetê ku edebiyate dûr ma ye, wê li welatparêziya we gilî bike”.** (Se'dê Norsî,Îctîmaî Reçeteler1,tenwîr Neşriyet, sh95).

Zimanzanê nemir Celadet Bedir-Xan li vê welatparêziyê divarqile. Zimanê me yê nivîsandî, bi tîpên latînî ji wî dest pê dike. Îro bi saya elfabêya mîrê zanînê û pasevanê zimanê Kurdî Celadet Bedir-Xan zimanê Kurdî zengîn û dewlemend e; bi sedan pirtûk, kovar û rojname têne weşandin.

Mîr Celadet Bedir-Xan zimanzanekî bilind û têgihiştî bû. Di sala 1918-an de lêdivarqile ku tîpên Erebî di warê denganiyê de têrî zimanê Kurdî nakin. Zimanê Erebî, zimanê Konsonatan (tîpên bêdeng) e. Ji ber vê yekê dest bi amadekirin û bijartina elfabêya Kurdî-Latînî dike, û di sala 1932-an de di riya Kovara (Hawar)ê re belav dike. Ji hingê û bi vir de Kurdên Kurdistana Bakur û Rojavayê Kurdistanê riya (Hawar)ê dişopînin.

Ji bo rastnivîsandin û rastxwendinê elfabê û rêziman ji her kesî re giring in. Her mirovek pêdiviyê rêzimana zimanê xwe ye.

Li gorî baweriya me, gava pêşîn belavkirina bingehên rêzimana Kurdî karekî serketî ye.

Birastî, serketina vî karî ne tenê erk û stûbarê nivîskaran e. Belê, stûbarê hemû rêxistin, partî, welatparêz û dilsozên zimanê Kurdî ye. Bi arîkarî û piştgiriya wan, kar û xebata me serdikeve. Serketina karê me, pêşveçûna xebata wan e.

Pêwîst e û pir ferze ku hemû mirovên Kurd – çi mêr û çi jin- xwe fêrî zimanê bav û kalên xwe bikin, û bi zarokên xwe bidin xwendin.

Bila zarokên we bi Kurdî biramin, bi Kurdî bixwînin, bi Kurdî binivisînin û bi Kurdî bijîn.

Hevotin, hînkirin û fêrkirina zimanê Kurdî parastina nasnama hebûna me ye. Ziman ûştê hebûn û nebûnê ye.

# Dîroka Zar û Zimanê Kurdî

**“Ziman mercê heyînê a pêşîn e. Yekbûna Kurdan jî bi yekîtiya zimanê Kurdî çê dibe. Yekîtiya zimanî bi yekîtiya tîpan dest pê dike”.**

**(Celadet Bedir-Xan).**

Kurdistan cihê avabûna gelek şaristaniyên herî kevnare ye. Li gor zanyarî û agahdariya arkeologan, li Başûrê Kurdistanê nêzîkî çiyayê Zagrosê rastî şûnewarên gundê Çermo û Şanîdar hatin. Ev gund 6.700 sal B.Z hatiye avakirin. Ev gundê herî pêşîn e, ku li cîhanê ava bûye. Û herweha diyar e ku cara yekemîn bû, ku mirov ji nêçîrvaniyê derbasî çandinî û lawir xwedîkirinê bûne. Berî deh hezar salan li Rojhilata Navîn û bi taybetî li Kurdistanê, di warê çandiniyê de, genim, çewder û fesûlye hatine çandin. Dîsa li vê herêmê lawirên wek bizin, mîh û beraz cara yekemîn hatine kedîkirin û xwedîkirin. Arkeologên Amerîkî, Alman û Turk di sala 1985-an de li Amedê, li dorhêla navça Erxeniyê

malek ji bin erdê derxistin. Ev mala ha 9,000 sal Kevin e.

Bêguman dîroka zimên bi dîroka hebûna mirov ve girêdayî ye. Pêşveçûna zimên bi pêşveçûna mirov ve ji hêla rewşa dîrokî, civakî, coxrafî û abûriyê ve tê girêdan. Li gorî zimannasan zimanê Kurdî zimanekî Hindo-Ewropî yê pêşîn e (Proto-Indo-European) û ji malbata Ariyan e. Li gorî dîroknasan ew jî vedigere -5000- sal (B.Z).

Pêşengên pêşîn yên ko bi vî zimanî dipeyivîn ji wan re digotin (Korgan), li navça (Istibsê Ewrasî), ya ko di navbera çemê Folxa başûrî derya Qezwîn û rojhilatî çemê (Ron) û rojavayî çiyayê (Ewrel) dijiyan. Li vê dawiyê, ji wan re hat gotin: Arî. Berî ko ji hev veqetin û li herêma (Ewrasiya) belav bibin, diyar e bi yek zimanî dipeyivîn. Piştî hoz û êlên Ariyan ji hev veqetiyan, li du (qara) belav bûn; ji Hindê-bakurê Asiya ta bi Ewropayê. Piştî vê belavbûn û ji hev dûrketinê gelek grubên zimên ji nav wan kad û şax dan, lê her koka zimanê xwe –Arî- winda

nekirin û tev bi zimanên Hindo-Ewropî (Indo-European-Languages) tên naskirin.

Li gorî dîroknasan (Gotî 3800 sal B.Z), Zagrosî ne. Ew pêşiyê Kurdan in. Berî xelkên Arî yên pêşî dakevin Zagros û Kurdistana îroyîn, zimanekî Gotiyan serbixwe hebû. Lewra em dikarin bêjin zimanê Kurdî yê pêşîn (Porto-Kurdish-Language) zimanê Gotî bû, yê ko di -1000-B.Z. pê dihate axaftin. Diyar e, di -1500-B.Z de, zimanê kurdî ketibû bin bandûra bêje û gotinên Ariyan. Ango destpêka hatina pêşengên koçên Ariyan li çiyayê Zagrosê (kurdistana îroyîn). Diyar e, ev dem dema koçkirinê ye. Nêzîkî -2000- sal B.Z, xelkên Hindo-Ewropayî ji Qefqasan ve daketin herêma Kurdistana îroyîn. Ji wan Kasî li herêma Zagrosê û Mîtanî jî, li rojavayê wan, li herêma Dîcle û Torosê bi cih bûn. Dema Kasî hatin herêma Zagrosê, li wir, ji berê ve Gotî û Loloyî jî hebûn. Li herêma Mîtaniyan jî Hûrî, Nayrî û Sobartûyî dijiyan. Mîtanî û Kasî, di demekê bi şûn de, li ser gelê herêmê desthilatî kirin. Zimanê xwe yê Hindo-Ewroyî û sîstema xwe ya civakî li ser gelên

herêmê dan qebûlkirin. Mîtaniyan tixûbên xwe fireh kirin. Ji Rojhilat ve birin heta çiyayê Zagros û gola Wanê, ji rojava ve gehêşt Derya Spî, ji Bakur û Başûr ve jî, ji Torosan heta axa Suriyê ya îroyîn berfireh kirin. Kasiyan hebûna xwe ya bi rêxistinî heta sala 1.B.Z. domand. Di warê huner û pîşesaziyê de, Kasî gelekî pêşketî bûn.

Împaratoriya Medya, dewleta Kurdan a yekemîn û ya herî mezin û berfireh bû. Heta îro yekemîn car e, ku Kurd di nav dewletekê de hemû malbat, êl û herêmên xwe kirine yek. Dewleta Medya, B.Z. di dawiya sedsala 18-an de, di navbera gola Urmiyê, Akbatan û heta çiyayê Zagrosê berfireh bû. Hemedana îroyîn serbajarê Medan bû. Medî Zerdeştî bûn. Zerdeşt pêxemberê Kurd û Îraniyan bû. Navê nivîsîna Zerdeşt Avêsta ye. Avêsta li ser çermê lawiran hatiye nivîsandin.

Li gorî pirtûkên dîrokî û dîrokzaneyan gotina (Kurd) gelekî kevn e. Ev gotin, heta B.Z. 2.000 salî diçe. Di wê demê de cîran û dîrokzan her yek li gor zanabûn û zimanê xwe navek li Kurdan kirine. Heta serdema Kardukiyan gelek nav li

Kurdan kirine. Lê di serdema Kardukiyan de, êdî di belgeyên nivîskî de gotine; Kardox, Kardo, Karduk, Kardux...Ev gel di navbera gola Wanê, çemê Dîclê û çiyayê Zagros de jiyaye. Gotina Kurd ji bo gernasî û qehremaniyê bikar anîne. Nivîsara dîrokî ya yekemîn ya ku li ser Kurdan hatiye nivîsandin, ya Ksenofonê Yewnanî ye. Ksenofon B.Z. di 400-401-ê de, di Kurdistanê re derbas dibe û di pirtûka xwe ya Vegera Dehhezaran de behsa Kardukan dike. Ksenofon, ji welatê Kardukan re Karduka gotiye. Îro hemû dîrokzan hemfikirin, ku Karduk Kurd û Karduka jî Kurdistan bi xwe ye. Li gor nivîsîna Ksenofon, Karduka ji rojhilatê çemê Diclê dest pê dikir, heta çiyayê Cudî û gola Urmiyê dida ber xwe.

Herweha li gor arkeolog û dîrokzanan, 10 hezar sal in, ku mirov li Kurdistanê dijîn. Li welatê Kurdan heta îro gelekî êrîş, koçkirin, bela û karesat pêkhatine. Lê, dîsa kurdan dev ji xaka Kurdistanê bernedane. Li ser axa bav û kalên xwe jiyan e. Ji B.Z. heta îro, Kurd li Kurdistanê, bi navên curbecur wekî kom, êl, eşîret, mîrîtî, an jî bi navê dewletê hebûna xwe parastine.

Li gor hemû zimannas û dîroknasan, zimanê Kurdî li gor tawangbarî û rêzimaniya xwe ji kok û binyata grupa van zimanên Ariyan e. Bêguman, hebûn û zelalkirina zimanê Kurdî û pêşveçûna wî wek zimanê miletekî serbixwe bi qûnax û dema dîroka ko ew tê re derbas bûye, tê girêdan.

Di 700 B.Z de, zimanê Kurdî-Medî wek zimanekî Hindo-Ewropayî cih girtiye. Li dora 150 salî bûye zimanê desthilatdariyê, ji (700-550 B.Z.) Bandûra zimanê Arî li zimanên hevdem hebû, nemaze piştî hatina Med û desthilatdariya wê li herêmê. Bêdudilî, em dikarin bêjin: Zimanê Kurdî yê îroyîn zimanekî Hindo-Ewropayî, serbixwe ye. Zimanê Kurdî-Medî yê ko di 500 B.Z. de ava bûye. Ew ziman zimanê ol, Rêbaz û desthilatdariya Medya bû. Diyar e, di vê demê de, zimanekî hevgirtî Gotî-Medî bê zar û zarav domand. Ev zimanê hevgirtî Gotî- Medî li dora 1000 salî, ango ta bi sala 500 Z. dirêj kiriye. Bêguman, li gor çerxa dîrokê û piştî hilweşîna desthilatdariya navendî ya ramyarî, zimanê kurdî jî ber bi perçebûnê ve çûye, nemaze piştî ko

ketiye bin desthilata fermandarên biyanî. Piştî vê qûnaxê, dema koçkirina xelkên herêmê dest pê kir. Xelk ji cihê xwe koçbar bûn. Êl û hoz ji hev belav bûn. Xweristiya kurdistanê ya çiyayî pirtir ew êl, hoz û xelkên herêmê ji hev dûr xistin. Danûstandin di navbera wan de qut bû. Li pişt her çemekî an çiyayekî ji çiyayên kurdistanê zar û zaravayin bi serê xwe peyda bûn. Bi pêşveçûna demê re zar û zaravayên herêmî pirtir û firehtir bûn.

Rewşa penaberiyê û rewşa hêmenên ramyarî, coxrafî, civakî û abûrî li kurdistanê, digel dijwariya têkiliyan, di nav êl û hozan de, û tevlihevbûna hin êlên yekherêmê bi hev re çar zaravayên sereke peyda bûn. Nemaze di sala 1500 Z de, ev her çar zaravayên sereke ava bûn. Ew jî ev in:

Kurdiya Bakurî. Kurdiya Navîn. Kurdiya Başûrî. Kurdiya Goranî.

**Zar û zaravayên Kurdî:**

Di warê zar û zaravayên kurdî de kevintirîn çavkanî Şerefnameya **Şeref-Xanê Bedlîsî** ye.

Eşîr û civakên kurdan, ji alî ziman, gerdiş û rewşa civakî ve bi ser çar beşan ve dabeş dibin:

1-Beşê yekê, Kurmanc. 2-Beşê didiwan Lor.

3-Beşê sisiyan Kelhur. 4-Beşê çaran Goran.

**M. Mehmûdê Bayezîdî** -1858-an di nivîsek xwe de dibêje: (kurmanciya xelkê Wanê, Mûşê, Bayezîdê û Qersê û kurmancên bi ser Rûsiya û Îranê ve û zimanê xelkên Botan, Hekariyan, Hemedanê, Simtiyê, Diyarbekirê, Mûsil, heta bighê hundirê Bexdayê (ku ji herêmên Silêmanî û Şarezorê, ji taîfên Zerza, Mukrî, Bebe, û Bilbasan pêk tê) ji hev cuda ne).

Wek diyar e, Bayezîdî, di vê xebata xwe de, kurdî bi navê kurmancî bi nav dike. Wek zar (Lehce) jî behsa navê Botan, Hekarî û Rewendî dike.

**Givrinlî,** Di sala 1836-1837-an de, çend gotar li ser ziman û etnografya kurdan belav kirin. Zimanê kurdî bi navê kurdiya jorîn û ya jêrîn dike du beş:

Jorîn: Mukrî, Hekarî, Şikakî û Bayezîdî.

Jêrîn: Lurî, kelhorî, Lekî û Goranî.

**Oskar Man**: kurdî bi navê kurdiya Rojava, ya Rojhilat û ya Başûr dike sê beş. Oskar Man ê ku Zazakî bi ser Goranî ve dihejmêre, Goranî jî vederî zimanê kurdî dike.

**Dr. Mac Kanzie**: Yê ku Goranî wek zimanekî serbixwe dîtiye, lê kurdî bixwe jî yek ji zarên Farisa-navîn dibîne.

**Sosyologê Turk Ziya**, kurdan bi navê kurmanc, Zaza, Soran, Goran û Lur dike pênc qewm.

**Ala'edînê Secadî dibêje**: Zimanê Kurdî du zarên sereke hene:

Zara Botanî: A ku îro jê re Bahdînî tê gotin. Kurdên Turkiyê, Sûriyê û yên qezayên Mûsilê bi vê zarê diaxivin. Ya didiwan jî zara Mukrî ye, ya ko îro jê re Soranî tê gotin. Kurdên din, ango Kurdên Bakurê Rojhilat û Rojhilatê Îraqê û yên Ardelan û Mukriyan bi vê zaravayê diaxivin.

**Dr. Kemal Fuad** nerînek dî heye dibêje:

1-Kurdiya Rojava: (Kurmanciya Jorîn-Bakur: Afrîn, Cizîrî û Botanî, Sincarî, Badînî, Hekarî û Şikakî.

2-Kurdiya Rojhilat: (Kurmanciya Xwarê-Başûr: hin jî dibêjin Kurdiya Navendî. Soranî, Silêmanî, Mukrî, Sineyî.

3-Kurdiya Başûr: Xaneqînî, Feylî, Kirmanşanî, Lekî, Kulgayeyî, Kelhurî, Perewendî.

4-Kurdiya Goranî- Zazakî: Hewramanî, Kenûleyî, Gehwareyî, Bocelanî, Zengeneyî.

Dr. Kemal bi rexnegirî dibêje: (Wê zara ku ez jê re zara Başûr dibêjim hin kes wê bi navê Lurî bi nav dikin).

**Fûad Heme Xurşîd**: Hem Luriya Mezin û hem jî ya Piçûk Kurdî qebûl kirine, û ew di nav Kurmanciya Başûrî de hejmartine.

**Mehmed Emîn Hewramanî** xebatin hêja kirine. Ew di vî warî de dibêje:

1-Kurmanciya jorîn: (Bahdînî).

2-Kurmanciya Navîn: (Soranî).

3-Kurmanciya Xwarê: (Goranî).

Şêweyên Jêrîn- Hewramanî, Lurî- Bacelanî-Zazakî. Weha destnîşan dike ku Bacelanî jî Zengeneyî û Şebekî digire nava xwe.

**Malmîsanij dibêje:** Pênc zarên (Lehce) esasî hene:

1-Kurdiya Bakur (Kurmancî).

2-Zara Kurmancî ya ku li Kurdistana Navîn tê axaftin. Ji vê zarê re carna Kurdiya Başûrî (Kurmanciya Xwarê) yan jî bi şaşîtî (Soranî) tê gotin.

3-Zara ku bi navên Kirdkî, Kirmanckî-Zazakî yan jî Dimilkî tê zanîn. Ew Zazakî bi du şêweyên sereke dibîne: Dêrsimê û yên Çewlig-Diyarbekir –Sêwregê.

4-Zara Goranî: Hewramî tê binavkirin. Nêzîkî (Zazakî- Dimilkî) ye.

5- Grûpa zarên Kurdî yên din ku li Başûrê Kurdistanê têne axaftin; gelek şaxên vê grûpê yên bi navên Kermanşahî, Lekkî, Lurrî, Sencabî

û Kelhurî hene ku ev ji alî beşek ji Kurdên nav sînorên Îranê û Îraqê tên axaftin.

**Mûrad Ciwan dibêje:**

1-Kurdiya Bakurî (yan jî Kurmancî-Kirmancî). Zara Kurdiya Bakur, Zara herî berfirehbûyî ye.

a-Kurmanciya Rojava. b-Rewendî. c-Şikakî. ç-Hekarî. d-Botî. e-Bahdînî. f-Sincarî. g-Kurmanciya Navîn.

2-Kurdiya Navîn (yan jî Soranî):

a-Soranî. b-Silêmanî. c-Mukrî. Ç-Sineyî.

3-Kurdiya Başûrî:

a-Xaneqînî. b-Lurî (yan jî Feylî). c-Kirmanşahî. ç-Lekî.

d-Kelhorî. e-Perewendî. f-Kulpaviyeyî.

4-Kurdiya Goranî: a-Hewramanî. b-Bacelanî.

5-Kurdiya Zazakî (Dimilkî-Kirmancî):

a-Dêrsim.

b-Çewlig-Sêwregê.

## Çavkanî:

- Amed Tîgrîs û Aso Germiyanî. Dîroka Kurd û Kurdistanê.. Stockholm-1990.

- Fûad Heme Xorşîd, Zimanî Kurdî, Dabeşbûnî Diyalektîkaniy, çapxaneyî Afaq Al-arebiye, Bexdad,1985.

-Fûad Heme Xorşîd, Zimanê Kurdî û Belavbûna Coxrafî ya Zarawayên Wê. Çapxana Elwîsam, Bexdad, 1983.

-Malmîsanij, Dimilkî Miyan di Ciyayeya Vatişan, Hêvî, Kovara çandiniya giştî, Parîs, hej:2,1984.

-Mehmed Emîn Hewramanî, Zarî Zimanî Kurdî le Terazûyî Berwîrd da, 1981.

-Mûrad Ciwan, Zimanê Kurdî, Rojnameya Armanc, hej:135-138,sal:1993.

-Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname.

# Danasîna Kovara AGAHÎ[2]

## (komela Zanistî û Alîkariya Kurd)

Piştî xebata malbata Bedirxaniyan û rawestandina kovarên Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-1945) li Sûriyê û Roja Nû (1943-1946) û Stêr li Beyrûdê ne tenê li nav Kurdên Sûriyê belê li tevaya Kurdistanê bizava çapemeniya Kurdî dikete bêdengiyekê de.

Li Bexdayê, di 14-ê tîrmeha sala 1958-an de sazûmana Şahanî hilweşiya û dest bi jiyaneke nû bû. Rewşa tevgera çapemeniya Kurdî geş bû. Di wê demê de li dora (268) pertûkan hatin çapkirin û belavkirin.

Pencên tîrêja tevgara çapemeniya Kurdî bandora xwe li Kurdên Binxetê jî kir. Sawa tirsê hin bi hin rabû. Çend ronakbîrên Kurd li bajarê Helebê li mala Dr. Nûrî Dêrsimî civiyan û biryara avakirina komeleyekê dan. Navê komelê (komela Zanistî û Alîkariya Kurd) bû. Damezrênerên komelê: Dr. Nûrî Dêrsimî, Rewşen Bedir-Xan, Hesen Hişyar, Osman Efendî û

[2]Kovara ElHîwar- Hejmar: (38-39),Payîz- Buhara 2003. Sûriye.

Heyder Heyder. Armanca komelê pêşxistina ziman, tore û dîroka miletê Kurd bû. Mexabin pir dirêj nekir. Li dora du salan (1956-1958) tenê berdewam kir. Li gor gotina endamê komelê mele Ehmedê Palo ko di pirtûka xwe de: Dewr û Gera Kurdistanê, sal:1994, rû:4 di pêşgotinê de dibêje:

"Di 9-5-1957 –an de û nemaza gava ko givika şêx û melan bi destê Ebdilhemîd Serac û bi piştgirtina mala şêx Ehmed hate çêkirin, mele Ehmedê Palo xwe jê dide paş û nabe hevalê wan, Ji ber ko dibîne ev kar ne ji bo kurda ye. Li gorî gotina wî, di wê demê de ew endamê komela Zanistî û Alîkariya Kurd bû. Ew komela ko di 1955-an de hatiye avakirin, tenê li dora du salan dirêj kiriye û ji karê xwe sekiniye. Li ser gotina wî evê komelê xwe tevlî partiya Demoqrat nekiriye".

komelê pir çalakiyên hêja kirine. Damezrênerê komelê Hesen Hişyar di destnivîsên xwe de dibêje:

-`Bi doza Kurd ve me (18) rûpel nivîsarek li Misrê bi destê Mihemed Hilmî beg da kongirisa (Bandok).

-Ji bona şoreşa (Ciwanrû yên Kurdên Îranê) me (protustokî) bi navê (Jenosît) bi zimanê (Erebî, Turkî, Farisî û Firansewî) dijî (şah) da belavkirin.

-Bi (Partiya Eyoka Qubrisî) re, me hevalbendî girêda, her buyerên wan me di rojnama xwe de didane belavkirin, ji ber ko ew jî dijî dewleta Turk û Ingilîz bûn. Çawa ko meseleyên Kurd jî li (Atîno) serekê diyaneta Islamî (Hafiz elîreşad) werdigerandin zimanê (Yûnanî) û di rojnameyên wan de didane belav kirin.

-Li (Beyrûtê), di rojnameyên Erebî de, li ser Kurd û Kurdistanê di rojnameya (Wicdan-Huriyet) de didane belav kirin`.

Evê komelê gelek pirtûk dane çapkirin û belavkirin.  Ji wan pertûkan:

- El-red `ele kosmopolîtiye – Hesenên Şiniwî. (Bi zimanê Erebî).
- Kîfah El-ekrad – Samid El-Kurdistanî.(Bi zimanê Erebî). Ya Dr.Cemal Nebez e.

- Dêrsim di tarîxa Kurdsitanê de- Dr. Nûrî Dêrsimî. (Bi zimanê Turkî).

Diyar e, kar û çalakiyên vê komelê ji temenê wê pirtir bû. Bi temenekî kin, ko du salan bi tenê dirêj kir, xebatin berfireh ji gelê xwe re kir. Evê komelê -mîna komelên din- piştî damezirandina Partiya Demoqrat ya Kurdistanê, ewê jî xwe helkir.

Piştî ko Sûriyê ji bin sîdariya Ferensîzan reha bû. Dergehê hemû komele û civatên Kurdî hatin girtin. Ziman û weşanên Kurdî yasaq bûn. Rewşa Kurdan roj bi roj nexweş bû. Darê nijadperestiyê li ser serê wan dihat hejandin.

Di sala 1957-an de Partiya Demoqrat ya Kurdistanê li Sûriyê hate damezirandin. Di civaka Kurdên binxetê de, damezrandina Partî gaveke hêja û pîroz bû. Lê mexabin di warê rewşenbîriyê de tu gavên berbiçav nehatin avêtin û bêdengiyek hebû û tu xebat di ber rewşenbîriya Kurdî de nehat kirin.

Di sala 1966-an de kovara AGAHÎ bi destê ronakbîrê gewre Hesen Hişyar derket. Di rûpelê pêşîn de hatiye nivîsandin: (Kovarek(e) zanistî, toreyî, tarîxî û siyasî ye). Kovar, li parêzgeha

Hisiça, bajarê Qamişlokê derdiket. Ji alî tîp û gewdê kovarê 20X40 s.m-ye. Rûpelên wê ji (15-33) rûpelan hevedûdaniye. Ji ber rewşa ramyarî xwediyê kovarê kovara xwe li tilnivîsê dida û bi hejmareke hindik û bi awayekî veşartî belav dikir. Ne tenê barê xercî û belavkirina kovarê li ser milê xwediyê kovarê bû, belê nivîsandin û amadekirina wê jî jê dihat xwestin. Kovar di nîreke pir dijwar de derdiket, lewre tu demek diyar ji derketina wê re nebû. Hejmarên vê kovarê gihane nozde hejmaran. Naveroka kovarê pirtir ramyarî û dîrokî bû. Xwediyê kovarê nerîn, dîtin û bîrûbaweriyên xwe di riya vê kovarê re dida belav kirin. Hin caran bûyerên Kurd û Kurdistanê belavdikirin.

Di kovarê de du helbest û nameyek bi tenê ne yên xwediyê kovarê ne. Helbestek ya nemir Ehmedê Palo û ya din ya nemir Hemzayê Muksî ye. Name jî ya Prof- Qenatê Kurdo ye ya ko di sala 1956-an de ji Komela Zanistî û Alîkariya Kurd re rêkiribû. Qenatê Kurdo di wê nameya xwe de dibêje: (Gelî biran, ji wê xebata we re sipas dikim, eger çiqasî dijwarî bikevin pêşiya we jî divê hûn zêdetir navê Kurd û Kurdistanê di roznaman, kovaran û her nivîsarên piçûk û mezin

de bidin belav kirin. Em di esra bîstî de ne ... esra ronahî û atomî de ne. Îro miletên bêdeng zû asîmîlasyon dibin, heya zarok negiriyê dê bi wê dilovaniya xwe şîr nade wî an wê....).

Xwediyê kovarê daxwaz û sedemê derketina kovara xwe dide diyarkirin û dibêje:

(Daxwaz ji vê kovara veşartî û destnivîs: Herwekî ji zanan re qenc agahe ko li gor rêzan û heq nenasiya rojhelatê navîn dewletên Kurdistan vegirtî, xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî gunehkariyek ji kiryariya (muxederatan) gelek mezintir û dijwartir e...).( Nemaze kurdên Sûrî ji (1958)-an de, di girifariyên dijwar de hatine girêdan... di her awayên teqalîdên xwe ên qewmî û civatî de pêçandî mane! Çewa ko her niştimanperwerên ji hev dûr nikarin bi serbestî û hêsanî bigîne hev û serpêhatiyên têde ji hev re bidin zanîn û li ser çare dîtinan heş û agahiyan bi hev biguhêrin..!). (Ji ber wan bûyerên zeman û mekan di armanca xebatê de ji bo agahdariya hin niştimanperwer li gor pêkanînê min xwe berpirsiyar dît. Da ko nûçe û bûyerên der û hundir ên ko doseya Kurdistan, di xwe de digre ji wan re bişînim. Lewre rojên teng û tarî nêçîrê tarîxê ne).

Xwedî û berpirsiyarê kovarê li ser vê bingehê kovara xwe derxist û raman û baweriyên xwe dida belavkirin. Bi giyanekî gewre û ramanekî bîrewer pêwîstiya yekîtiya tevgera Kurdî dide diyarkirin. Bi xurtî şerê perçebûn û jihevketina tevgera Kurdî dike, dibêje: (Çep û rast herdû milên laşekî ne, laş ko nebe kîjan milê çep û rast!!??).

Xwediyê kovarê mîna bijîşkekî pespor destê xwe datîne ser birîna nesaxiya tevgera Kurdî ya ko sedema ji hevketin û bindestiya gelê Kurd e, diyar dike û çare û derman jê dibîne. Ew çare û derman yekîtiya tevgera Kurdî ye.

Bi vê danasîna kurt, me rê û şop li ber lêkolînzan û nivîskarên bi rûmet vekir ko rojekê ji rojan bi firehî li ser vê kovarê rawestin û xwedî li nûçapkirina wê derkevin.

**Jêder û çavkanî:**


-Kovara AGAHÎ- Rûpel:2.Hejmar:3. Sal:1969.

-Kovara AGAHÎ- Rûpel:10.Hejmar:15. Sal:1980.

-Kovara AGAHÎ-Rûpel: 11.Hejmar:16 . sal:1981.

# Destpêka Avakirina Komele û Bizavên Rewşenbîrî û Konevanî Yên Kurd Li (Binxetê) Sûriyê

## (Rûpelin winda)

**1927-1957**

Di dawiya babilîska nozdehan û destpêka babilîska bîstan de, destpêka dîroka hişyarbûn û bizava rizgarîxwaza neteweyî ya gelê Kurd e.

Bi belavbûna rojnama (Kurdistan 1898-1902)-an û çapemeniya Kurdî re, roj bi roj hizrê ramyarî û civakî li nik rewşenbîrên Kurdan ber digirt, û rojnameya Kurdistan li hemberî zordariya fermandarên Osmaniyan şerê azadî û serxwebûnê domand. Ramana neteweyî roj bi roj di nav kurdan de, li ser destên nivîskar û helbestvanên Kurd yên mîna Hacî Qadirê Koyî xurtir û geştir dibû.

Di dawiya şoreşa 1908-an de, bi hatina (Ciwanturk) re, qûnaxeke nû dest pê kir. Rewşenbîrên Kurdan roleke pir mezin di vê partiyê de lîstin. Lê her ko çû (Ciwanturk) li dijî ramanên neteweyî yên kurd derketin. Konevanên

Kurdan jî pişta xwe danê û dest bi avakirina çend komeleyên civakî û siyasî kirin. Ji wan: [Cemîyeta Azm-î Kavî ya Kurdistanê, Cemîyeta Hêvî ya Xwendekarên Kurd, Cemîyeta Tealî ya Kurdistanê û ..wd.], û ramana neteweyî bi riya perwerdeyî, rêxistinên civakî, xebata weşan û çapemeniyê re belav dibû. Wek weşandina [Kurdistan-1908-1909-an, rojnameya Teavûn û Teraqî ya Kurd, Rojî Kurd-1913-an, Yekbûn 1913-an, Jîn-1918-an, wd.]. Ev qûnax bi destpêka xebata neteweyî ya kurd tê zanîn.

Gava Şerê Cîhanê yê Yekemîn, sala 1914-an, dest pê kir û dewleta Osmanî li kêleka Almanyayê kete cengê, dîsan Kurdan bizavkirin ku sûdeyê ji Rûsyayê bigrin û şoreşekê li dijî Osmaniyan pêk bînin, lê mixabin hewildanên kurdan ber ne girtin. Imperatoriya Osmanî parvebû, ji ber ko para mezin ji xaka Kurdistanê di bin destê Osmaniyan de bû, Kurdistan jî pêre hate parvekirin. Di 16/5/1916-an û di riya van her sê dewletên mezin Rûsiya, Birîtaniya û Ferensayê re û bi navînkirina -peymana reş -Saykis –Bîko-, Bakurî kurdistanê giha Turkiya, başûrî Kurdistanê giha Îraqa nuh, Rojavayê kurdistanê giha Sûriya û ji xwe Rojhilat tev di bin destê Îranê de ma.

Piştî rûxandina dewleta Osmanî, kurdan derfet û nîreke nuh di derbirîn û çareserkirina pirsa xwe de dîtin. Nemaze di danezana rêbaza Wilson ya çarde xal de; ji bo mafên miletan bi azadî û serxwebûnê bê çespandin. Pê re jî berê Kurdan dîsan berve riyên xebata ramyarî û dîplomatîkê çû. Serkêşê evê xebata dîplomatîk Şerîf Paşa bû, ewî doznameya kurdî pêşkêşî kongira Firasayê kir. Lê mexabin biryarên Sêvirê, li kongira Lozanê 23.07.1923-an bin pê kirin, û hevkaran soz û peymanên xwe bi Kurd û Kurdistanê re xwarin.

Piştî têkçûna peymana Sêferê û navînkirina Peymana Lozanê, di 29-ê Cotmeha 1923-an de, Komara Tirkiyê tê çespandin. Hebûna kurdan tê tune kirin. Li ser vê yekê, hinek serbaz, axa, beg, şêx û rewşenbîrên kurd li Erziromê di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de, bi navê (Komîteya Îstîqlala Kurdîstanê) yan jî tevgera (Azadî) rêxistineke siyasî dadimezirînin. Ev rêxistin bingeha pêxistina agirê şoreşa Şêx Seîdê Pîran bû.

Di dema ko miletên bindest li cîhanê doza azadiya xwe dikirin û rizgar dibûn, Kurdistan bi destên rejîmên setemkar dibû çar perçe, her perçak ji Kurdistanê bi welatekî ve dihat girêdan.

Ev perçebûn ne tenê welatê Kurdan çarperçe kir, belê di warê (Civakî, abûrî, çandî û ramyarî) yê de jî perçebûn çêbû. Bivênevê, mirovê Kurd li ser xaka bav û kalê xwe jiyaneke biyanî ma dijî. Hêvî û omîdên wî jî perçe bûn. Rewşeke nû di jiyana gelê Kurd de peyda bû. Ne tenê armanc û daxwazên bizava rizgarîxwaza gelê Kurd hate guherîn, belê li her perçeyekî ji perçeyên Kurdistanê û li gorî vê jîweriya nû, reng û awayê xebatê jî hatine guhertin.

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îdê kal di sala 1925-an de, gelek ji wan siyasetmedar û welatparêzên kurd penaberî Sûriyê, Îraq, Îran û Ewropayê bûn. Lê digel van karan tevan jî, dewleta tirkan nikarîbû viyan û hêviyên kurdan ji hest û hizrê wan yê neteweyî bibire û rehên agirên serhildan û berxwedanên wan vemrîne.

Di wê demê de, giringiyek bi girêdana kongirekî giştî ji bo yekîtiya hêzên kurdan yên belavbûyî li ser pirogrameke yekbûyî hebû.

**'Xoybûn'ê** wek rêxistin ji bo Kurdistaneke serbixwe tekoşîn dida, ev daxwazeke rêzanî bû. Ewan welatparêzên kelecan û penaber kongirê xwe di 5ê çiriya pêşîn sala 1927-an de li Beyrûdê- Bihemdûnê, girêdan.

**Damezrênerên Civata 'Xoybûn'ê ev bûn:**

1. Celadet Alî Bedirxan. 2. Elî Riza kurê şêx Se’îdê Pîran. 3. Dr.Şikriyê Mihemedê Segvan. 4. Haco Axa.5. Bozanê Şahîn beg (serokê hoza berazan). 6. Mistefayê Şahîn beg.7. Emînê Ehmed (Serokê hoza Rima).8. Memdûh Selîm.9. Bedredîn axayê Hebisbenê.10. Tewfîqê Cemîl. 11. Fehmiyê Licî (nivîskarê Şêx Se’îd).12. Mele Ehmedê Şûzî.13. Feqe ‘Evdilayê Cizîrî. 14. Kamil efendî. 15. Kerîm efendî.

Tev endamên komîta navendî bûn pêvî (Feqe Evdilayê Cizîrî û Mele Ehmedê Şûzî). Di wî kongirî de çend biryarên dîrokî hatin sitendin. Hêja ye em wan çend biryaran bînin bîra xwe:

1.Helkirina hemû civatên kurdî yên hene, û pêkanîna civateke kurdî ji hemû endamên kevin kom bibin û rê li ber endamên nû vekirî be.

2. Şoreşan li dijî tirkan dirêj bikin, ta yek leşkerê tirk li ser axa Kurdan nemîne.

3. Berî pêxistina agirê şoreşa giştî, li ser van xalên jêrîn biçin:

a) Ji bo hemû hêzên niştimanî yên Kurdî, pêşewayê giştî destnîşan bikin.

b) Rêxistina hemû hêzên şoreşgêrî di rêbazên leşkerî û cengawerî de baştirîn çekên şervanî di destên şoreşgêran de bin.

c) Ji şoreşê re melbendeke giştî bê dest nîşankirin, û ji bo hêza serkirdayetiyek bilind di çiyayekî ji çiyayên Kurdistanê yên bilind de bê danîn.

4. Ligel dewleta Îranê û bi gelê faris re peywendiyên biratî û xweş girêdin.

5. Bi herdu dewletan (Sûriyê-Îraq) re peywendiyên xwe girêdin, û ew mafên li gora sekihên çavdêrî ko peyman û rêkevtinên dewletî bi kurdan dabûn, besin û doza tu mafên siyasî yên din ji herdû dewletan nekin.

'Xoybûn'ê, dest bi kar û xebata xwe ya neteweyî kir û bi serokên ‘eşîran, serdarên siyasî û bi malmezinên kurdan re têkilî girêdan.

Xoybûn roj bi roj di bin serokatiya Celadet Bedir-Xan de xebata xwe di nav kurdên binxetê de berfireh kir, û li pireya gund û bajarên kurdî xelekên xwe ava kirin. Nûner û endamên 'Xoybûn'ê li her çar perçên Kurdistanê û li derveyî welêt (Ewropa û Emerîka) çêbûn.

Bi rastî em nikarin xebata 'Xoybûn'ê û şoreşa 'Ararat'ê ji hev veqetînin, ji ber ko li dora çar salan (1927-1930) bi heve hatibûn girêdan. Em dikarin bibêjin ko berdewamkirin û geşkirina agirê şoreşa 'Agirî' pareke mezin jê keda rêxistina 'Xoybûn'ê bû.

'Xoybûn'ê gelek şêweyên tekoşînê yên ji hev cuda bi kar tanîn, wek nimûne di xala 17-an ya destûra wê de tiştekî gelek balkêş cih girtiye. Ew jî ev e;"Propaganda divê him devkî him nivîskî bê çêkirin. Di warê propaganda devkî de miftî û derwêş divê stran, qesîde û çîrokên Kurdî di nav gel de belav bikin û bi vî awayî zordariya Tirkiyê nîşan bidin". Nivîskar Rohat Alakon di vî warî de dibêje: "Ev cara pêşîn ko rêxistineke Kurd folklor û edebiyatê di warê hişyarbûna neteweyî de wek çekekê bikar tîne û vê yekê di destûra xwe de bi cih dike". Ligel tekoşîna çekdarî, 'Xoybûn'ê bi taybetî baweriya xwe gelek bi kaxiz û pênûsê tanî. 'Xoybûn'ê wek rêxistin bi zimanê inglizî, fransî, erebî û tirkî çend pirtûkên înformatîk û hînkar di derbarê rewşa kurdan de weşandin.

Radyoya Kurdî li Bêrûdê hate vekirin û

radyogêrê wê Dr. Kamîran Bedir-Xan bû. Di rojê de çarîk katjimêr nûçe, gotar û lêkolîn diweşand.

Li gora biryara 'Xoybûn'ê Şêx Ebdilrehmanê Garisî rêkirin serxetê, lê mexabin ew çûn, çûna bê veger bû. Şehîd ket.

Peywendî di nav 'Xoybûn' û partiya Hîwa ya Îraqê de çêbû.

Piştî Celadet Bedir-Xan xwe ji 'Xoybûn'ê kişand Dr. Ehmed Nafiz cih digre.

Peywendiyên xwe bi barzaniyan re nûkirin û çaxê tevgera Mele Mistefa Barzanî(1943-1945), alaya Kurdî jê re rêkirin da li ser kopê çiyayên Kurdistanê bilind bike.

Di sala 1945-an de 'Xoybûn' û partiya Hîwa bi hev re raporteke hevpişkî rêkin kongirê Sanfiran-sîsko, doza mafê kurdan bikin.

'Xoybûn' nûnerê xwe Qedriyê Cemîl paşa rêdike Mehabadê ji bo pîrozkirina Komarê û alaya kurdistanê pêşkêşî serokê komarê kirin.

Birastî 'Xoybûn' dîrokek bi serê xwe ye, emê li vir dagerin ser rewşa komele û tevgerên kurdî yên hatibûn ava kirin.

Di wê demê de, dest bi damezrandina hin civat û komeleyên rewşenbîrî, civakî û werzişiyê hat kirin. Tevger û xebata pêşî bi destê Bedirxaniyan hate kirin û li ser serê wan Mîrê ronakbîran Celadet Alî Bedir-Xan bû.

Li mala welatparêzê Kurd Elî Zilfo axa- li taxa Kurdan- li bajarê Şamê civatek bi serokatiya Mîr Celadet A.Bedir-Xan ji wan penaberan re hat girêdan. Di wê civîna pêşîn de ev gotin kir*:”*

*Gelî Kurdan! Gelî rewşenbîr û welatparêzên delal... Şoreş û raperînên me, bi çekan bi serneketin û ne jî gihan armancên xwe... Niha ji me tê xwestin ko em bi pênûsê, bi zanîn û rewşenbîriyê, gelê xwe hişyar bikin, û pê şerê dijminê gelê xwe bikin. Em, dîrok, tore, folklor û rewşenbîriya xwe nasbikin û xwe bi cîhanê bidin naskirin...Bila zanîn çekê me be... û herne pêş..”*.

Bi saya serê Celadet Bedirxan wan penaberan berê tifinga xebata xwe ji eniya şer û cengan dane eniya wêje û rewşenbîriyê û dest pê kirin.

Di roja 15-ê Gulanê sala 1932-an de Mîr Celadet Alî Bedirxan hejmara pêşî ji kovara **'Hawar'ê** derxist. Xebata vî ronakbîrî pir berfireh û ber bi çav bû, rehên xwe bera civaka

Kurdî da. Ji hêlekê de, bibû mak û dibistaneke serbixwe ji pireya nivîskar û rewşenbîrên kurdan re; mîna O.Sebrî, Nûredîn Zaza, Qedrîcan, Cegerxwîn..û hwd, û ji hêlekê din ve, bala hin Rojhilatnasên mîna Tomas Biwa, Rojê Lîsko û Pêr Rindo kişande ser civak, folklor û rewşenbîriya kurdî. Elfabeyeke nuh Latînî û wêjeyeke nûjen afirand û gelek pirtûkên hêja di warê dîrok, ziman û toreya Kurdî de da belav kirin.

Di sala 1932-an de li şarê Hisiçayê li gor biryara 'Xoybûn'ê Komela (**Civata Arîkariyê ji bona Belengazên Kurd li Cizîrê**) hat damezrandin. Endamên vê komelê: Hesenê Haco axa, ‘Arif ‘Ebas, Cegerxwîn, Dr. Ehmed Nafis, ‘Ebdilrehmanê ‘Eliyê Yûnis, Hemze Begê Muksî, Osman Sebrî, Resûl axa, mele ‘Eliyê Topiz, Mihemed ‘Eliyê Şiwêş û....htd. Armanca vê komelê xweşkirina jiyana xizan û perîşanên Kurd di warê tenduristî, xwendin û nexweşiyan de bû. Evê Komelê armanc û sedemê çêbûna xwe di kovara (Hawar)ê hejmara:2 ya ko di 1-ê Hizêranê 1932-an de hatiye weşandin, dide diyarkirin. Ji maldar û dewlemendên Kurdan dixwazin ko peran bidin hev û alîkariya xizanan bikin û ji sentera vê komelê li Hisiçayê re rêkin.

Şaxên vê komelê li gelek gund û bajarên Kurdan hebûn. Ev civata pêşî ye ko nîzamnama wê heye, lê ji ber tengiya demê ezê Li ser nepeyivim.

Di sala 1937-an de **Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan** hat damezrandin, serokê civatê Dr. Ehmed Nafis û sekreterê Serok seydayê Cegerxwîn û berpirsiyarê Sindoqa pera Arif Ebas bûn. Û endamên berpirseyar: Celadet Bedirxan, Haco axa, Ebdirehmanê Eliyê Yûnis, Ekrem û Qedrî Cemîl paşa, Mela Eliyê Topiz, Mela Ehmedê Namî, Evdê Têlo û Mihemed Elî (Şiwêş).

Di havîna sala 1938-an de, li gor biryara Xoybûnê li bajarê Amûdê (**Nadî CiwanKurd** - Amûde) hat damezrandin. Serokê wê Mihemed ‘Elî Şiwêş bû, û seydayê Cegerxwîn mamoste bû. Di vê nadiyê de zimanê kurdî û dîroka kurdî dihat xwendin. Di vê nadiyê de Koma Rêçenasên Kurd (Koma Keşafên Kurd) hate avakirin. Rêçenasên Kurd di kolan û cadeyên bajarê Amûdê de, bi cilên xwe yên wekhev û li ser sînga her rêçenasekî alaya rengîn, alaya kesk û sor û zer çikandî bû, dibin siya alaya kurdî ya ber bi ba dibû dimeşiyan û sirûdên kurdî digotin.

**Ji xebata vê nadyê:**

-Alîkariya hin malên belengazan bi pere û xwarinê.

-Gerandin û belavkirina kovar û pirtûkên kurdî.

-Baweriyeke nû afirandin û dan zanîn ko xortên nû dikarin têkildarî tevgerên rêzaniya welatê xwe bibin û dûrtir binêtin.

-Bi miletê Kurd dan zanîn ko bi zimanê Kurdî jî dikarin zarokên xwe hînî xwendin û nivîsandinê bikin.

-Pîrozbahiya cejna Newrozê.

-Geşkirina hestê neteweyî di nava gelê Kurd de.

Di wê demê de, bajarê Amûdê bibû qublegeha welatparêz û xebatkaran.

Ji hêleke din ve li bajarê Şamê xortên Taxa Kurdan dest bi tevgerin hêja kirin, ji van tevgeran (**Nadî Henano**) bû, bi serokatiya xortê ciwan Beha'eldîn Wanlî hat damezrandin. Bi piştgiriya O.Sebrî û Nûredîn Zaza gelek xortên Kurd li dorê civiyan. Diyar e evê Nadiyê ta bi sala 1951ê dirêj kiriye. Ji ber ko bi karûbarê Merasîmên mirina Mîr Celadet Bedir-Xan rabibûn, û bi navê nadiya xwe gotinekê lê dixwînin.

Di sala 1939-an de li bajarê Şamê li taxa Kurdan komela (**Yekîtiya xortan**) hat damezrandin. lê, evê Komelê pir dirêj nekir, li ser destê nivîskarê Navdar Osman Sebrî û Nûredîn Zaza xwe tevlî (**Nadî Selah Eldîn ya Rewşenberî**) kirin, lê vê dawiyê navê nadiya xwe kirin (**Nadî Kurdistan**). Gelek xortên Kurd li dora wan civiyan. Dihat gotin ko ew nadî ya werzişî bû. Lê, xebata wê bixwe ji bo hînkirina zimanê Kurdî û geşkirina hestê neteweyî kar dikir.

Di 1-ê Nîsana 1942-an de Mîr Celadet Alî Bedirxan hejmara pêşî ji kovara **'Ronahî'** jî belavkir. Ewê Kovarê nûçe û salixdanên şerê cîhanê yê diwemîn bi wêne belav dikirin, digel gelek nivîsên hêja di warê folklor, tore û rewşenbîriya Kurdî de. Em dikarin bibêjin herdû kovar (HAWAR û RONAHÎ) Qur'ana zimanê Kurdî ne.

Hêjayî gotinê ye, ko ev qûnaxa dîrokî bi qûnaxa Bedirxaniyan bê binavkirin. Ji ber ne tenê xebata wan diber çande, ziman, raman, civak û toreya Kurdî de cihê serbilindî û şanaziyê ye. Belê, roleke pirî mezin di geşkirina hêvî û hestên neteweyî de lîstine û bandoreke mezin li

Kurdên Binxetê (Kurdistana rojava) û bi taybetî li Kurdên Şamê kirine.

Piştî ku Ferensiz di sala 1946-an de, ji Sûriyê derketin, û di bin bandora hest û ramana neteweyî û piştî rawestandina herdû kovarên (**Hawar û Ronahî**), li bajarê Şamê, û rawestandina (**Stêr û Roja Nû**), li Beyrûtê û sekinandina belavkirina pirtûkên kutubxaneya 'Hawar'ê tevgera rewşenbîrî ne rawestiha. Di wê navê de, çend pirtûkên hêja derketin, weke: Dîwana Cegerxwîn ya yekemîn (Birûst û Pêt) û çîroka (Cîm û Gulperî), û Osman Sebrî jî nemerdî nekiriye (Elfebeya Kurdî, Derdê me, Bahoz, Elfebeya Tekoz)..û hwd belav kirin.  Ew tevgera weşandina pertûkan bê qedexekirin û bi awayekî serbest û aza dihatin çapkirin û belavkirin.

Di sala 1951-ê de, li parêzgeha Helebê (**Komela Rewşenbîrî**) li Çiyayê Kurdan hate damezrandin. Endamên wê (Reşîd Hemo, Şewket Henan, Xelîl Muhemed, Reşîd Ebdureh-man û Ibrahîm Qadir) bûn. Armancên wê belav kirina rewşenbîrî û hestê neteweyî bû. Programê evê komelê 14 xal bûn. Ji wan:

-Guhdan li ziman û rewşenbîriya kurdî û şerê nezaniyê bê kirin.

-Piştgiriya xortên xwendevanên zangoyê yên xizan bê kirin.

-Şerê setema axa û began bê kirin.

-Şerê noker û guhbelên Turkan yên li herêmên kurdî bê kirin.

Lê mexabin di wê salê de tev hatin girtin û komele têk çû.

Di sala 1953-an de, Edîb Şîşeklî, Sûriya xist bin rejîmek leşkerî û bû serokomarê welêt. Bi hatina leşkeran zoreke mezin girte ser welat û gelê Sûriyê, nemaze kesên welatparêz û qomonîst bûn.! Çi kurdekî welatperwer ko bi qomonîstiyê dihat gunehbarkirin ew jî dihat girtin û îşkence kirin. Pir dirêj nekir, di sibata 1954-an de, bi destê hin efseran hate rûxandin, û gelê Sûriyê ji zulm û zora wî hat reha kirin. Di wê salê de hilbijartina giştî bi awayekî serbest û aza çêbû.

Di sala 1953-an de, '**Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê**' hate dameziran-din.

**Damezirênerên civatê:**

Mihemedê Mele Ehmed, Samî mele Ehmedê Namî, Evdilezîzê Elî Evdê, Derwêşê mele Silêman bûn.

**Civat dê ji bo bicihanîn û bidestxistina:**

1-Rizgarî û yekirina Kurd û Kurdistanê.

2-Xebat bê kirin ji bo pêkanîna demokrasiyê da bibe sedemê bidestxistina mafên Kurdan yên neteweyî.

3-Xebat bê kirin ji bo rizgarkirina gelê Kurd, ji zulm û zora empiryalîzmê û kevneperestiyê.

4-Di dibistanên Kurdî de bikaranîna bernamekê ji bo xwendina bi zimanê Kurdî û avakirina civatên kurdî yên civakî, çandî, folklorî û komeleyên werzişiyê.

5-Berhevkirina berhemên destnivîs yên rewşenbîrên kurd û kultûra kurdî, da bikaribin di pêşerojê de çap bikin.

6-Weşandina rojnameke kurdî, bi tîpên latînî.

7-Piştgiriya jina Kurd hember nexweşiyên civakî û azadkirina wê ji wan nexweşiyên civakî û yên kewdeniyê.

8-Her Kurdê ko bixwaze bibe endamê Civatê, diviyabû vê sûndê bixwe: ”Ez bi Yezdanê Pak û dilovan û bi şerefa xwe û şerefa Kurdistanê Sond

dixwim ko bi dil û can bibim endamê Civata Yekîtiya Xortên Demekrat ên Kurd li Sûriyê û bendên destûra wê bê kêmayî bi cî bînim û jê re fidakar bim ta roja dawî".

**Xebat û çalakiyên civatê:**

-Ji xebatên Civatê yên herî giring, xebata li ser çand û xwendina Kurdî bû.

-pîrozbahiya cejna Newrozê û girêdana şevînin siyasî û civakî û bîranîna damezirandina Komara Kurdistanê bi serokatiya nemir Qazî Mihemed ..htd.

-Belavkirina pirtûk û rojnameyên ko li ser Kurdan dihatine nivîsandin.

Hêjayî gotinê ye ko evê Civatê piştî damezirandina Partî (1957) xwe helkir.

Di sala 1955-an de li bajarê Şamê li mala nivîskar Osman Sebrî komela (**Vejîna Çanda Kurdî**) hate damezirandin. Endamên wê: Osman Sebrî, Hemzê Newêran, Hemîd Derwêş, Mecîd Hac Derwêş, Mihemed salih hac Derwêş, Xidir Ferhan 'Îsa, 'Adil ji çiyayê Kurmênc û Se'ed ellah (Se'do) Îbo bûn. Mexabin evê Komelê salekê dirêj nekir. Di wê salê de û bi taybetî di 18-6-1955-an de, li bajarê Helebê Komela (**Zanistî û Alîkariya Kurd**) hate damezirandin.

**Damezirênerên komela Zanistî û Alîkariya Kurd:**

Dr.Nûrî Dêrsimî, Rewşen Bedirxan, Hesen Hişyar, Osman Muhemed Efendî û Heyder Mihemed Kinco bûn.

Evê Komelê mîna yên berî xwe, xwendina zimanê Kurdî belav dikirin, û çend pirtûkên hêja dan çapkirin û belavkirin. Perê ji maldarên Kurdan distendin û li xizanan belev dikirin. Bandora vê komelê li nifşên nû hebû. Endamên wê li pireya gund û bajarên kurdan peyda dibûn. Nav û dengê Endamên wê yên mîna Rewşen Bedirxan, Dr. Nûrî Dêrsimî û Hesen Hişyar tenê bes bû ko xort li dora wan kom bibin û di vê komelê de kar bikin.

Kar û xebata vê komelê sînorên herêmên kurdî dernas kiribûn. Di riya rojnamevanê Aşûrî Yûsif Melek, xwediyê Rojnama El-wicdan û Huriyê yên ko li Beyrûtê derdiketin re, gelek nûçe û nivîs û berhemên hêja di babeta Kurd û Kurdistanê de didan belavkirin. Herdû Rojname, di bin baskê rêxistina Eyoka ya Qibrisî de derdiketin, ew partiya ko bi serhildaneke çekdarî ji bo rizgariya Qibrisê ji Îngilîzan û yekîtiya Qibris û Yewnanistanê rabûbû. Ev herdû

rojname di riya vê komelê re li herêmên kurdî dihatin belavkirin.

Ji hêleke din ve prof- Qenatê Kurdo nameyek ji vê komelê re rêkiribû. Naveroka vê nameyê ev e:

**”Gelî biran, ez xebata we pîroz dikim... Çiqas zehmetî û dijwarî bê pêşiya we , ji we tê xwestin ko hûn navê Kurd û kurdistanê di riya her kovar û rojnameyekê re- çi biçûk, çi mezin- belav bikin. Em di qirnê bîstan de ne, Qirnê pêşketina zanîn û zirayê ye. Miletên ko mafên xwe nexwazin tên jibîrkirin, Heger zarok negrî, dê wî şîr nade”.**

***Q.Kurdo***

**Berhemên Komelê:**

1-Pertûka (Qibris we berberiyet El-Etrak), Yûsif Melek bi zimanê Erebî.

2-Pertûka (Cînosayd) Kamîran Bedirxan.

3-(El-red ‘ele elkosmopolîtiye), Hesenîn Şiniwî, wegerandina Rewşen Bedirxan..

4-(Kîfah el-ekrad) Samid Kurdistanî (Cemal Nebez).

5-(Dêrsim di tarîka Kurdistanê de), Nûrî Dêrsimî.

6-(Rêol), bernama komelê.

7-Muzekerek ji (18) rûpelan hate rêkirin ji kongirê Bandok ya li Qahîreyê hatibû girêdan.

Li gor gotina endamê komelê mele Ehmedê Palo ko di pirtûka xwe de: Dewr û gera Kurdistanê, sal:1994, rû:4 di pêşgotinê de dibêje:

“Di 9-5-1957 –an de û nemaza gava ko givika şêx û melan bi destê Ebdilhemîd Serac û bi piştgirtina  mala şêx Ehmed hate çêkirin mele Ehmedê Palo xwe jê dide paş û nabe hevalê wan. Jiber ko dibîne ev kar ne ji bo kurda ye.  Li ser gotina wî di wê demê de ew endamê komela zanistî û alîkariya kurd bû. Ew komela ko di 1955-an de hatiye ava kirin, tenê li dora du salan dirêj kiriye û ji karê xwe sekiniye. Li ser gotina wî evê komelê xwe tevlî partiya Demoqrat nekirye”[3].

Hêjayî gotinê ye ko di sala 1956-an de Apo Osman û Dr. Cemal Nebez bi hev re li ser peydakirina alfabeyeke latînî tekûz xebitîne û bingehê rêzana avakirina korî zanyarî kurd danîne. Lê mexabin bi çûna mamosta Cemal Nebez dervayî welêt re ew piroje li şûna xwe ma.

[3] Jêde: Mele Ehmedê Palo.

Di sala 1957-an de, li bajarê Şamê **Komela Xwendekarên Kurd** li zangoyên Sûriyê hat damezirandin. Endamên vê komelê ji kurdên Sûriyê û Iraqê bûn. Endamên wê ev bûn: Elî Fetah Dizeyî wek serok, Hemîd Derwêş wek cihgir, Dr.Qasim Miqdad wek xeznedar, Izedîn Resûl, Xelîl Henan, Xelîl Ebdilezîz, Mûeyid Neqşebendî, Umer Şerîf, Enwer Bozan, Sibhî reşo, û….hwd. Diyar e tu lebata wan nebû, zû dengê wan vemirî pêvî hin çalakî di nav xwendekaran de.

Di wê demê de, li Cizîrê hin beg û axayên kurdan li hev civiyan û komikeke konevanî ji xwe re ava kirin: (Hesen Haco, Cemîl Haco, Qedrî Cemîl Paşa, Ekrem Cemîl Paşa, Dr.Ehmed Nafis û Arif Ebas) bûn. Lê, ev komik ne komele bû.

Di  dawiya sala 1957-an de **Partiya Azadî** li bajarê Qamişlo hat avakirin. Damezirênerên partiyê: Seydayê Cegerxwîn, Mihemedê Fexrî, Mela Şêx Mûsê Şêxî û Mela Şêx Mûsê Qerqatî û hin kesên din  jî bûn. Ev xebatkar tev endamên partiya Qomonîst bûn. Lê, ji ber şerê hin rêvebirên partiya Qomonîst dijî kurdayetiyê, ew

dûrî partiya Qomenîst ketin. Diyar e pir dirêj nekirin, ewan jî xwe tevlî damezirandina Partiya Demoqrat kirin.

Rewşa Sûriyê ji sala 1954- 1958-an, berî yekîtiya di navbera her du hikûmetên Sûriya û Misrê de çêbibe,  gelê Sûriyê di bin siya hikûmeteke niştimanî û perlemanî de jiyaneke hinek xweştir di warê siyasî, civakî û wekhevî de domand.

Ji hêlek din ve, piştî şoreşa 1952-an li Misrê û hatina serok Cemal Ebdulnasir û şoreşa 1958-an li Îraqê dengê dozdarên neteweya Erebên neteweperest li herêmê pir bilind dibû. Ji encama vî bayê neteweperestiyê û gurbûna wî li nav Ereban, kurdan dest bi tekoşîna neteweyî kirin û ji bo pêkanîna mafê xwe yê dadmend kar kirin. Hestê neteweyî di nav kurdên binxetê de xurtir û geştir dibû nemaze piştî vegera nemir Barzanî ji Sofyêtê sala 1958-an û pêxistina agirê şoreşa 1961-ê li başûrê kurdistanê.

Di bin bandor û akama vê rewş û jîwera nuh ya li herêmê, û li hember vî bayê netewperestên Ereban pêwîstî bi yekirina van tevger, komele, civat û libatan hebû. Xwediyê ramana yekirina van hêzan û damezirandina rêxistineke siyasî-neteweyî  ye yekta teqez Osman Sebrî bû.

Di 14ê hezêrana sala 1957-an de partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê hat damezirandin. Di destpêkê de navê Partî:”**Partiya Demokrat a Kurdistanê** bû, û yekemîn armanca wê ya balkêş rizgarkirin û yekirina Kurdistanê bû. Li vê dawiyê û li gorî jîweriya xwe navê Partî guhertin, kirin (**Partî Demokrat ya Kurd li Sûriyê**), ji armanca rizgarkirin û yekirina Kurdistanê hatin xwar.

Endamên komîta navendî ya partiyê ev bûn: Osman Sebrî, Hemîd Hec Derwêş, Hemzê Niwêran, Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed, Şewket Henan, Şêx Mihemed Îsa û piştî demekê Dr.Nûredîn Zaza  û Cegerxwîn tev lê bûn.

Bi damezirandina Partî re qûnaxeke dîrokî nuhzayî di civaka Kurdên binxetê de dest pê kir. Her welatparêzekî Kurd  xwe li dora partiyê didît. Her kesî bawer dikir ko hêvî û omîdên wan wê di vê rêxistinê de bi cih werin.

Rast e, hinek ji van civat û komeleyên me gotî temenê wan kin û yên hinekan piçekî dirêjtir bû. Lê di baweriya min de kar û libata tevan ji hestekî kurdayetî dihat. Li gorî ûşt û mercên wê demê armanc ji sazkirin û avakirina van dezgehan berî her tiştî xwedî derketin li kesatiya

xwe (xwenaskirin û xwedanaskirin) wek netewe-yekî serbixwe.

Bêdiro! dibin siya rejîmên setemkar û zordar de, jiyan ne azad û ne serbest e. Narvîna wî miletî ne di destê wî de ye. Jiyana wî tev girêkûtk û awarte ye. Lê neyê wê wateyê ko li hemberî vê rewşa heyî em bêçar bimînin. Belê giring e ko dezgehên konevanî, civakî,şaristanî û rewşenbîriyê ava bibin. Lê em ne tarûmar û par û perçe bin, ne jî zindîkuj û mirîparêz bin.

Ez dixwazin gotara xwe bi gotina hêja Rewşen Bedirxan bi dawî bînim: "Yekîtiya Kurdan bidin min ezê Kurdistaneke serbixwe û azad bidim we".

---------------------------------------------------------

*Kovara ElHîwar- Sal(5), Hejmar: (21), zivistana1998 Sûriye.

*Ev gotar di semînara ko rojnama Mîdiya ji nivîskarên Kurdên Sûriyê re li Hewlêrê-Qesir Nazê di 13/9/2001 de girêdabû hate xwendin.

* Di pireya malperên Kurdî de hatiye belavkirin.

# Danasîna
# Komela Xoybûnê

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îdê kal di sala 1925-an de, dewleta Turk dest bi siyaseta helandina bi darê zorê kir – ya ko bi siyaseta tirkirinê (tetrîk) têt nas kirin. Dasa şer, hişk û ter da ber hev. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajaran kirin. Çek ji destê hoz û 'eşîrên kurdan wergirtin. Berê agirê sitemkariyê giha hemû warên jiyanê (aborî, civakî, siyasî û rewşenbîrî).

Bi sedhezaran kurd dûrî welêt xistin. Kurdistan kirin dojeh. Gelek ji wan siyasetmedar û welatparêzên kurd penaberî Sûriyê, Îraq, Îran û Ewropayê bûn. Lê, digel van karan tevan jî, dewleta tirkan nikarîbû viyan û hêviyên kurdan ji hest û hizrê wan yê neteweyî bibire û rehên agirê serhildan û berxwedanên wan vemrîne. Ew agirê ko li Çiyayên Cabikcûr, Farqîn, Sason û Agirîyê vêxistî mabû di şerê xwe de berdewam bû.

Dema ko welatperwerên kurd yên penaber bi çavên serên xwe dîtin bê çi bi serê gel û welatê wan hat û dijmin di hovîtiya şerê xwe de her

berdewam e; biryara girêdana kongirekî giştî ji hemû welatparêz, xwedî civat û rêxistin, siyasetmedar û rewşenbîr, beg û serokên hoz û ‘eşîran dan.

Giringiyek bi girêdana kongirekî giştî ji bo yekîtiya hêzên kurdan yên belavbûyî li ser pirogrameke yekbûyî hebû.

Damezrandina navendeke giştî ko cihê Stendina biryaran û piştgiriya şoreşa Agirî bike, çi di warê aborî û leşkerî de be, û çi di warê siyasî, diblomasî û piropaganda de be.

'Xoybûn'ê wek rêxistin ji bo Kurdistaneke serbixwe tekoşîn dida, ev daxwazeke polîtîk bû. Lê belê, 'Xoybûn'ê di belgeyan de û li ser kaxiz wek rêxistineke serxwebûnê xwe ne dida nasîn, li ser pirtûkên xwe, weşanên xwe, di destûra xwe de hertim 'Xoybûn'- Rixistina netewî ya kurd bi kar tanîn, ev yeka jî gelek balkêş e.

Ewan welatparêzên kelecan û penaber kongirê xwe di 5ê çiriya pêşîn sala 1927an de li Beyrûdê-Bihemdûnê, girêdan. Di wî kongirî de çend biryarên dîrokî hatin sitendin. Hêjaye em wan biryaran bînin bîra xwe:

**Biryarên kongireya 'Xoybûn'ê ev bûn:**

1. Helkirina hemû civatên kurdî yên hene, û pêkanîna civateke kurdî ji hemû endamên kevin kom bibin û rê li ber endamên nû vekirî be.

2. Şoreşan li dijî tirkan dirêj bikin, ta yek leşkerê tirk li ser axa kurdan nemîne.

3. Berî pêxistina agirê şoreşa giştî, li ser van xalên jêrîn biçin:

a) Ji bo hemû hêzên niştimanî ên kurdî, pêşewayê giştî destnîşan bikin.

b) Rêxistina hemû hêzên şoreşgêrî di rêbazên leşkerî û cengawerî de baştirîn çekên şervanî di destên şoreşgêran de bin.

c) Ji şoreşê re melbendeke giştî bê nîşankirin, û ji bo hêza serkirdayetiyek bilind di çiyayekî ji çiyayên Kurdistanê yên bilind de bê danîn.

4. Ligel dewleta Îranê û bi gelê faris re peywendiyên biratî û xweş girêdin.

5. Bi herdu dewletan (Sûriyê-Îraq) re peywendiyên xwe girêdin, û ew mafên li gora sekihên

çavdêrî ko peyman û rêkevtinên navdewletî bi kurdan dabûn, besin û doza tu mafên siyasî yên din ji herdû dewletan nekin.

## Di dîroka 'Xoybûn'ê de metoda xebat û çalakiyan

'Xoybûn'ê, dest bi kar û xebata xwe ya neteweyî kir û bi serokên ‘eşîran, serdarên siyasî û bi malmezinên kurdan re têkilî girêdan, û bi hev re dan û stendin; da ko li dema pêwîst amade bin.

'Xoybûn' roj bi roj xebata xwe berfireh kir û bi kurdên derveyî welêt re têkilî girêdan.

Nûner û endamên 'Xoybûn'ê li her çar perçên Kurdistanê û li derveyî welêt (Ewropa-Emerîka) çêbûn.

Peywendî di navbera serkirdayetiya 'Xoybûn'ê û perçên Kurdistanê yên din de çêbûn.

## Xebat û çalakiyên 'Xoybûn'ê di warê leşkerî de:

Bi rastî em nikarin xebata 'Xoybûn'ê û şoreşa Araratê ji hev veqetînin, ji ber ko li dora çar

salan (1927-1930) bi hev ve hatibûn girêdan. Em dikarin bibêjin ko pareke mezin ji berdewamkirin û geşkirina agirê şoreşa Agirî keda rêxistina 'Xoybûn'ê bû.

1. **Şoreşa Agirî:**

Ihsan Nûrî paşa serkêşiya şoreşa Agirî kir, û ala kurdî û durişma civata 'Xoybûn'ê jê re rêkirin. Serokê şoreşa Araratê ev durişţimê ha kiribû nîşana efserên xwe û çiyayê Agirî kiribiwa nîşana leşkeran.

Rêveberiya dezgehên bajarî bi serokatiya Birahîm paşayê Hisikî damezrandin.

Devereke fireh vegirtin: “Ararata mezin û ya piçûk, cihên Torbax û Kelhê, Tendirok, Aldax, Mîlêc, Kêrik, Êrhebeş, Zîlan, Eyaxa, Barkêrê û Diyadînê.

2. **Pirojeya şoreşekê ji başûr-binxetê:**

'Xoybûn' şeva 3ê ser 4ê tebaxê, sala 1930-î roja êrîşkirina ji başûr binxet ber bi bakur serxet ve biryar stendin.

Serkirdayetiya 'Xoybûn'ê enya şer ji Cerabulsê ko li ser ava Feratê dikeve, ta Endîwerê li ser ava mezin (Dicle); li ser şeş deveran ji rojava ta rojhelat li ser endamên 'Xoybûn'ê ve leva kirin.

1. Devera Kobanê: Bozan şahîn beg û birayê wî Mistefa beg serokên hoza berazan, û Osman Sebrî berê wan li Urfayê û Mereşê bû û yê Osman Sebrî ber bi hoza merdîsan here.

2. Serê Kaniyê: Mehmûd begê Birahîm Paşa yê Milî ber bi Wêranşehir here.

3. Devera Dirbêsiyê: Ekrem begê Cemîl Paşa û Qedrî ber bi Mêrdînê herin.

4. Devera Tirbesipiyê: Haco axa serokê hoza hevêrkan ber bi cihê hevêrkan here.

5. Devera Dêrikê: Celadet Bedirxan beg serkêşiya vê hêzê dikir û pêre Mihemed begê Cemîl Paşa û hin ji begên devera Botan mîna Resûl axa serokê hoza Zîlan.

6. Devera Tilşe'îrê: Cemîlê Seyda û herdu kurapên Şêx Se'îd (Selahedîn û birayê xwe), digel pênc hevalên din, di herêma Nisêbînê re herin.

## Xebata 'Xoybûn'ê di warê siyasî, civakî û rewşenbîriyê de

'Xoybûn'ê gelek şêweyên tekoşînê yên ji hev cuda bi kar tanîn, wek nimûne di xala 17-an ya destûra wê de tiştekî gelek balkêş cih girtiye. Ew jî ev e; ”Propaganda divê him devkî him nivîskî bê çêkirin. Di warê propaganda devkî de miftî û derwêş divê stran, qesîde û çîrokên Kurdî di nav gel de belav bikin û bi vî awayî zordariya Tirkiyê nîşan bidin”. Nivîskar Rohat Alakon di vî warî de dibêje: ”Ev cara pêşîn ko rêxistineke Kurd folklor û edebiyatê di warê hişyarbûna neteweyî de wek çekekê bi kar tîne û vê yekê di destûra xwe de bi cih dike”. Ligel tekoşîna çekdarî, 'Xoybûn'ê bi taybetî baweriya xwe gelek bi kaxiz û pênûsê tanî. 'Xoybûn'ê wê rêxistin bi zimanê Inglizî, Fransî, Erebî û Tirkî çend pirtûkên înformatîk û hînkar di derbarê rewşa kurdan de weşandin.

Piştî şoreşê rewşa xwe rêxistin û bi ser û ber kirin rojnameyek bi navê 'Agirî' derxistin û di jimarekê de marşa xwe ya leşkerî belav kirin (Agirî Agirî-Ji 9 malikan pêk tê).

Hin daxwiyanî ji bo piştgiriya şoreşê û geşkirina hestê neteweyî di nava gel de, çi li hindirê welêt û çi li derveyî welêt, dihatin belavkirin.

Radyoya Kurdî li Bêrûdê hate vekirin û radyogêrê wê Dr. Kamîran Bedirxan bû. Di rojê de çarîk katjimêr nûçe, gotar û lêkolîn diweşand.

Li gora biryara 'Xoybûn'ê Şêx Ebdilrehmanê Garisî rêkirin serxetê, lê mexabin ew çûn, çûna bê veger bû. Şehîd ket.

Di 24-9-1932-an de, endamên civata 'Xoybûn'ê civatek damezrandin bi navê (Civata Arîkariyê ji bona Belengazên Kurd li Cizîrê).

Di havîna sala 1938-an de li gor biryara civata 'Xoybûn'ê Nadiya Ciwanên Kurd li bajarê Amûdê hate damezrandin.

Peywendî di nav 'Xoybûn' û partiya Hîwa ya Îraqê de çêbû.

Peywendiyên xwe bi barzaniyan re nûkirin û çaxê tevgera Mele Mistefa Barzanî (1943-1945), ala Kurdî jê re rêkirin da li ser kopê çiyayên Kurdistanê bilind bike.

Di sala 1945-an de 'Xoybûn' û partiya Hîwa bi hev re raporteke hevpişkî rêkin kongirê Sanfiransîsko, doza mafê kurdan bikin.

'Xoybûn' nûnerê xwe Qedriyê Cemîl Paşa rêdike Mehabadê ji bo pîrozkirina Komarê.

**Rewşenbîr û pêşewayên rojavayê Kurdistanê yên di Xoybûnê de**

Damezrênerên Civata 'Xoybûn'ê ev bûn:

1. Celadet Alî Bedirxan.

2. Elî Riza kurê şêx Se’îdê Pîran.

3. Dr.Şikriyê Mihemedê Segvan.

4. Haco Axa.

5. Bozanê Şahîn beg (serokê hoza Berazan).

6. Mistefayê Şahîn beg.

7. Emînê Ehmed (Serokê hoza Rema).

8. Memdûh Selîm.

9. Bedredîn axayê Hebisbenê.

10. Tewfîqê Cemîl.

11. Fehmiyê Licî (nivîskarê Şêx Se’îd).

12. Mele Ehmedê Şûzî.

13. Feqe ‘Evdilayê Cizîrî.

14. Kamil efendî.

15. Kerîm efendî.

Tev endamên komîta navendî bûn pêvî (Feqe Evdilayê Cizîrî û Mele Ehmedê Şûzî).

**Kesên ko 'Xoybûn' li binxetê ava kirin û pêşvebirin ev bûn:**

C. Bedirxan, K. Bedirxan, Xelîl beg Bedirxan, Sûreya Bedirxan, Şêx Ebdulrehmanê Garisî, Dr. Ehmed Nafis, Dr. Nûredîn Zaza, Haco Axa, Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa, Hemze begê Muksî, Dr. Nûrî Dêrsimî, Şewket Zulfî Beg, Emîn Birûsk, Şêx Ebdilrehman û Mihemed Mihdî û Tahir birayên Şêx Se’îd, Ebdilrehmanê Eliyê Yûnis, Arif Ebas, Memdûh Selîm, Tewfîq Cemîl, Osman Sebrî, Cemîlê Seyda, Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Hesen Hişyar, Cegerxwîn, Ehmedê Namî, ...û hwd.

**Lê yên ji rojavayî Kurdistanê li gorî ko têne bîra min ev bûn:**

Mihemed ‘Eliyê Şêxmûs (Şiwêş), Se’îd Axa, ‘Evdê Têlo, Hacî Ebdilkerîmê Mela Sadiq, Mele ‘Eliyê Topiz, Dr. Xalid Qotreş, Ûsê Hersan, Birahîmê Qiço, Isma’îlê Wethiya, Seydayê Tîrêj, Osman Alûsî, Eliyê Omer û hwd.

**Di 'Xoybûn'ê de rola Bedirxaniyan**:

Ji nav malbat û malmezinên kurdan rola malbata Bedirxaniyan ya sereke bû:

Celadet Bedirxan yek ji damezrênerên pêşîn yê 'Xoybûn'ê bû, û hemû çavkanî û jêderên dîrokî nîşan didin ko ji sala 1927-1932-an serokatiya 'Xoybûn'ê kiriye. Lêkolînerên wek Basîl Nikitîn, E. G. Elphinston, Erhart Franz, Nazmî Sevgen di berhemên xwe de, Celadet Bedirxan wek serokê 'Xoybûn'ê nîşan didin.

Berî ko 'Xoybûn' belav bibe, serokê 'Xoybûn'ê Dr. Ehmed Nafiz beg bûye.

Piştî hilweşîna şoreşê û têkçûna xebata çekdarî digel birayê xwe Dr. Kamîran, dest davêtin xebata rewşenbîrî û zimanê kurdî, çend kovar û rojname li Sûriyê û Beyrûtê weşandin, mîna

(Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr) û çend pirtûkên hêja li ser ziman, tore, dîrok û folklora kurdî çap kirin.

Xelîl beg Bedirxan endamê 'Xoybûn'ê bû li Beyrûdê. Dr. Kamîran Bedirxan rêpêşendarê wê bû. Wî radyoya kurdî li Bêrûdê vekir û radyogêrê wê bû.

Sûreya Bedirxan li gorî biryara 'Xoybûn'ê diçe Ewropa û Emerîkayê û roleke baş li nav Kurdên penaber radibe û alîkariyê ji nav wan dide hev û hin şaxên Xoybûnê li wir ava dike, û bi hin çalakiyên diblomasî radibe. Di raporeke Îngilîzî de ko di dîroka 18-4-1929-an de ji Emerîkayê, ji bajarê Detroitê hatiye şandin, dide diyar kirin ko Sureya Bedirxan berî ko bê Emerîkayê çûye Îtalyayê û li wir 15 rojan maye û bi Musolonî re hevdîtinek pêk aniye, paşê riya xwe bi Yunanîstanê xistiye.

## Ji bilî sedemên şexsî nakokiyên damezrênerên 'Xoybûn'ê jî hebûn

Nakokiyên damezrênerên 'Xoybûn'ê gelek bûn. Dema xwestin ji başûr êrîşî dewleta tirkan bikin, û ji şeş deveran derbasî Kurdistana bakur bibin, gelek ji wan axa û begên ko soz dabûn piştgiriya

vî karî bikin û pê rabin, sozê xwe xwarin û pê ranebûn. Evê yekê nebaweriyek di nav 'Xoybûn'ê de çêkir.

Piştî şikestina şoreşê valahiyek çêbû, ewê valahiyê hişt ko nakokiyên wan geştir bibin, û li hev bigrin. Hin ji endamên 'Xoybûn'ê dev jê berdan û dest bi şerê hev kirin.

Tirkiyê bi hemû hêzên xwe ve gelek hewl dida ko 'Xoybûn' hilweşe û ji navê rabe. Yek ji wan pîlanan li dijî 'Xoybûn'ê derxistina qanûnên efûyan bû. Bi saya van efûyan Tirkiyê dixwast hin endamên wê dev jê berdin, bên radestî Tirkiyê bibin û wê perçe bikin. Vê yekê bandûra xwe nîşan da. Wek kesên mîna Elî Riza û Emînê Perîxanê di sala 1928-an de, ji 'Xoybûn'ê veqetiyan û Mehemed Şukrî Sekban jî paşê dev ji 'Xoybûn'ê berda û çû radestî Tirkiyê bû. Ev dûrketin û çûyînên wisan nexweş bêguman bandoreke neçê li ser Xoybûnê dihişt.

Di sala 1930-î de binketina serhildana Araratê bandûreke mezin di nav Xoybûnê de nîşan da, û bû sedemeke bîntengiyê. Piştî vê bûyerê 'Xoybûn' qels dibe.

Tevgera serkirdayetiya 'Xoybûn'ê roj bi roj lawaz dibû. Bi taybetî piştî ko 'Xoybûn' Dr. Kamîran ji nav xwe dûrxist, birayê wî Celadet Bedirxan jî ji ber vê yekê dev jê berda.

Peymana ko di nav Taşnaqan û Kurdan de hatibû imzekirin, ji 19 xalan pêk dihat. Bi taybetî xala heştan ya vê peymanê gelek balkêş e. “Ji bo ko karên hevkariyê baş bimeşin divê yek ji nûnerên Taşnaqan di mercên lazim de têkeve nav komîta merkezî ya Xoybûnê û di wir de kar bike”. Beşdarbûna kesekî din ji bo 'Xoybûn'ê bûye serêşeke mezin. Ev yeka tê wê wateyê ko rêxistina Taşnaq rasterast tevî karên 'Xoybûn'ê yên hundirîn bûye.

Hin ji endamên 'Xoybûn'ê ew têkiliya bi Taşnaqan re ne durist didîtin, û eşkere wê dij derdiketin. Li gorî baweriya wan, destê Taşnaqan di 'Xoybûn'ê de pir dirêj e, sedem jî ev e: Kurdan li hemberî Taşnaqan xwe lawaz didîtin. Yên li dij van têkiliyan derdiketin ev bûn: Osman Sebrî, Memdûh Selîm, Şêx Ebdilrehmanê Garisî, û binemala Cemîl Paşa û hwd.

**Rola 'Xoybûn'ê di dîroka Kurdistanê de**

Di baweriya min de, şopedîroka 'Xoybûn'ê

bihewceyî gelek nivîsandin û lêkolînan e. Ji hêlekê de, rêçeke tev bi xwîn, kuştin, wêrankirin, meşextkirin, nepêkanîna soz û peymanan, xapandin û girêdana bi dijmin re... hwd. ji hêleke din ve qehremanî, têkoşîn û berxwedan, dilsozî, welatperwerî û şoreş e... hwd. Dîroka Kurdan gelek caran xwe bi xwe vegerandiye. Lê, mexabin gelê kurd tu sûde ji wan serpêhatiyan wernegirtiye, û her û her di wan şaşiyên xwe de berdewam e.

Di pêşiya şoreşê de şaşiya sereke ev bû: têkilî, xwesipartin, girêdan û pêwendiyên bi rejîmên ko Kurdistan di nav wan de perçe bûye.

Berî vêxistina agirê şoreşê pêwîst e pêkhatineke giştî û amadekirineke baş û demê pêwîst bibijêrin. Divê mercên alîkariyê ji serketina şoreşê re peyda bibin.

Pireya wan kesên bi avakirina 'Xoybûn'ê rabûbûn ji binemalên axa, beg, şêx, mele û berjiwaziya biçûk bûn. Dema berjewendiya wan têk çû pişta, xwe dan şoreşê. Serkirdayetiya derebegî û berjewazî, û ya olî ji bo pêkanîna armancên neteweyî di riya serbestî û serxwebûnê de serneket.

Biryarên şoreşê ji banî bin, û ne ji binkeyeke şoreşgêrî bin, û hemû şoreşgêr di avakirina wê de ne hevpişk bin, û wisa pêşkêşiya wê destikek ji girêdanên berjewendiya jor be û ji bo çewsandina cemawerê gelek ji şoreşgêran be. Gava şoreşgêr têgiha ko armanca şoreşê şoreşgêr e, û şoreş ji bo xweşiya wî û pêşketina komelê xebatê dike, bê guman hingê şoreş serdikeve.

# Celadet Alî Bedir-Xan
# (Jiyan û Berhem)
# (1893-1951)

Bêguman, di dîroka miletê kurdî de, malbata Bedirxaniyan xwedî rol û kedeke bêhempa û gewre ye. Xwedî cihşîneke dewlemend e. Çi di warê serhildan û raparînên azadîxwaz, û çi di warê rewşenbîrî û zanistiyê de be. Gelek fedakar û cangorî pêşkêşî gelê xwe kirine.

Bêdiro! Di navîna babilîska nozdehan de, Bedir-Xan beg xwediyê ramana azadîxwaz ya gelê Kurd bû. Ji (1842-1847), li hemberî zordariya dewleta Osmanî serî hilda. Lê mexabin pêre neçû serî. Bedir-Xan beg û zarûzêçên xwe dûrî welatê bav û bapîrên xwe ketin. Dewleta Osmanî bi zanebûn lawên Bedirxan bi kar û xebata dewletê mijûl dikirin, û çûyîna Bedirxaniyan ya Kurdistanê qedexe bû. Emîn Alî lawê Bedirxan yê mezin bû. Wî di nav

tevgera kurdî de cihekî giring digirt, û çavdêrê dadgeha Stenbolê bû. Ji ber liv û xebata ew xebatkerekî gerok bû. Osmaniyan ew ne li cihekî û ne li bajarekî ne dihişt.

Di 26-ê -06-1893-an de, Li Stenbolê, Xwedê lawek dayê ku navê Celadet lêkirin. Celadetî Xwendina xwe ya destpêkê û ya navîn li wir riha kir û zarokatiya xwe tevî bavê xwe di van sirgûnan de derbas kir, û li bajarên wekî Stenbol, Isparta, Edirne, Konya, Akka, Nablis û Selanîkê geriya. Celadet di maleke welatparêz û xebatkar de mezin bû. Bavê wî Emîn Alî zarokên xwe li ser şopa zanîn û kurdayetiyê xwedî kirin.

Di temenê hejde-nozde saliya xwe de, Celadet derbasî Kuliya Herbî dibe. Diya wî Senîhe ya Çerkes ne razîbûna xwe ji vî karî re diyar dikir û dixwest wî dûrî Osmaniyan xe. Celadet di Şerê Cîhanê yê Yekem de beşdar bû. Li qefqasyayê di şerî de bû. Gihişte heta Bako.

Diyar e, Celadet ji biçûkanî de dest bi nivîsandinê kir, û temenê wî negihabû bîst salan dema pirtûka (Rastiya Rûxandina Edirne) ya ko di sala 1917-an de digel birayê xwe kamîran nivîsandiye.

Di salên 1918-1919-an de, derfeteke zêrîn ji bo damezrandina dewleteke Kurdî peyda bû. Celadet û birayê xwe Kamîran, Ekremê Cemîl Paşa, Faiq Tewfîq û siyasetmedarê Ingilîzî Mêcer Idward Noêl li nav hoz û êlên kurdan geriyan. Armanca wan amadekariyên Peymana Sêvrê bû. Lê mexabin ew tevgera wan cih negirt û tu axa, beg û serokên eşîran pişta wan negirtin û ew karê wan zû têk çû. Celadet di vê gera xwe ya Kurdistanê de di nav eşîran de gelek metelok, peyv û çîrok jî kom kirin. Di vê çûn û tevgerê de, li ramana çêkirina Alfabeyeke Latînî divarqile. Û bi ûştê Mêcer lê hay dibe û dest bi danîna Alfabeya xwe dike.

Di sala 1922-an de, rojnama Serbestî li Stenbolê derdiket, Celadet cîgirê girînendeyê wê bû. Di wê demê de Kemaliyan Stenbol xistibûn bin destê xwe, û bi xurtî li dijî kurdan derketin. Di cih de fermana bidarvekirina bavê wî Emîn Alî û her sê birayan: Celadet, Kamîran û Sûreya didin. Bavê wî Emîn Alî Bedirxan û lawê xwe Sûreya diçin Misrê-Qahire. Celadet û birayê xwe Kamîran diçin Almanya-Miyûnixê. Celadetî li wir zanistgeh xwend û Şehada dadmendiyê/ hukukê wergirt.

Celadet ji kaniya çande û kultûrê Almaniyan vedixwe, bandûra rewşenbîriya wan gelek lê dibe, nemaze dîtina Basmark yê ko dixwest di riya yekbûna zimên re yekbûna Almaniyayê biparêze. Rewşa zimanê Kurdî gelek bala Celadet kişand û hêdî hêdî dest bi danîna bingeha rêzimana zimanê kurdî kir. Lê, her bala wî li ser rewşa tevger û şoreşên kurdî bû. Têkilî û girêdanên wî bi hundirê welêt re hebûn. Dema

şoreşa Sêx Seîdê Pîran di sala 1925-an de, destpêkir, berî da welêt. Lê mexabin dema ew giha welêt, şoreş têkçûbû. Bi dilekî kuldar dîsa berî dide Almanya . Lê mexabin, ji ber nesaxiya bavê xwe ko di sala 1926-an de, berî dide Misrê û ji wir diçe Beyrûtê.

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îdê kal di sala 1925-an de, dewleta Turk dest bi siyaseta helandina bi darê zorê kir – ya ko bi siyaseta tirkkirinê (tetrîk) têt nas kirin. Dasa şer, hişk û ter da ber hev. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajaran kirin. Çek ji destê hoz û 'eşîrên kurdan wergirtin. Berê agirê sitemkariyê giha hemû warên jiyanê (aborî, civakî, siyasî û rewşenbîrî). Xebatkarên kurd penaber bûn û tev ji hev tarûmar bûn.

Giringiyek bi girêdana kongirekî giştî ji bo yekîtiya hêzên kurdan yên belavbûyî, li ser pirogrameke yekbûyî hebû. Ewan welatparêzên kelecan û penaber kongirê xwe di 5ê çiriya pêşîn

sala 1927an de, li Beyrûdê- Bihemdûnê, girêdan. Celadet Bedirxan yek ji damezrênerên pêşîn yê 'Xoybûn'ê bû, û hemû çavkanî û jêderên dîrokî nîşan didin ko ji sala 1927-1932-an serokatiya wê kiriye.

Bi rastî em nikarin xebata Xoybûnê û şoreşa Araratê ji hev veqetînin, ji ber ko li dora çar salan (1927-1930), bi hev hatibûn girêdan. Em dikarin bibêjin ko pareke mezin berdewamkirin û geşkirina agirê şoreşa Agirî ji keda rêxistina 'Xoybûn'ê bû. Ji nav malbat û malmezinên kurdan rola malbata Bedirxaniyan ya sereke bû nemaze tekoşer Celadet Bedirxan.

Li Beyrûtê sala 1929-an wek parêzer xebitî û di wê demê de û bi taybetî di 16-8-1929-an de, li bajarê Beyrûtê dest bi nivîsandina bîranînên xwe kir. Di navbera 1927-1931-ê de, pir di navbera Beyrût û Şamê de diçû û dihat.

Dema şoreşa Agirî têkçû, berê wî jî ber bi Tahranê ve ket. Li ser gotina wî şah Behlewî hin kar û xebatên dewletê lê pêşniyar kir, lê qet wî dil nekir. Lewra Şah wî dispêre Îraqê, Îraq jî wî dispêre Sûriyê. Ev ne cara yekê ye ko hin dewlet dixwazin wî bertîl bikin û wî ji xebata kurdayetiyê dûr bixin. Belê Frensiz, Turk û şahê Urdinê jî jê xwestibûn, lê qet Celadet ji bo armanca xwe, radestî li ber van xwestek û daxwazan nekir.

Piştî hilweşîna şoreşê û têkçûna xebata çekdarî giringiyek bi girêdana civatekê ji penaberan re li mala welatparêzê Kurd Elî Zilfo Axa- li taxa Kurdan- li bajarê Şamê bi serokatiya Mîr Celadet A.Bedir-Xan. Di wê civîna pêşîn de wî ev gotina xwe ya dîrokî pêşkêşî wan kir û got: ”*Gelî Kurdan..! Gelî rewşenbîr û welatparêzên delal...Şoreş û raperînên me bi çekan serneketin û ne jî gihan armancên xwe... Niha ji me tê xwestin ko em bi pênûsê, bi zanîn û rewşenbîriyê,*

*gelê xwe hişyar bikin, û pê şerê dijminê gelê xwe bikin. Em, dîrok, tore, folklor û rewşenbîriya xwe nasbikin û xwe bi cîhanê bidin naskirin... Bila zanîn çekê me be..”.*

Bi van gotinên pir bi akam û hêja Mîr Celadet Alî Bedir-Xan ronaka xebatê li pêş wan penaberan vêxist û berê xebatê da pênûs û zanînê. berê wan ji eniya şer û cengan da eniya wêje û pênivîsê.

Di 26-çiriya pêşîn- sala 1931-ê de, rêdana çapkirina kovara Hawarê di bin jimara 6224 de, ji wezareta hundirî ya dewleta Sûriyê wergirt.

Di roja 15ê Gulanê sala 1932an de hejmara pêşî ji kovara Hawarê derxist. Kovareke wêjeyî û zanistî ye. Dûrî siyasetê ye. Pêncî û heft hejmar ji vê kovarê derketin. Hejmara dawîn di 15-Tebax- 1943-an de bû. Her 15 rojan cerekê hejmarek derdiket. Temenê wê 11 salan dirêj kir. Gerek li dora pênc salan tenê bûna, lê mexabin çend caran radiwestiya. Pê re alfabeya xwe ya Latînî û çend pirtûkên li ser zimanê Kurdî-

Kurmancî di bin navê weşanên kitêbxana 'Hawar'ê (1932-1943) belavkir. Di riya vê kovarê re, çend navên gewre di gasîna toreya Kurdî de hatin naskirin. Ji wan navdaran Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Hesen Hişyar, Ehmedê Namî, Cegerxwîn û Kamîran Bedirxan….hd. Ev qûnax bi van ronakbîran û bi berhemên wan hat naskirin.

Berhemin hêja di warê dîrok, ziman û toreya Kurdî de afirandin. Folklorê Kurdî ji qûnaxa devkî derbasî qûnaxa nivîskî kirin. Raman, hizir û bîrweriya mirovî di koda 'Hawar'ê de meyandin. Zaravayê Kurdmancî hem ji mirinê riha kirin û hem jî bi bêjeyine nûh û nûzayî dewlemend kirin.

Dewlemendiya Celadet netenê di warê afrandina alfabeyeke Latînî û rêzimana zimanê Kurdî de bû, belê xwediyê du dibistanan jî bû. Dibistana pêşî Kurdaniya biware ya ko gelek nivîskarên kurd yên penaber jê hînî rastxwendin û rastnivîsandina zimanê xwe bûn, hînî giringiya

pênivîs û zanînê bûn.. Dibistana din hevotina rojhilatnasên mîna Rojer Lîsko, Pîr Rindo û Tomas Biwa bi pirs, doz û rewşa kurdî bû. Rola van rojhilatnasan di kovara Hawarê de gelek bû. Çend perhemên giring di warê folklor, kultûr û dîroka kurdî de afirandin.  Bi saya serê Celadet bala wan kişande ser çande û wêjeya kurdî.

Celadet Alî Bedir-Xan bi heşt zimanan zanî bû; Kurdî, Turkî, Farisî, Erebî, Elmanî, Yûnanî, Frensizî û Ingilîzî. Elfabe û rêzimana xwe li gor van zimanan dipîva û dida ber hev. Reng û durvin nuh û serbixwe li alfabeya xwe kir. Bi zanebûn taybetmendiyek da alfabeya xwe ya nuh û bi pênc zimanan belav kir; Kurdî, Frensizî, Farisî, Turkî û Erebî.

Di sala 1932-an de, li şarê Hisiçayê li gor biryara 'Xoybûn'ê û bi piştgirî û alîkariya Celadet, Komela (Civata Arîkariyê ji bona Belengazên Kurd li Cizîrê)  hat damezrandin. Evê Komelê armanc û sedemê çêbûna xwe di

kovara (Hawar)ê hejmara: 2 ya ko di 1-Hizêranê 1932an de hatiye weşandin, dide diyarkirin.

Di sala 1937 de, li gor biryara 'Xoybûn'ê û bi piştgirî û alîkariya Celadet li bajarê Amûdê (Nadî CiwanKurd -Amûde) hat damezrandin.

Di 1-ê Nîsana 1942an de, Mîr Celadet hejmara pêşî ji kovara Ronahî belavkir. Bîst û heşt hejmar jê derketin. Hejmara dawîn di Adara 1945 de derket. Mehane bû. Temenê wê çar sal bûn. Ewê Kovarê nûçe û salixdanên şerê cîhanê yê didiwan bi wêne, digel gelek nivîsên hêja di warê folklor, tore û rewşenbîriya Kurdî de belav kirin. Em dikarin bibêjin herdû kovar (Hawar 1932-1943 û Ronahî 1942-1945) wêjeyeke nuhkirî, nuhbûyî û nûjen bixwe re vejand. Gelek bêjeyên nuh afirandin. Bêdiro! Kovara Hawar û Ronahî zerezengiya ser serê wêjeya Kurdmancî û Qur’ana zimanê wê ne.

Hêjayî gotinê ye, ko ev qûnaxa dîrokî bi qûnaxa Bedirxaniyan bê binavkirin. Ji ber ne tenê xebata wan di ber çand û toreya Kurdî de

cihê serbilindî û şanaziyê ye. Belê, di geşkirina hestê neteweyî de rol û bandûreke pir mezin di civaka Kurdî de lîstin. Tîrêjên vê akamê bi xurtî li raman, hizir û jiyana civakî ya Kurdan kir.

Ji sala 1934-1936-an, Celadet zimanê firensizî li dibistana pîşe, li bajarê Şamê daye .

Di sala 1935-an de, Bi Rewşen Bedirxan re hevjîn bûye û keçek bi navê Sînem1938 û lawek bi navê Cemşîd 1939  Xwedê dayê.

Di sala 1939-an de, li dezgeha Rêcê-ya tûtinê wek parêzer û serokê çavdêrî kar kirye.

Di dema şerê cîhanê yê dudiwan destpêkir, firensizan ew û hin penaberên Kurd li Şamê bin çav kirin. Bi taybetî ew di sala 1943-an de, li bajarê Şamê dibin çavdêriya dewletê de bû.

Di sala 1947-an de, li ser navê xelkê Cizîrê xwe ji bo endametiya perlemanta Sûriyê da pêş. Lê mexabin di cih de ew vekişandin.

Di sala 1950-î de, li sûriyê buhayê pembo gelek bilind bibû. Derfetek bû ko mirov rewşa xwe pê xweş bike. Husên Îbiş mirovekî

dewlemend û xwedî erd bû. Hêcanê gundê wî bû. Xwest alîkariya Celadet bike û parçak erd dayê ji bo çandiniya pembo. Ji neçarî berê Celadet kete riya çandiniyê. Lê ne bi dilê xanima wî Rewşenê bû. Celadet jî pir ji wî karê xwe ne dilrast bû. Pir ji bîra Qederê xemgîn bû. Di roja avdanê de, mexabin di tirsa xwe de derket û di wê bîrê de wer bû. Celadet li 15′ê Tîrmeha sala 1951-ê li gundê Hêcanê nêzîkî Şamê çû ber dilovaniya Xwedê û laşê wî li kêleka bapîrê wî, Mîr Bedir-Xanî, li Goristana Şêx Xalidê Nexşbendî li taxa Kurdan li Şamê hat veşartin. Sed mihder û dilovanî li giyanê wî yê pîroz bibarin û cihê wî buhişt be.

**Serencam:**

Mirovê gewre xwedî rol û bandûreke gewre ye. Bi xwendevanê xwe re rastgo û xwedî hestekî nazik û pir sade ye. Bi erk û berpirsiyarî li rewş û awayê kar û xebat, ziman û wêje, serhawe û berhawên Kurdî dimeyzand. Hostê çêkirina

peyva nûjen bû. Xwedî ferheng û azîn bû. Zimanzanekî gewre bû. Bi awa û şêweyekî pir rewan û hêsan dinivisand. Zanayekî rewanbêj bû.

Xebata vî ronakbîrî pir berfireh û ber biçav bû, rehên xwe bera civaka Kurdî dabû. Ji hêlekê de, bibû mak û dibistaneke serbixwe ji hemû rewşenbîr û nivîskaran re, û ji hêleke din de, Xudan pirnav bû. Ramana neteweyî, zanîn û hişyarî di nav gelê xwe de dida belavkirin. Mirovekî ne heyranê kesatiya xwe bû; ji tinebûna nivîskaran di bin gelek navan de berhemên xwe di kovara Hawarê de belav dikirin. Wêjeyeke hemdemî û nûxwazî afirand. Zimanekî wêjeyî avakir. Sermiyanê wêjeya nuhkirî bû. Di nav civata Kurdî de xwedî rûmet bû. Xwedî navekî pîroz bû. Bi saya serê wî kurdan navên Kurdî li zarokên xwe dikirin. Bi herkesî da zanîn ko Kurd neteweyekî xwedî ziman, dîrok û xak e. Xwedî şaristaniyeke dewlemend û gewre ye û di dîrokê de kevnare ye.

**Navên ku Celadet Bedir-Xan di Hawarê de bi kar anîne ev in:**

Nêrevan, Herekolê Azîzan, Xeberguhêz, Stranbêjê Jêliyan, Stranvan, Şîretbêj, Çîrokbêj, Şevger, Seydayê Gerok, memosteyê Gerok, Hawar, Cemşîd, Newîn, Dilistan, Şebistan, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînemxanê, Koçerê Botan, Yekî Vexendî, Xwediyê Hawarê, Nivîsanoka Hawarê, Taûzparêz,C.A.B. Ronahî, Xwediyê Ronahî... dibe hin navin din jî hebin.

**Berhemên Celadet:**

Ji bilî herdû kovarên wî (Hawar û Ronahî) çend berhemên hêja belav kirin, ji wan:

-Rêzana Elfabêya Kurdî. Mîr Herekol Azîzan. Çapxana Tereqî. Şam: 1932.Kurdî, Frensizî, Turkî, Erebî û Farisî. Bîst rûpel in.H:1.

-Rûpelinen Elfabê.

-Biyîşa Pêxember.(Mewlûda Nebî) Osman Efendî. Bi Kurdiya dumilî, bi dîbaca Celadet. Çapxana Tereqî, Şam.1933.Çel û şeş rûpel e.H:4.

-Nivêjên Êzediyan bi dîbaca Celadet. Çar nivêj in Ji devê Şêx Heyder û Ismaîl beg hatine girtin. Çapxana Tereqî, Şam:1933. Heşt rûpel in. H:5.

-Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re. bi destê Rewşen Bedirxan hat wergerandin bo zimanê Erebî min jî çapkir û belavkir.

-Ji Mesela Kurdistanê. Min wergerande zimanê Erebî û belav kir. Sala: 1999- Hewlêr. Ji weşanên rojnama Medya.

-Gramêra zimanê kurdmancî. Celadet û Rojê Lîsko. Min wergerand zimanê Erebî û belav kir. Digel çend mamosteyan.1991. Şam.

-Ferhenga Kurdî-Kurdî. Çapxana Avesta. Stenbol -2009.

-Bîranînên min. Celadet Bedir-Xan. Komkirin û Werguhêr: Dilawerê ZENGÎ. Çapa yekê (1997) Beyrût-Libnan. Çapxaneya Emîral.Çapa didiwan, Beyrût: 2010. Bi zimanê Kurdî- Erebî.

# QEDRÎ CAN[4]

(01/07/1911-09/08/1972)

**Destpêk:**

Rewşa gelê kurd ya jeopolîtîkî û dabeşbûna wan, kiriye ku rewşa helbest û toreya Kurdî bi giştî wekî rewşa ramyarî û civakî be.

Temenê toreya Kurdî, ne kêmtirî deh babilîskan e. Ji dema mîretiyan, ji babilîskên navîn, ta bi dawiya babilîska nozdehan ve, xwe dirêj dike. Ev dîroka dûr û dirêj, di çend qûnaxan re derbas dibe.

Gopîtka yekemîn di dema babilîska dehan de, bi serkêşiya helbestvan Baba Tahirê Hemedanî, xwediyê çarînan e. Ev helbestvan xwediyê pîtolî û zanyariya yekîtiya jîwerî (Kozmosî) ye. Bi raman û hizra yarî ya xwe, di Xweda û xweberiyê de dihingavt.

Gopîtka diwemîn di babilîska panzdehan de bi serkêşiya mele Ehmedê Cezîrî tê xuya kirin. Ev helbestvanê Kurd yê pêşî bû ku helbesta yarî

[4]Kovara ElHîwar –Hejmar: (28-29), Havîn û zivistana 2000.Sûriye.

(xezelî) ya Islamî derbasî toreya Kurdî kiriye û nuhtiye.

Gopîtka siyemîn di bebilîska hevdehan de, di çîroka navdar (Mem û Zîn)a Ehmedê Xanî de, diyar e. Tiştê balkêş, ko di wê demê de, li Ewropayê, ji bo olî û dêrên Kasolîk û Pirotistanî hevdû dikuştin(1). Lê, li Kurdistanê dengê zengilê hişyarî û rizgariya gelê Kurd li ser destê Xanî xweş dihat.

Di babilîska nozdehan de gopîtka kilasîkiyeta nû di berhem û nivîsandinên helbestvan Nalî, Salim, û Mustefa beg de tê nuhtin. Ev kilasîkiyeta nû ji bo rizgariya neteweyî jî dihat bikaranîn. Nemaze, di navîna dawîn ji babilîska nozdehan de, li ser destê helbestvanê mezin Hacî Qadirê Koyî.

Ta bi vê rojê, ev şêwe, di nav helbestvanên Kurdan de tê bikaranîn.Helbestvanin mezin di vê riyê de diyar bûn û navê wan di ezmanê helbesta Kurdî de geş bûn.

Ji şerê cîhanê yê yekemîn ve helbesta nûjen li nik Kurdan dest pê bûye.Li gorî baweriya min, ew jî di çend qûnaxan re derbas dibe:

Qûnaxa yekemîn di navbera herdû şerên cîhanê de, bi serkêşiya Kamîran Bedirxan, Qedrî Can, Şêx Nûrî şêx Salih û Goran xuya dibe. Ev nuhtin û nûbûn li nik her helbestvanekî ji yê din cidahî heye. Ango li nik hin helbestvanan nuhtin û nûbûn di warê ziman û şikandina benda kêş û bareyê de ye, li nik hinin din, nuhtin û nûbûn di naverok, raman û hûnandinê de ye. Herweha li nik hinin din nuhtin û nûbûn di ziman, naverok, raman û kêşesaziyê de ye. Hêjayî gotinê ye, ko berî herkesî yê helbesta nûjen nivîsandiye Dr. Kamîran Bedirxan e*.

Qûnaxa diwemîn piştî serîhildana tevgera Ruwange bi serkêşiya helbestvanê mezin Şêrko Bêkes e.

Manîfestoya Ruwange, ji bo tazekirina helbesta Kurdî hawarek bi serê xwe bû. Mirov dikare bibêje ku ev manîfesto digel nûkirin û azadiya helbestê, nûkirin di ziman, raman, çîrok û nêrînin nû di civatê jî de bû.

Piştî vê tevgerê, qûnaxeke nû, li ser destê çend rewşenbîrên Kurd mîna; (Ferîd Zamdar, Enwer Misyefî, Kerîm Deştî, Dilşad Ebdile, Ferhad

*Li kovara (Hawar)ê vegere.

Şakilî û Letîf Hilmot......htd) xuya bû. Evan rewşenbîran bi nuhbûn û nûxwaziyê bang kirin.

Di nav Kurdên Sûriyê de dest bi nivîsandina helbesta nû bûye. Kelandinek li ser pêmayên mîrê ronakbîran Celadet Bedir-Xan, Dr.Kamîran Bedirxan, Qedrî Can, Cegerxwîn, E. Namî, Osman Sebrî, Ehmedê şêx Salih û Tîrêj heye.Hin xortên nûhatî bi şêweyên nûkirî, dixwazin dest bi hûnandina helbesta kurdî ya nû bikin. Di hin helbestan de çirîska hêviyê dibînim.Lê, neyê hevotin ku helbesta nûjen cihê xwe li nav me girtiye û bûye mîna helbesta kilasîk, xwedî dibistaneke serbixwe. Ûşt û sedemên vê yekê pir in. Derd û kulên me jî gelek in. Ev cih ne cihê serseknandina vê yekê ye.Tenê tiştê balkêş ev e: Reh û çavkaniyên helbestvaniya van kesan, yan ji çevkanîya helbestvanên Ereb, an ji helbestvanên biyanî yê ko helbesta nûjen nivîsandine, werdigrin û riya wan dişopînin. Mexabin, di bin bandûra peyrewî û hevenda vê diyardekê de, û li ser vê riyê mane. Hin jî hene bi zimanê biyanî (Erebî, Tirkî, û Farisî…td), diramin û bi kurdî dinvisînin. Helbestên wan bê sûde, bê fesal, bê serûber, xav, kerik û bê hawe ne. Giyanekî bê

can, balayeke bê per û bask û sirûdeke bê awaz in.

Rast e, merov nikare şîretan li helbestvanan bike. Lê merov wek xwêner dikare nerîna xwe di helbestê de bide. Xwendina helbestê ji mirovekî ta bi mirovekî din ne tenê cuda û tê guhertin. Lê belê, xwediyê (afirandekê) helbestê bi xwe, piştî çend xwendinan, tiştin nû jê re xuya dibin. Ev jî ji ber ko (hest) di sînora gotin û şorzaran de nayê bestîn, û ne jî tê hevragirtin.Ji ber ku ziman nikare (hest) di bûyîna wî ya xweberî de jiber bike. Divê têkiliyeke giyanî di navbera xwendevan û helbestê (pirsur û pirsurî) de hebe.

Helbest, ne diyardeke sekinî û bê liv e. Ne jî dîtaniyeke ekadîmî ye. Liv û guhêzeke hundirî di cîhana peyv û şorzaran de digere, û jiyaneke sermedî ye. Roleke mezin di pêşketin û nûkirina raman, hizir, ziman, huner û civakê de dilîze.

Helbest deryake ji evîna bê dorpêç û sînûr e. Bê rawestandin û miçiqandin, dizê û diherike.

## Jîneniîgariya Helbestvan Qedrî Can:

Çaxê mirov bixwaze lêkolînekê an nivîsandinekê li ser helbestvanekî an nivîskarekî çêbike, berî her tiştî, pêwîste mirov li nivîs û berhemên wî vegere,û serpêhatiya jiyana wî zanibe, û li hin çavkanî û jêderan vegere. Wê gavê ez bawer dikim karê mirov wê tekûz û pir hêja be. Lê çaxê ku tu nivîsandin li ser jiyana wî helbestvanî/ nivîskarî tune bin, û berhemên wî di kovar û rojnameyên ko di destpêka sala sîhî de derketibin û di yek pertûkê de nehatibin civandin, û tu çavkanî û jêder-pêvî çend gotarok-li ber destan tune bin. Ez bawer dikim wê karekî  ne pir hêsan be.

Yek ji van helbestvanan helbestvanê me Qedrî Can e. Berhemên Qedrî Can nehatibûn komkirin û li ser jiyana wî pir têvilî hebûn. Em, bi bawer in nivîsên nivîskar ayîna hundirê wî ye. Berhemên Qedrî Can rûpelin ji jiyana wî ne.Bi taybetî ew berhem û nivîsandinên ko mîna bîranînên zarotîyê bi awayekî çîrokî hatine nivîsandin. Di baweriya me de, çevkanî û jêderên rast û dirust berhem û nivîsên wî ne.

Qedrî Can ew bi xwe ji xelkê Dêrika çiyayê Mazî ya paşroyê bajarê Mêrdînê ji bakurê Kurdistanê ye.

Pireya nivîskar û rewşenbîrên ko li ser jiyana wî nivîsandine,û bi taybetî li ser dîroka zayîna wî, ne wek hev gotine. Herdu nivîskarên Kurd M.Uzun û Firat Cewerî dibêjin:”Di sala 1919an de hatiye dinê”(2),lê mamoste Izedîn Mistefa Resûl mîna Rewşen Bedirxan dibêje: ”Di sala 1916 an de hatiye dinê”(3). Diyar e ko mamoste Izedîn Mistefa Resûl ev dîrok ji pirtûka Rewşenê (Rûpelin ji toreya Kurdî) wergirtiye(4). Rojnamevan Hesen Qeya di rojnameya (Dîmoqratî)(5) û li ser zimanê malbata helbestvan gotiye:”Di sala 1911an de hatiye dinê”, Nivîskar Edîb Nadir ew jî di gotara xwe de ya di kovara (Metîn) de daye belavkirin dibêje: ”...Qedrî Can di sala 1911an de hatiye dinê û di sala 1972an de miriye”(6),lê nivîskar Silêman ‘Elî di gotara xwe de ya di rojnameya (Armanc) de hatiye belavkirin dibêje:” Qedrî Can di destpêka babilîska bîstan de hatiye dinê”(7), bê ko dîrokê bicî bike,lê Perofesor Qenatê Kurdo di pirtûka xwe de (Tarîxa edebiyeta Kurdî)(8) de, qet behsa dîroka zayîna wî nake.

Piştî tevgereke dûr û dirêj,û pirsîneke hûr û kûr, me du reşbelek li ser zayîna wî peyda kirin.Ev herdû reşbelek dudiliyê di vê mijarê de nahêlin, û dîroka bûyîna Qedrî Can bi zelalî bicî dikin,û li ber çavan diyar dikin. Reşbelekek jê (Wesîqeya jinanînê), û ya din (nasnameya xwendinê) ye. Di herdû reşbelekan de, bûyîna Qedrî Can sala 1911-an bi cî dike.

Ji hêlekê din ve, me gotibû çîrokên Qedrî Can rûpelin ji serpêhatiyên jiyana wî ne. Di vî warî de Qedrî Can dibêje:”Ew pelên ko ji kitêba jiyana min hatine çirandin, îro perçên wan î riziyayî belav dikim, bi hev dizeliqînim.. dixwazim ji wan, kitêba bextiyariyê çêbikim. Sond.. Guneh.. Rojên derbasbûyî.. Serencam.. her yek ji van, ji kitêba jiyana min a hezîn rûpelekî rengîn in. Lê rengîn dibin, zengîn dibin...dîsa pelinin çiriyayî û riziyayî ne...”(9)

Di sala 1943-an de, çîroka (Serencem), di rojnameya (Roja Nû) de hatiye nivîsîn, dibêje: ”...Serencam jî rûpelek ji wan pelan e...Berî bîst û pênc salan bû.. Bi meh û hefteyên xwe,bi şev û rojên xwe, bîst û pênc sal... Di nav hundirê mala me de,ji nişkave,hay û hoyek çêbû:birayê min Fethî, piştî ...du sê rojan dimir...”(10). Li ser

gotina Qedrî Can, heger em bîst û pênc salan ji dîroka nivîsandina çîrokê hilînin, dîroka mirina birayê wî zelal dibe, ku di sala 1918-an de, miriye.Li cihekî din ji çîrokê dibêje: “Her êvarên zivistanê..., ji zarokên mîna min şeş-heft salî,tije dibûn...”(11) Heger dîsa em ji 1918-an dîroka mirina birayê wî Fethî, heşt salan bikujin,dîroka bûyîna wî ji me re zelal dibe,ko di sala 1911-an de hatiye dinê. Bi vê gotinê Qedrî Can bi xwe bûyîna xwe diyar dike û di tu reşiyê de nahêle.

Li vir gotina M.Uzun û F.Cewerî şaş derdikevin, û gotina Dr.Izedîn Mistefa Resûl û Rewşen Bedirxan jî şaş e . Ji ber ko zarokekî di temenê du salan de nikare vê bûyerê bîne bîra xwe û ne jî xwe navkoyê vê çîrokê diyar bike. Nemaze çaxê ko em dibînin Qedrî Can di hejmara yekê de ji kovara HAWARê(12), ya ko di sala 1932-an de derdiket, gotarek daye weşandin. Di wê demê de temenê wî bîst û yek salî bû. Heger em dîroka M. Uzun û Firat Cewerî rast bigrin, gerek temenê wî sêzde salî be çaxê di HAWARê de nivîsandiye. Ev jî ne rast e. Ji ber ko li gorî gotina hemû lêkolînvan û nivîskaran, nivîskarê herî biçûk yê di kovara HAWARê de nivîsan-diye, Dr. Nûredîn Zaza ye, ne Qedrî Can

e. Lê li ser dîroka Izedîn Mistefa Resûl û Rewşen xanimê wê temenê wî şazde salî be dema di kovara HAWARê de nivîsîye.Ev jî ne rast e, ji ber ko di wê demê de bi Reşîdê Kurd re li Qonyayê dixwend.

Navê wî yê rast Ebdilqadir ‘Ezîz Can e[5]. Di nasnameya xwendevaniyê de hatiye; Qedrî ‘Ezîz Can. Navê diya wî ‘Eyşê ye. Ji xelkên Dêrika çiyayê Mazî ye. Di destpêka xortaniya xwe de tevlî tevgera welatparêzan dibe.Ji ber sedemên ramyarî dûrî welatê xwe dikeve.Berê xwe dide binya xetê. Di vî warî de, Cegerxwînê nemir di bîranînên xwe de dibêje:(.. Du xortên ciwan ji Kurdistana Turkiyê hatine Amûdê, xwendina xwe ya lîse xelaskiribûn, herdû xort Qedrî can û Reşîdê Kurd bûn”(13), ji hêleke din ve hevalê wî Dr.Xalid Qotreş dibêje:”Qedrî can ji ber sitema Turkan xwendina xwe nebir serî, di sala didiwan ji xwendina xwe (Mala Mamostan =Dar el-

[5] Zinet Dinçer weha dibêje:Bavê wî:Cano. Diya wî: Ayşe
Bapîrê wî: Feteh.Dapîra wî:Hedê.
Navê wî: Abdulkadîr: Qado (Qedrî Can)
Birayê wî: Şehmus Özcan ( Şêxmusê Cano)
Birayê wî: Salih Özcan ( Salihê Cano)
Birayê wî: Abdurahman Özcan ( Evdê Cano)
Birayê wî: Davut Özcan ( Dawudê Cano)
Ev agahî, ji belgeyên nufusa Dêrikê hatine wergirtin.

mû’elimîn) reviya û hate sûriyê”(14). Lê di reşbeleka xwendinê de, diyar e ko ew di sala çaran de bû, li bajarê Qoniyayê dixwend. Dr.Xalid Qotreş gotina xwe berdewam dike: ”Di sala 1928an de temenê wî (17) salî bû dema hatiye Sûriyê. Di salekê de hînî zimanê Erebî bûye. Li bajarê Selemiyê xwendina (Mala mamosteyan) yên çandiniyê dixwîne. Piştî ko xwendina xwe kuta dike, li bajarê Entakyê dibe mamoste”(15). Li wir zanyarê mezin Memdûh’ Selîm nasdike.

Qedrî Can, li bajarê Qamişlo û Amûdê mamostetiyê dike. Li gorî gotina şagirtê wî Mustefa Kurê Hesen Hişyar dibije: “(Di sala 1942-an de Qedrî Can li bajarê Amûdê kargîrê dibistanê bû)(16). Li bajarê Şamê, Taxa Kurdan, û derdûra wê jî mamosteyî kiriye. Piştî demekê, li wizareta perwerdiyê mîna rêvebirê kar xebitiye. Li wir jî pir dirêj nake,li tomara giştî ya karkirên dewletê kar dike. Demek têre naçe tevlî komkarên azadîxwazan dibe, û mîna endamekî zîrek, di nav de, cih digre. Qedrî Can mîna mirovekî xebatkar, ramyar û rewşenbîr tê nas kirin.(17)

Wekî me gotî, Qedrî Can di hejmara pêşî ji kovara HAWARê de nivîsîye. Edîb Nadir dibêje: ”Di 15-5-1932-an de, Qedrî Can, bi pêşewaziya mîrê Kurdan Celadet Bedir-Xan, di eniya dî de, eniya çandeyê de, nivîskarekî afirandî, stêrka wî geş bû, û têkoşerekî şervan bû.(18)

Di sala 1936-an de Qedrî Can helbesta xwe (Reya Teze) nivîsîye. Edîb Nadir dibêje:”Ev helbest (Reya Teze), helbesta pêşî ye, di dîroka helbestên nûjen û azad, di toreya Kurdî de”(19). Ev dîrok, bûye mîna qûnaxeke nû di toreya Kurdî de, hem di nûjenkirina helbesta Kurdî ji hêla ruxsar û naverokê de û hem bûye bîhnokeke di navbera herdû qûnaxan de; qûnaxa nuhbûn û kevneşopê de. Ew qûnaxa kevneşop ya nav lê dikin kilasîk, û qûnaxa nûxwaziya bi mînake spehî û hevdemî û resenî di yek demê de gihandiye hev, û di nav xwe de hilgirtiye.

Di sala 1944-an de piştî nasîna Qedrî Can bi ramana Markisî û Lênîniyê ve qûnaxeke nû û dîrokî di ramana wî de dest pê kiriye. Bûye dostê ramana qomonistan. Silêman Elî dibêje:(Qedrî can di nav rêzên partiya qomonistên Sûriyê de kar dikir)(20). Lê Dr. Qenatê Kurdo bi vê yekê razî nabe, û dibêje: (Qedrî Can endamek ji

endamên partiya dîmoqrat ya kurd li Sûriyê bû)(21). Dr.Xalid Qotreş bi herdiwan jî razî nabe û dibêje: ”Qedrî Can, ne partî û ne jî qûmûnîst bû. Xebatkar û welatparêzekî pêşketî bû. Mîna min endamê komela Xoybûnê bû)(22). Ez bawer dikim ko mirovekî welatparêz û pêşverû bû, mîna gelek xortên wê demê bawerî bi riya qomonîstiyê tanî. Lê bi tu partiyan ve xwe girê nedabû.

Di sala 1957-an de,di meha tîrmehê de, Qedrî Can bi girûpek xortên Kurd re beşdarî mehrecana ciwanên cîhanê ya şeşan li Moskoyê dibe. Li wir, diçe serdana serdarê Kurdan Barzanî yê nemir û helbesta xwe ya bi navê (Serdarê Kurdan Barzanî) diyarî wî dike. Di sala 1958-an de piştî vegera Barzanî, li bajar Bexdadê careka din hevûdû dibînin. Di wê dîtinê de, nameyeke bixêrhatinê dispêre destê serdarê Kurdan,û di kovarên 'Hêwa' û 'Azadî' de helbesta xwe ya bi navê (şêr hat welat)* belav dike.

Di çaxê ku li Moskoyê bû. Diçe nik Prof. Qenatê Kurdo. Di vî warî de Prof. Q.Kurdo

*Ev helbestên Qedrî Can yên ko di van herdû kovaran de (Hêwa, Gelawêj û Azadî) de hatine belavkirin di riya Mamoste Fetah Zaxoyî re gihane destê min.

dibêje: ”Ewî ji bajarê Adêsê ji min ra birqî (têlêgram) bi kurmancî bi van xeberan şandibû ”têda nivîsî bû” Ez Qedrî can im, tevî xortan tême festîvalê dixwazim te bibînim”(23). Qedrî Can çend helbestên xwe yên ne belavkirî bi xêza destê xwe diyarî Qenatê Kurdo dike. Qenatê Kurdo dibêje: ”..Deftera çend şê’rên xwe yên çapnekirî pêşkêşî min kir....Ji wan şê’ra, şê’ra wî ya bi sernavê “Ez diçim Mosko” wextê Festivalê bi rûsî hatibû çapkirinê û li rojnama “Îzvêstiya da”(24). Navê wan şê’ra ev in:”Ez diçim Mosko, Begê axir zeman, Reya teze,Gula sor”.

Di nav salên (1959-1961)-an de, li zindana Mezê girtî bû. Seydayê Cegerxwîn dibêje:”Qedrî can du-sê caran derbasî zindana Mezê bûye)(25). Ji bo xebata ramyarî û toreyî çend salan li Libnan û Îraqê maye.

Qedrî Can pireya berhem û nivîsên xwe di kovar û rojnameyên  ko li Sûriyê û Libnanê derdiketin (HAWAR, Ronahî û Roja Nû), de belavdikir. Çend helbest li Îraqê, di Kovara Hêwa, Gelawêj û rojnameya Azadî de jî belavkirin.

Pêvî Çîrok û helbestan, çend gotarên wî di kovara (Hawar, Ronahî û Roja nû)de hene. Ji wan: ”Silêman Bedirxan, Gelo ne wisa ne, Bihara Dêrikê, Şîna Xalê min,Inqîlaba Sor, û Yaney Serkewtin”.

Qedrî Can yek ji nivîskarê pêşîn e, ko di van kovar û rojnameyan de nivîsiye. Evî nivîskarî li kêleka helbestan kurteçîrok, û gotar û karê wergerandinê jî kiriye. Ji hêleke din, alîkarî di wergerandina romana (Şivanê Kurd) ya Erebê Şemo de kiriye, û pêşgotina dîwana yekê ya Seydayê Cegerxwîn nivîsîye.

Ji destpêka sala şêstî ta bi sala heftêyî tu berhemên wî bi dest me neketin. Me ji keça wî Dr. Şêrîn Can û malbata wan pirsî, lê mexabin tu destnivîs an reşbelek li nik wan tune bûn.

Qedrî Can rojên dawîn ji jiyana xwe li bajarê Şamê bûrandine.

Di sala 1939-an de, jin aniye. Du kur û keçek wî ji xanima wî (Neylûfir) hene.

Zayîna zarokên wî ev in: Mizgîn 1943-an, Şêrîn 1945-an, Serwer 1948 -an(26).

Di 9ê meha Tebaxa sala 1972-an de, li şarê Şamê, li taxa Kurdan miriye û li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî hatiye veşartin.

## Çîrok û helbestên Qedrî Can:

Pireya naverokên nivîsên Qedrî Can li ser xwendevanên dibistanan û cîhana jiyana wan in. ji hêleke din ve li ser gerdiş û serpêhatîyên Kurdan in. Bi awayekî jîwerî û rewan dihingive dilê merovan. Mînakekê dide ber çavên te-yeveneke çîrokî yan helbestî bi ruxsareke pir sipehî diyar dike, tu dibêjî qey wênekêş e. Ew mînak bi kamîreya xwe girtiye, xwe bera nava kûrahiya derûna te dide. Lê, di wê kûrahiyê de pir dirêj nake, zû zû tê der, û reng û salixdanên diyardekan rave dike û rê li ber rûçikên kesatiyên çîrokên xwe dûz û şayik dike, derûnên wan diyar û dide naskirin.

Naveroka çîrokên Qedrî Can di cîhana bîranînan û demên bûrî de digere, mîna: bîranînên zarotiyê, birayên xwînê, xewn û sawêr û berhaweyên Kurdî. Pir dûrî ramyariya rojane ya gerim diçe. Lê bîna niştimanperweriyê ji hemiyan tê. Naverokên çîrokên wî tersî

naverokên helbestên wî ne. Pireya mijarên helbestên wî bi ramyariya rojane ve têne girêdan.

## Çîrokên Qedrî Can:

Emê niha jî bi kurtî naverok û stîla her çîrokek ji çîrokên Qedrî can bi kurtî bidin naskirin.

Çaxê merov çîroka pêşîn(Hawar hebe gazî li dû ye) dixwîne, mirov bîna nivîskarekî xwedî zimanekî ciwan û şêweyekî hunerî ye bilind dike. Riya nivîsandinê bixwe dişopîne, cihekî xwe yî bejinbilind di toreya nûjen de çêdike.Vê çîrokê bi şêweyekî Diyalok/danûstendin di navbera bav û law de dinivisîne, rewşa welat û azadîxwaziyê şirove dike. Vê çîrokê diyarî xebatkarê hêja Osman Sebrî yê nemir dike.

Di çîroka (Gundê Nûava) de, pesnê spehîbûn û xweşikbûna gund dide.  Pesnê rez û dar û beran dide. Pesnê deng û awazên şalûr û bilbilê birîndar dide. Dilketiyê dengê wan î şewat e. Rewş û kula welat û miletê xwe tîne bîra xwe. Biyaniya malwêran, hinav û dilê wî dişewitîne. Li vir, şîretan li xortên ciwan dike, dibêje: ”...Carekê werin, hindirê min verojin dilê min jê derînin û bi kêreke tûj çînî çînî bikin, wê gavê ev

çîniyên dilê min ewê bêne peyivîn û pê re bêne girîn..”.

Çîroka (Besreka Zêrîn), diyarî Qedrî beg dike, û bi malek ji helbestê çîroka xwe pêşber dike. Em dibînin hemû bûyerên çîrokê li ser du êl û hozên Kurdan û berberiyên di navbera wan de çêbûne û digerin. Bûyerên çîrokê li dora keça sereke (Pîroz), keça mîrê Besreka Zêrîn û mîrê Burca Metînan (Mîrzo) beg yê bi darê zorê (Pîroz)ê ji xwe re dixwaze, digerin. Mîrzoyê zorkar, bajarê wan talan û wêran dike. Bi darê zorê (Pîroz)ê ji xwe re tîne. Bavê wê (Meks) ji ber susreta ku hetiye serê wî dimre.

Di vê çîrokê de, nivîskar hunera nameyî an toreya nameyî bikar tîne. Piştî pêncî salî, di roja îro de, em dibînin nih nivîskar vê hunerê di çîrok û romanên xwe de bikartînin.

Di çîroka (Hêva Çardeşevî) de, nivîskar rewşa derûna xwe di riya xewnê re diyar dike, ekama di hindirê xwe de der dike, gazî û bangî heyva çarde şevî dike.Bê çewa ewrê reş î tarî mîna dêwekî wê heyvê dadiqurtîne û hertiştî winda dike.

Di çîroka(Sond)de, nivîskar gerdişeke kevin an serhaweyek di civakên kevin û bûrî de tîne bîra me û ji nû ve vedijîne. Ew gerdiş (Birayê xwînê=xwînbira)ye. Zarok xwîna hevdû dimijin, û bi hev re sond dixwin.Yên sondxwarî dibin xwînbirayên hev û heta mirinê bi her hawî arîkariya hev dikin. Ev gerdiş ta niha di nav ola Êzîdiyan de heye, û jê re dibêjin (destbirakê axretê), her mirovek Êzîdî xuhek an birayek ji xwe re dihelbijêre; ji bo li axretê gunehê wî hilgire.

Lehengê çîrokê zarokekî biçûk e. Li dibistanê hevalekî xwe gunehkar dibîne. Lê hevalekî din xurt û bi hêz xwe dide ber gunehê hevalê qelis û hûrik, ji dêvla wî lêdanê dixwe. Evê yekê bandûreke mezin li ramana wî kir. Rojekê tiliya wî birîn dibe, berî dide hevalekî xwe û xwîn-birayiyê jê dixwaze.Li gorî baweriya wî ko hevalê xurt dikare wî ji gelek dijwarî û alûzan riha bike. Em dibînin,di dawiya çîrokê de, hevalê wî yê xurt ne tenê wî ji darê mamoste û alûzan diparêze, belê wî ji devê kûçikê har jî riha dike û xwe bi qurbana wî dike.

Di çîroka (Guneh) de, li vir jî nivîskar li ser rewşa zarokên dibistanê dinivisîne, gelek

serpêhatîyên zarotiyê tîne bîra xwe. Dibêje: ”Qey gava meriv zaro be, mejiyê meriv hêj bêtir nerm û taze ye; ji lewra dîrok û serhatiyê meriv bi hêsanî tê de cih digrin” Çend zarokên dibistanê diçin nêçîra çêlkewan...Şikeftek ji gundê wan bi sê çar katan dûr bû. Ji ber germa havînê, kew tev çêlîkên xwe,xwe davêtin bin siha vê şikeftê. Di şikeftê de kaniyek jî hebû. Lê li gorî tê gotin şikeft cihê pîrebok û cinan bû. Cimo berî da kaniyê. Lehengê çîrokê xwest mêraniya hevalê xwe bibîne, xwe jê vedidize, gava nêzîkî wî dibe dengekî ji xwe derdixe. Cimoyê reben navqe-tandî dibe; jê weye cin in.Ji tirsa veciniqî û ket. Zimanê wî nema geriya. Bavê Cimo wî dibe nik şêx. Şêx jî bi daran li Cimo dixe; ji bo cinan ji laşê wî derxe. lê Cimoyê reben di nav destê şêx de dimre. Lehengê çîrokê/ nivîskarê çîrokê vê bûyerê ji bîr nake. Sawêrên Cimo ji bîst salan ji ber çavên wî narin û her xwe pê gunehkar dibîne.

Vê carê Qedrî Can çîrokekê li ser jiyan û serhatiya mamosteyekî li bajarê Amûdê dinivisîne, bi serenava (Rojên derbasbûyî), bi şêweyê bîranînan çîroka xwe şirove dike. Mamoste/nivîskar li ser gotina bijîşkekî ji Amûdê berê xwe dide Eyndîwerê; ji bo hewa

guhestinê, ew cih jê re berpêş û nîşan dikin. Mamoste pesnê herêmê bi zelalî dide, behsa dost û hogirên xwe dike. Bi guhertina cih û dûrketina ji xelkên herêmê pir dêşe. Di vî warî de dibêje: ”Gava meriv li cihekî dimîne,bi însan û axa wê derê ve bi benên nexuyayî tê girêdan,kînga meriv ji wir diçe, ev benên ha dilê meriv ber bi xwe ve dikşînin û diêşînin...”.

Çîroka (Sehên Zozanan), nivîskar wek serpê-hatiya vê çîrokê jê re hatiye gotin dinivisîne. Ew dibêje: ”Çîroka 'Sehên Zozanan' ne derew e û ne tiştekî xeyalî ye. Min, bi çavê xwe ne dîtiye, lê min bi guhê xwe bihîstiye..”. Ji ber vê yekê cidayiyeke mezin di navbera vê çîrokê û çîrokên wî yên din de heye. Lehengên vê çîrokê seh in, ne mirov in. Ev çîrok li Zebedanî (herêmek li dora Şamê ye) çêbûye. Ji berê de,ji Kurdistanê pez dihat Sûriyê, Felestînê û carina diçû heta Misrê jî.. bazirganek ji dora Erziromê pezê xwe aniye Sûriyê û li Zebedaniyê firotiye...Bi bazirgan re sehekî zozanan jî hebû. Mêvandar sehê wî jê dixwaze. Dibêjin di wê demê de, Zebedanê wargehê gur û hin tebayên din ên kûvî bû, pezên wê herêmê ji guran nedihatin parastin. Bi saya serê sehê zozanan ew herêm ji guran riha

dibe. Dem tê re diçe, se pîr dibe û ji hêza xwe dikeve. Gurên derdora herêmê tev dicivin û li sehê zozanan dibin yek. Sehê zozanan ji mirinê riha dibe. Seh berê xwe dide welatê bav û kalê xwe û du sehên ciwan û bi hêz bi xwe re tîne. Li Zebedanê şêwra xwe dikin. Sehê pîr wekî her carê diçe nav pez, herdiwên dî xwe vedişêrin. Gurên Zebedanê dîsa têne sehê pîr, lê ji nişka ve herdû sehên zozanan xwe davên ser guran û wan tar û mar dikin. Tola sehê pîr hiltînin û vedigerin welatê xwe.

Di çîroka (Gulçîn)ê de,nivîskar naveroka mijareke kevin û nû di yek demê de bikartîne. Şax û baxan jê berdide.Gulçînê keça Newroz begî ye.. nûxuriya dê û bavê xwe ye. Ji alî xweşikbûnê yekta ye. Ji xortekî xizan hezdike,lê ne ji qata wê ye. Bavê Gulçînê ji bo berjewen-diya xwe wê dide neyarê xwe Seydo beg. Lê Gulçîna reben, çi bi serî tê?. Dinya li ber çavê wê tarî dibe. Ji neçarî, di riya pîra Bêzê re berê xwe dide şêxê ko dilan digihîne hev. Piştî demekê, şêxekî biçûk di zikê Gulçînê de dilive. Şêx jî bi vî tiştî haydar dibe. Hinek ji tozika teberika kalikê xwe dikir nav piyalek av û dida Gulçînê,.. roj bi roj Gulçînê, mîna şemalekê dihiliya,...mîna

terhê reyhanekê diçilmisî. Rojekê mîna çirakê ji nişka ve vemirî. Belê, Gulçîn mir, lê hêj di hundirê wê de şêxekî biçûk, şêxekî bê guneh diliviya.

Gulçîn dibe qurbana nezanî û ezezîtiya bavê xwe. Bi destê şêxê yado û fêlebaz çira jiyana xwe vemirand.

Qedrî Can di vê çîroka (Nêçîra berazan) de jî, xewnê bikar tîne. Di nêçîra berazan de, şerekî nexweş, tev bi tirs, dibîne. Paşî xwe li malê, li ser nivînan û li dora xwe xelkên malê û bijîşkê ko bi kevçî derman derbasî devê wî dikir, dibîne.

Tevgera bûyerên çîroka(Serencam) mîna hemû çîrokên wî yên li ser demên bûrî û bîranînên zarotiyê ne. Qedrî Can ji rewşa biyaniyê pir dêşe û her çîrokek ji çîrokên xwe mîna rûpelek ji rûpelên jiyana xwe dibîne. Di vî warî de dibêje: ”Ew pelên ko ji kitêba jiyana min hatine çirandin, îro perçên wan î riziyayî berev dikim, bi hev dizelqînim... dixwazim ji wan, kitêba bextiyariyê çêbikim. Sond.. Guneh.. Rojên derbasbûyî.. Serencam.. her yek ji van, ji kitêba jiyana min a hezîn rûpelekî rengîn in. Lê rengîn

dibin, zengîn dibin, dîsa pelinin çiriyayî û riziyayî ne..”.

Di vê çîrokê de (Serencam), nivîskar navên çîrokên xwe dihejmêre, serhatiya biçûkatiya xwe û birayê xwe Fethî tîne zimên, behsa pîra çîrokbêj û sincoq û beniyan dike.Qedrî Can xwe gunehkarê mirina birayê xwe Fethî dibîne. Birastî, heger ne ji nivîsandina vê çîrokê biwa, dîroka bûyîna nivîskar, wê ji me ve ne zelal biya.

Qedrî Can di destpêka çîroka xwe de (Muhra Silêman), hêvî û lavan dike, ko ew xurtî û hêza helbestvaniya Melayê Cizîrî li nik wî jî hebiwa. Çîroka xwe bi çend xêzên Melê dest pê dike. Çîroknivîs dikeve xewin û sawêran, muhra Silêman li nav destên xwe dibîne, Silêman pêxember wî hînî zimanê teba û firokan dike. Nivîskar li dadgeha firokan (goyîn) pepûk û Kund beşdar dibe. Li ser zimanê wan dibêje: ”Şahê min, tu guh didî kurm û kêzikê zeviyan... ji bav û kalan de ew nêçîra me ne.. gêrik û mûrî jî koleyên me ne,... ne hedê wan e, ko li min gilî bikin û bi min re muhakeme bibin”.Goyîn wekîlê mûriyan rabû û got: ”Çavê xwe veke, efendî! em tovê babilîska bîstane..îro bendeganî û zandeganî nemaye...her kes serbest û azad e..”.

Li hêviya biryara dadmend e. Lê giriyê kurê wî yê biçûk ew ji vê xewê şiyar kir.

Çîroka (Roviyê xapînok) ji folklorê Kurdî hatiye wergirtin. Mijara çîrokê li ser xap û rîpên rovî ne, li ser pepûkî û çavpehinkirina kewk û çêçika mirîşkan ne. Ev çîrok bi zimanekî şêrînû rewan hatiye hûnandin.

**Paşgotin:**

Qedrî Can mamosteyê dibistanê bû. Di gelek çîrokan de, ew bixwe nivîskar/lehengê serekî yên çîrokên xwe ye. Mijarên çîrokên xwe ji civaka Kurdî ya jîwerî wergirtine. Çi jiyana zarokên dibistanê be, çi çîrokên Kurdî yên kevin, yan li ser zimanê teba û baleyan be.

Li gorî xwendina me ji çîrokên Qedrî Can re, diyar e xwediyê yek şêweyî ye. Di hemû çîrokên xwe de, asteyên hûnandina nivîsandinê pir nêzî hev in. Ji niha/dema niho destpê dike, û xwe bera nav dema bûrî dide, çîrokê şirove dike, dîsa vedigere li ser dema niha û dawiya çîroka xwe tîne.

Li gorî hûnandina çîrokan, em dibînin du aste hene, ev jî du asteyên di bahewayê çîroknivîs,

dem û çîrokbêjiyê de, ko ew bixwe nivîskar e, çîrokê dibêje û dipesinîne. Ew hevparê çîrokê ye. Asteyên çîrokbêj û bahewayê wî tev li hev dibin.

Bi rastî, em naxwazin li ser vê mijarê pirtir bipeyivin, ji ber ev cih ne cihê vê mijarê ye. Emê ji rojên pêş re  bihêlin.Tenê me xwest em nerîna xwe -bi kurtî- li ser awayên çîrokên wî diyar bikin.

## Helbest:

Di dema ko di toreya Erebî de dibistana jîwerî dest pê ne bûbû, Qedrî Can sazkarê dibistana jîwerî ya nûjen di toreya Kurdî de bû. Alaya helbesta nuhbûn û nûjeniyê li cîhana toreyê hildabû jor. Toreya miletê Kurd bi kok û rehên wê yên resen ve girêdida û ji êmîş û kaniyên welatê xwe dixwar û vedixwar. Te digot qey dixwaze ji cîhanê re bibêje: (Em in xwedanê şaristaniya kevin di cîhanê de, xwediyê rewşenbîriyeke berfireh in. Em neviyê Cizîrî ne. Li hemberî dirêjahiya bejna demê ne. Em kevin in. Me rehên xwe bera xaka dîrokê dane. Em dikarin bi pêvajoya demê re afrandinên nû û pêşveçûyî di meydana tore û rewşenbîriyê de bafirînin.

Qedrî Can serwerê toreya Kurdî ya nûjen e. Bi pênûseke nû xwe bera meydana toreya Kurdî dida û helbesta pêşîn (Reya Teze) di dîroka helbesta Kurdî ya nûjend de dinivisîne. Bi vê afirandinê, ruxsarî û naveroka helbesta Kurdî ji reh û dûvikiya helbestên miletên cînaran birî û riha kir. Heger xwendevan li berhem û nivîsên wî hûr binêrin wê li peyvên nûbûn, nûjenî, nûkirinê varqilin. Mamoste Rojê Lîsko dibêje: ”Em dikarin helbestvan Qedrî Can sazkarê helbesta Kurdî ya nûjend, digel Şêx Nûrî û pîremerd û Goran bibînin”.

Helbesta Kurdî ya nû, bi şêweya nû, di navbera herdû şerên cîhanê de, bi serkêşiya Qedrî Can dest bi gulvedana xwe kiriye. Guhertinin bingehî di helbesta Kurdî de kirine. Berê helbestê ber bi cîhaneke nûtir vekiriye. Helbesta Kurdî ji kêşan û pêlewazên helbesta ‘Erebî qut kiriye. Ne tenê nûbûn di şêwe û kêşan de kiriye, belê nûbûn di ziman, raman,jiyana civakî û ramyariyê de jî kiriye. Bi nerîneke nû li efsane û jiyana civakî dinêrî. Zimanê wî yê helbestî rewan û pir hêsan e. Mijarên helbestên wî bi mijarên ramyarî yên rojane û gerim ve tên girêdan. Em dikarin bibêjin nihrevanê dema xwe

bû. Gelek ji helbestên wî bûn stran, û li ser zimanê gel dihatin gotin. Nemaze helbesta wî ya bi nav û deng (Berzanî Berzanî), (Begê axir zeman), (Loriya Bedirxan), ya pir bi hostayî hatiye hûnandin.

Di sala 1944-an de, qûnaxeke dîrokî nû di raman û zanyariya Qedrî Can de dest pê dike. Nemaze piştî haydariya wî bi ramana Qomonist re, ev diyarde di mijarên helbestên wî de xweş diyar in.

Helbestên wî yên di salên 1930-î de hatine nivîsîn, tev kilasîk in. Mîna: (Loriya Bedirxan), (Tabûta bi xwîn), (Cegerxwîn), (Şîn li ser giyanê M.Seyda),û....HTD.

Qedrî Can helbestin li ser beg û axan jî nivîsîne. Şerê qata serdest û kedxwer kiriye. Mîna helbestên wî: (Begê axir zeman), (Hesenker).. Gelek caran Qedrî Can helbestên biyanî û bîranîn jî dinivîsandin. Mîna: (Name ji xortên Cizîrê re), (Xewna hişyariyê), û ... HTD.

Bêguman, hemû helbestên Qedrî Can li ser Kurdayetî û niştimanperweriyê ne.

Piştî sala 1944-an -wek me gotî-qûnaxeke nû di ramana Qedrî Can de dest pê dike. Ciwantirîn helbest li ser hin lehengên navdar nivîsandine. Mîna: (Berzanî Berzanî), (Şêr hat welat), (Serokê komara Mehabadê), û...HTD.

Çend helbestên ko bi bûyer û demê ve têne girêdan nivîsîne. Mîna: (Çardehê Gelawêjê), (Name bo êstegehê radyo Tehran), (Cejna Oktober), û....HTD. Hin helbestên şoreşgerî û miletperwerî jî nivisandine. Mîna: (Gula Sor), (Niştiman Birîndar e), (Karwanê Demê), (Li Zindanê Şoreşa me), (Heyva sor), (Dadê), (Di Şorezarekê de) û (Reya Teze) ya bi nav û deng, û.....HTD.

## Wergerandin:

Rewşenbîrekî mîna Qedrî can, jîr û jêhatî, jê ne dûr e ko bi giringî û pêwistiya wergerandinê jî haydar be. Di vî warî de çend karên hêja kirine. Evî nivîskarî çîroka nivîskarê Misrî (Menfelûtî) ya bi navê(Tayek porê sipî) wergerandiye zimanê Kurdî. Tayek porê sipî li nik nivîskar angoya kedxurên Ewropî dide nîşankirin, welatê mirovê reşik (serî) dibîne. Ango porê reş. Tayê porê sipî cihê xwe di nav porê reş de çêdike. Porê reş, bivê

nevê, welatê wî talan dibe. Vêca ji neçarî radestiyê li ber tayê porê sipî dike.

pirtûka rêbarê Rûs Grigorî Pêtrof (Di Welatê Zembeqê Gewir de), li ser daxwaza Dr.Ehmed Nafiz werdigerîne zimanê Kurdî, di rojnameya Roja Nû de, mîna gotaran, perçe perçe, xelek bi xelek dide belavkirin. Qedrî can di pêşgotina xwe de dibêje: ”Ne hewceye ko ez pesnê vê kitêbê bidim... gava xwendevanên me bixwînin ewê bizanin ko ji bona miletê me çiqasî bikêr e. Hêviya min ev e ko miletperwerên me ji dil û can bixwînin û jê ibretê bigrin...”(27).

Biwergerandina her karekî re armancek temîz û bilind heye. Armanca wergêr ji dû vî karî ev e: sûdê ji çanda miletên din bê dîtin, zimanê miletê Kurd pê zengîn û dewlemend bibe. Ji hêleke din ve, serpêhatiyên liberxwedana miletekî mîna miletê Finlendî bindest û perîşan, li hemberî zordarên Siwêdiyan pir dirêj û zengîn e. Finlendiyan welatê xwe bi serkêşiya peyayên zana û hişyar mîna Senleman rizgar kirin. Senleman bi zanîna xwe welatê xwe tev kire Senlemanên jîr û xebatkar.

Qedrî Can hêvî dike ko xortên Kurdan jî mîna wan xebatkar û têkoşeran bin, nifşên nû li ser perwerdeyeke niştimanperwerî û kurdayetî xwedî bibin. Welatê xwe yê bindest ji zorkeran rizgar û riha bikin û bi azadî û serxwebûnê şa bibin.

***Çevkanî û jêder:***


1-Giramêra Zimanê Kurdmancî,Celadet Bedirxan, û Rojê Lîsko, wergerandina Dilawerê Zengî, Şam.sal:1990.

2-Kultur, Huner, û Edebiyat.Firat Cewerî,weşanên Nûdem, Stockholm 1996.

3-(Edebiyatî niwî Kurdî),Izedîn Mistefa Resûl,Erbîl,1990.

4-(Rûpelin ji toreya Kurdî),Rewşen Bedirxan.

5-(Dîmuqratî),Roj- rojane ye,nivîskar:Hesen Qeya, Istenbol, hejmar:66,sal: 1997,r9.

6-Kovara Metîn,Gotara Edîb Nadir,30-Avdar-1994.

7-Rojnameya Armanc,gotara Silêman Elî,

8-Tarîxa edebyeta Kurdî,Qenatê Kurdo,cild 1,stockholm, 1983.r177.

9-Rojnameya Roja nû,Çîroka(Serencam),h:2,sal:1943,r:4.

10-Jêdera berê..

11-Jêdera berê..

12-Kovara HAWAR,h:1,sal:1932.r:5,6.

13-Bîranînên Cegerxwîn.

14-Dîtinek kesînî.

15-Dîtinek kesînî.

16-Dîtinek kesînî.

17-Pertûka (Taxa Kurdan di bajarê Şamê de),nivîskar Izedîn Elî mele. Şam, Sal:1998.

18-Kovara Metîn,jêderê berê.

19-Jêdera berê.

20-Rojnameya Armanc,jêderê berê.

21-Qenatê Kurdo,jêderê berê.

22-Dîtinek kesînî.

23-Qenatê Kurdo,Jêderê ber.

24-Jêdera berê.

25-Bîranînên Cegerxwîn.jêderê berê.

26-Dîtinek bi keça wî Dr. Şêrîn  Qedrî can re.

27-Rojnameya Roja Nû,(Di welatê zembeqê gewr de), hejmar: 4, sal: 1943, r:4.

# Osman Sebrî

## (1905-1993)

## (Jiyan, Tekoşîn û Berhem)

### Jiyan, tekoşîn û xebata Osman Sebrî:

Di roja 05/01/1905-an de, Osman Sebrî li bakurî kurdistanê, gundê Narincê, qeza Kextê ji wîlayeta Semsûr (Adiyeman) hatiye dinê. Bavê wî, serekeşîrê Merdêsiyan e. Navê bavê wî Sebrî[6] ye. Navê diya wî Emîne ye. Di bîranînên xwe de Osman Sebrî li ser hoza xwe weha gotiye:

(Eşîra me Merdês perçeyek ji emareta-mîrnişîna- Mirdês e ku sernîveka wê bajarê Egilê bûye. Piştî qelsî û ji hevdeketina emaretê mîrekan her yekî aliyekî emaretê bi navê eşîrê xistiye bin destê xwe. Ji kalê min Mihemed ku tevî eşîra xwe (Merdêsê Gawestî) hatiye erdê ku îro bi Mirdêsan hatiye nasîn, heya digehê min, em neh bav di wî erdî de rûniştine).

[6] -Sebrî Emîne ji xwe re anî, lawek bi navê Osman û du keçan (Horiye û Emîne) ji wan re çêdibin.

Osman Sebrî di deh saliya xwe de bavê xwe winda dike. Piştî ku bavê wî diçe ser dilovaniya Xwedê, diya wî Emîne, bi apê wî re, ango Şikrî axayê Merdêsiyan re hevjîn dike. vêca li şûna bavê wî Apê wî yê mezin (Şukrî) bi kar û barên hoza Merdêsan ve rabû û bi dilovaniyeke mezin jî (Osman Sebrî) li ser rêzan û rêdanên hozanî xwedî kir . Osman Sebrî li ser xwendina xwe ya destpêkê weha diyar dike: (Dawî sala 1917-an mamostayek ji me re hat û wê salê min şehadeta îbtîdaî istend. Sala din apê min ez şandim Kextê dibistana Rişdiyê. Di nava sê salan de min şehadeta xwe li wir jî sitand). Apê Osman di dermafê rewşa rêzana eşîrtî û zû-jinanînê de gotiye: "Sala 1920-an de min şehadeta xwe ji Rişdiyê bir û vegerîm çûm mal da ku hînî rê û rêzanên eşîrê bibim. Sala 1922-an payîzê ez hevde salî bûm ku ji min re jin anîn. Piştî salekê ji min re lawek bû (kurrê min Welato)"[7].

[7] -Hevjîna wî ya yekemîn dotmama wî Eyşê bû lawekî bi navê (Welato) jê re tîne, di demek kurt de hevjîna wî dimre. Lawê wî Welato di temenê çel û heft saliya xwe de ango sala 1970-î li serxetê bi destê dijminên apo tê kuştin. Li Sûriyê-Şamê careke din apo jinê tîne. Hevjîna wî ya diwemîn Çerkes e navê wê "Şadiye" ye. Şadiye xanim sê lawan (Hoşeng-1945, Hoşîn 1946, Heval-1955) û du keçan (Hingûr-1948 û Hêvî-1951) jê

Apê osman ji rêzana êlî û eşîrtiyê kiz û jê teng dibe ûştê vê yekê jî diyar dike: (Sebebê vê guherrîna han bi navê (Ismaîl efendî) mamostayek bû. Vî camêrê han çavên min li ser kirêtiya rêzana Derebegîtiyê vekir).

Demeke kurt Osman Sebrî li kêleka Apê xwe Şikrî axa bi karûbarên hoza Merdêsan ve rabû , ta şoreşa Şêx Seîdê Pîran destpêkir, di wê hingê de wan jî xwest di hawara şoreşê de herin û soz û peymanên xwe bi Şêx Seîd re bibin serî, lê sed heyf û mixabin şoreş zû beravêtî bû, Şêx Seîd û 48 hevalên wî di havîna 1925-an de li Amedê hatin bidarvekirin.

Piştî têkçûna şoreşa Şêx Se'îdê kal di sala 1925-an de, dewleta Turk dest bi siyaseta helandina bi darê zorê kiriye ko bi siyaseta tirkkirinê (tetrîk) têt naskirin. Dasa şer, hişk û ter da ber hev. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajaran kirin. Çek ji

---

re tîne. Kewê bixwe dibe keça birayê apo Osman yê ji alî dê ve. Piştî mirina bavê Osman Sebrî apê wî Şukrî diya wî ji xwe re tîne lawek bi navê Şewket û du keçan Behiye û Adalet ji wan re çêdibin. Şewketê Şukrî Emîxanê ji xwe re tîne. Berî keça wî Kewê -1948-an çêbibe bi heftiyekê Şewket dimre. Vêca ji neçarî apo Osman wê tîne binxetê û xwedî dike.

destê hoz û eşîrên kurdan wergirtin. Berê agirê setemkariyê giha hemû warên jiyanê (aborî, civakî, siyasî û rewşenbîrî). Bi sedhezaran kurd dûrî welêt xistin. Kurdistan kirin dojeh. Gelek ji wan siyasetmedar û welatparêzên kurd penaberî Sûriyê, Îraqê, Îran û Ewropayê bûn. Lê digel van karan tevan jî dewleta tirkan nikarîbû viyan û hêviyên kurdan ji dest û hizrê wan yê neteweyî bibire û rehên agirên serhildan û berxwedanên wan vemrîne. Ew agirê ko li Çiyayên Cabikcûr, Farqîn, Sason û Agiriyê vêxistî mabû di şerê xwe de berdewam bû.

Di roja 24/06/1926-an de, Tirkan her du Apên wî (Şikrî û Nûrî), li Amedê bi darvekirin. Osman Sebriyê ciwan jî wê demê tê girtin û hetanî sala 1928'an li Denîzleyê di zindanê de dimîne. Piştî ji zindanê derdikeve, vedigere Meletyê û karê xwe yê welatparêziyê û dijberiya rejîmê didomîne. Li ser vê yekê carekî din bi tevî 26 serokeşîr û axayên Kurdan ve tên girtin û çendekî li zîndana Meletyê dimîne. Piştî heft mehan ew û axayên din tên berdan; lê hukumet dîsa li pey wî ye. Carekî din biryara girtina wî hat, bi gotina Cegerxwîn: "biryara îdama wî derdikeve". Lê Osman Sebrî xwe nade dest. Vêca

ji neçarî, di roja 24/12/1929-an de, ji bakurê Kurdistanê– Serxetê – daket û berê xwe da rojavayê kurdistanê –Binxetê; xwe li hoza Berazan girt li bajarê Kobanê serokê vê hozê Mistefa û Bozan Şahîn Beg bûn yên ku endamên komela (Xoybûn)ê bûn. Osman Sebrî xwediyê wê baweriyê bû ku êdî veger ji vê riya dûr û dirêj nema, lewra dibêje:

(Mirovekî ku pêleke dirêj ji jîna malbata wî di şerê sitemkar û zorbazên Tirk de borî be, ne dûre ku ew jî hemî jîna xwe di wê riya bi rûmet de biborîne. Herçî ez, rika kolîdarên Tirk ên zorbaz û hezkirina welat û gel digel hev min di rêya têkoşînê de dehf didin. Ji lewre eger ez di fikir, raman û xebata xwe de qelsiyê rave bikim ji bextereşiya min e).

Li Binxetê, li ser destê Mîr Celadet Bedir-Xan Osman Sebrî dibe endamek ji endamên komela (Xoybûn)ê, ew komela ku di sala 1927 an de ji rex welatparêzên Kurdan ve li beyrûdê hatibû damezirandin. Di vî warî de Osman Sebrî gotiye: (Piştî hatina Sûriyê bi sê çar heftiyan Celadet Bedir-Xan hatibû Kaniya Ereban (Kobanê), piştî em rûbarî hev bûn li ser destê wî ez bûm endamê partiya Xoybûnê ...).

Li ser daxwaz û biryara Xoybûnê Osman Sebrî derbasî serxetê dibe; ji bo gihandina nameya Seyid Riza li herêma Dersimê û belavkirina belavokan bû. Lê mexabin, ev karê wî neçû serî û paşve vedigere.

Piştî ku derbasî Sûriyê dibe, hikûmeta Kemalî ji hikûmeta Fransî ya ku di Sûriyê de karbidest bû doza xwestina wî kirin; lê Fransiyan ne dixwstin ku Osman Sebrî radestî Tirkan bikin, ji ber hin berjewendiyên xwe, vêca ew ji Kobanê surgûnî bajarê (Reqa)yê kirin; da ku ji sînor dûr be.

Di sala 1930-î de, endamên komela Xoybûnê biryara alîkariya şoreşa  Agirî wergirtin û kar û barê xwe kirin ku ji sînorê binxetê derbasî serxetê bibin. Xoybûn şeva 3ê ser 4ê tebaxê sala 1930-î roja êrîşkirina ji başûr- binxet ber bi bakur-serxet ve biryar stendin. Serkirdayetiya Xoybûnê enya şer ji Cerabulsê ko li ser ava Feratê dikeve, ta Endîwarê li ser ava mezin Dicle, li ser şeş deveran ji rojava ta rojhelat bi ser endamên Xoybûnê de leva kirin. Devera Kobanê: Bozan Şahîn beg û birayê wî Mistefa beg serokên hoza Beraziyan, û Osman Sebrî berê wan li Urfayê û Mereşê bû û Osman Sebrî wê ber

bi hoza Merdîsan here. Lê, mexabin dema xwestin ji başûr êrîşî dewleta tirkan bikin, gelek ji wan axa û begên ko soz dabûn, sozê xwe xwarin û pê ranebûn. Tenê Osman Sebrî û çend peyayên Beraziyan sînor derbas kirin, şer kirin û hindek ji belavokan belav kirin, lê mexabin ji neçarî bi şûn de vegeriyan.

Piştî vê rewşa dijwar cih li wî teng dibin û berî dide kurdistana başûr. Li wir tekoşerê mezin rehmetî Şêx (Evdilrehmanê Garisî) nas dike. Osman Sebrî bi xwe wisa gotiye: (Di sala 1930-î de, li Barzan min û rehmetî Şêx (Evdilrehmanê Garisî) hev nas kiribû û serekî dirêj bi rehmetî re bibûm heval...).

Osman Sebrî ji vegera xwe ya ji Iraqê, 1930-1931-an ew li Mûsilê ji rex hikûmeta Ingilîzî ve tê girtin û bi rewşeke perîşan xwe ji nav lepên wan Ingilîzan reha dike[8], diçe Uman û Felestînê,

---

[8] -Li ser gotina mamoste Hac Ebdilferîdê mele Ibrahîmê Golî ko bi xwe ji devê Osman Sebrî bihîstibû dibêje: Dema Ingilîz xwestin Osman Sebrî radestî turkan bikin, ew ji Mûsilê ber bi Şingalê ve birin. Di wê çûnê de, du rêvingên êzîdî pê re li otobosê siwar in. Danûstendin di nav wan û Apo de çêdibe. Osman Sebrî diyar dike ko Îsmaîl beg ji xelkê çiyayê Şingalê pê re di zindanê de girtî bû. Herdû rêvingên êzîdî rewş û sedemên giriftariya O.Sebrî baş nas dikin û bi lez hawara xwe

dîsa vedigere berî dide bajarê Şamê û xwe li welatparêz û ronakbîrên penaber digre.

Civata pêşî ya wan penaberan li mala welatparêzê Kurd Elî Zilfo axa- li taxa Kurdan- li bajarê Şamê bi serokatiya Mîr Celadet A.Bedir-Xan tê girêdan. Di wê civîna pêşîn de Mîr Celadet A. Bedir-Xan ev gotina xwe ya dîrokî pêşkêşî wan kir û got: ”Gelî Kurdan..! Gelî rewşenbîr û welatparêzên delal... Şoreş û raperînên me bi çekan serneketin û ne jî gihan armancên xwe... Niha ji me tê xwestin ko em bi pênûsê, bi zanîn û rewşenbîriyê, gelê xwe hişyar bikin, û pê şerê dijminê gelê xwe bikin. Em, dîrok, tore, folklor û rewşenbîriya xwe nasbikin û xwe bi cîhanê bidin naskirin... Bila zanîn çekê me be..”.

---

digihînin xunkarê çiyayê Şingalê (Hemê Şero û lawê wî Xwedêda) û serpêhatiya girtina Apo ji wan re diyar dikin. Xwedêda bi lez û bez xwe digihîne ingilîzan û ji wan dixwaze ko Apê Osman radestî turkan nekin û wî berdin. Di nav bera dibe û nabe.. Xwedêda dibêje: "Eger hûn O.Sebrî berdidin berdin, hûn bernadin wê xwîn li çiyayê Şingalê biherike". Bi saya van lehengên çiyayê Şingalê, O.Sebrî ji destê Ingilîzan reha dibe.

Bi van gotinên pir bi akam û hêja Mîr Celadet Alî Bedirxan ronaka xebatê li pêş wan vêxist û berê xebatê da pênûs û zanînê.

Şoreşger û welatparêzên mîna Celadet, Kamiran, Osman sebrî, Cegerxwîn, Hesen Hişyar, Qedrî can,...û hwd. Riya xebata wêjeyî û rewşenbîriya kurdî qelaştin. Bi hest û ramaneke kurdistanî bingehê kultûr û çandeya kurdên binxetê danîn. Ew hest û xebata wan ronakbîran, sînorê çêkirî di nav perçên kurdistanê de derbas kirin û têkilî û danûstendinên xwe bi perçeyên dî re ava kirin.

Kovara “Hawar”-ê, di 15-5-1932-an de, der xistin, û pê re jî wêjeya kurdî, li binxetê, derbasî qunaxa wêjeya nivîskî û nûbûyî kirin, nemaze jî piştî çapkirin û weşandina alfabeya latînî.

Bi piştgiriya Celadet Bedirxan apê Osman ji eniya şer û cengan cihê xwe di eniya rewşenbîriyê de, di rêz û benda pêşî de, bi pênûseke bejinbilind û hêja cihê xwe digre. Ne tenê wek nivîskar, helbestvan û wergêr, belê wek hîmdar û rêveberê kovarê jî.

Lê Apo[9] tim û tim çavê wî li rewşa ramyarî, şoreşgerî û xebata çekdarîyê digeriya. Ji ber liv û karê wî yê ramyarî gelek caran dihat giriftarkirin, lê ko dihate berdan dîsa vedigeriya kar û xebata xwe. Tucar çavê wî ji zindan û girtîgehan nedişkest.

Di sala 1935-an de, du caran li Libnanê tê girtin û ji wir hikûmeta Fransî wî surgûnî Afrîqayê (Girava Medexeşqer)ê kirin, lê ma ta bi sala 1936-an. Ji ber hin sedemên navxweyî, di sala 1938-an de xwe dûrî komela Xoybûnê kir, çavên xwe li hin saziyên din ji kar û xebatê re digerîne. Her roj û her demên wî di bin girtin û di dijwariyê de derbas dibin. Gelek caran, heta bi gotina Osman Sebrî bi xwe, di jiyana xwe de (18) caran tê girtin û zîndanîkirin. Ne tenê li Tirkiyê û Sûriyê, li Libnan û Iraqê, ango li Mûsil û Bexdayê de jî di zîndanê de dimîne û (12) salan ji temenê xwe di girtîgehan de dibûrî ne. Lê ev

[9] - Bi navkirina Osman Sebrî bi navê Apo ji ber vê yekê hatiye: Osman Sebrî pir ji navkirinên (Axa, beg û paşan) kiz û dil teng dibû digel ko ew bixwe ji malmezinên kurdan bû. Ewî ji binavkirina Apo ji xwe re hez kir û li dijî navkirinên dî derdiket. Ji hêlek din ve ji ber rêzgirtin û rêzdariya kesîniya Osman Sebrî her kesî bi Apê Osman bandikirê. Nemaze xanima hêja Rewşen Bedirxan.

zilm û zor, wî ji riya xebatê venagerîne. Wekî ku Cegerxwîn dibêje: (Ew – O.Sebrî- gelperestekî xurt e û bi dostê xwe re dost, dijminê xwe re jî dijmin e). Wî û çend kesên din komelek bi navê (Yekîtiya Xortan) li bajarê Şamê damezirandin û vê dawiyê xwe tevlî (Nadî Selah Eldîn ya rewşenbîrî) dikin, navê nadiya xwe guhertin kirin (Nadî Kurdistan), kar û xebata van Nadiyan hînkirina xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî û geşkirina hestê neteweyî bû.

Piştî ko Sûriyê ji bin destê sîdariya Ferensa rizgar bû, alîkarî û piştgiriya Kurdan ji xwe re jibîr kirin. Hemû civat û libatên Kurdan hatin qedexe kirin.

Di sala 1949-an de, heyama desthilata Husnî Ze'îm Osman Sebrî hat girtin û di pey re hat surgûn kirin û ew avêtin bajarê (Tudmir)ê, di wê demê de conta leşkerî li desthilata Hisnî Zeîm rabû û desthilat hate guhertin, bi wê guherînê re Osman Sebrî ji surgûniyê reha bû .Vegeriya Şamê û mala xwe barkir nav Kurdên Cizîrê, li dora du salan li bajarê Dirbêsiyê dibe mamûr di mîra de. Bi biryara wezîrê hundir wî ji kar dûr dixin.

Di sala 1951-ê de, li parêzgeha Helebê (Komela rewşenbîrî) hat damezrandin. Endamên wê komelê: Reşîd Hemo, Şewket Henan, Mihemed ‘Elî Xoce û Qadir Ibrahîm bûn. Armancên wê belavkirina rewşenbîrî û hestê neteweyî bû. Lê mexabin di wê salê de tev hatin girtin û komele têkçû.

Di sala 1953-an de, Edîb Şîşeklî, Sûriya xist bin rejîmek leşkerî û bû serekomarê welêt. Bi hatina leşkeran zoreke mezin ket ser welat û gelê Sûriyê. Pir dirêj nekir bi destê hin efseran hate rûxandin, û gelê Sûriyê ji zulm û zora wî hat reha kirin.

Di sala 1953-an de, ‘Civata Yekîtiya xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê’ hate damezirandin. Damezirênerên civatê:

Mihemedê Mele Ehmed, Samî mele Ehmedê Namî, Evdilezîzê Elî Evdê, Derwêşê mele Silêman bûn.

Hêjayî gotinê ye ko evê Civatê û yên din tevan piştî damezirandina Partî (1957)-an xwe helkirin.

Di sala 1955-an de, li bajarê Şamê li mala nivîskar Osman Sebrî komela (Vejîna Çanda Kurdî) (Encûmen) hate damezirandin. Endamên wê: Osman Sebrî, Hemîd Derwêş, Mecîd Hac Derwêş, Mihemed Salih hac Derwêş, Xidir

Ferhan ‘Îsa û ‘Adil ji çiyayê Kurmênc û Se’ed (Se’do) Îbo bûn. Mexabin evê Komelê salekê dirêj nekir.

Di sala 1956-an de, li bajarê Helebê Komela (Zanistî û alîkariya Kurd) hate damezirandin. Damezirênerên komela Zanistî û Alîkariya Kurd:

Dr.Nûrî Dêrsimî, Rewşen Bedirxan, Hesen Hişyar, Osman Efendî û Heyder Mihemed Kinco bûn.

Di sala 1956-an de, Apo Osman û Dr. Cemal Nebez bi hev re li ser peydakirina alfabeyeke latînî tekûz xebitîn û bingehên rêzana avakirina korî zanyarî kurd danîn. Lê mexabin bi çûna mamosta Cemal Nebez dervayî welêt re ew piroje li şûn ma.

Di sala 1957-an de, li bajarê Şamê Komela Xwendekarên kurd li zangoya Şamê hat damezirandin. Endamên vê komelê ji kurdên Sûriyê û Iraqê bûn. Diyar e tu lebata wan nebû zû dengê wan vemirî.

Di sala 1957-an de Partiya Azadî li bajarê Qamişlo hate avakirin.

Damezirênerên partiyê: Seydayê Cegerxwîn, Mihemedê Fexrî, Mela Şêxmûsê Şêxî û Mela Şêxmûsê Qerqatî bûn.

Ji hêlek din ve, piştî şoreşa Yûlyo 1952-an, li Misrê û hatina serok Cemal Ebdilnasir û şoreşa 1958-an, li Îraqê dengê dozdarên neteweya Erebên neteweperest û nijadperest li herêmê pir bilind bû. Ji encama vî bayê neteweperestiyê û gurbûna nijdperestiya Ereban, kurdan dest bi tekoşîna neteweyî kirin, û ji bo pêkanîna mafê xwe yê dadimend kar kirin. Hestê neteweyî di nav kurdên binxetê de xurtir û geştir dibû nemaze piştî vegera nemir Barzanî ji Sofyêtê sala 1958-an û pêxistina agirê şoreşa 1961-ê li başûrî kurdistanê.

Di 14-6-sala 1957-an de, Partî hat damezrandin. Di destpêkê de navê Partî: ”Partiya Demokrat a Kurdistanî bû, û yekemîn armanca wê ya giring rizgarkirin û yekirina Kurdistanê bû.

Li vê dawiyê navê Partî guhertin; (Partî Demoqrat ya Kurd li Sûriyê), û ji armanca rizgarkirin û yekirina Kurdistanê hatin xwar. Bi ava kirina partiyê re qûnaxeke nû di civaka kurdên binxetê de destpê kir. Her welatparêzekî kurd, xwe li dora partiyê di dît. Endamên komîta navendî ya partiyê ev bûn: Osman Sebrî, Şêx Mihemed Îsa, Hemîd Hec Derwêş, Hemzê

Niwêran, Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed, Şewket Henan,..h,d.

Rewşa Sûriyê ji sala 1954- 1958-an de berî yekîtiya di navbera her du hikûmetên Sûriyê û Misrê de çêbibe, gelê Sûriyê di bin siya hikûmeteke welatî û perlemanî de, jiyaneke xweş di warê siyasî, civakî û wekheviyê de domand. Lê, dîsa jî gelê kurd ji hemî mafên xwe bê par bû.

Piştî yekîtiya herdû hikûmetan berî her tiştî, demokrasiya heyî û hukmê Perlemanê bi rejîmek diktator hate guhertin, û biryar bi helandina partiyan hat dan. Lê partiya Demoqrat a Kurd û partiya qomonîst a Sûrî ew biryara nehêlana partiyan red kirin, û xebata xwe ya nependî berdewam kirin. Roj bi roj rewşa gelên Sûriyê ber bi nebaşiyê ve diçû. Di bin darê zor û setemkariyê de gelek welatparêz û xebatkar di bin îşkencê de hatin êşandin û kuştin.

Osman Sebrî ji wan girtinan bêpar nema, di roja 12.8.1960î de, tevî Dr. Nûredîn Zaza û (31)[10] hevalên xwe tên girtin. Ji zindana Helebê

[10] - Di roja şemiyê 5-12-1960-î de li bajarê Şamê -Dadgeha Parastina Dewletê ya Bilind a leşkerî hat girêdan. Dadgehê li hemberî van girtiyan da'wa vekir: 1-Elreqîb Muhemed Elî Heso ji Qamişlo, 2-Nûredîn Zaza Sebrî ji Dîmeşqê- Ezbekiyê, 3-Reşîd Hemo ji Efrînê, 4-Ebdilmecîd Çaçan ji Qamişlî-Tirbesipî, 5-Osman Sebrî ji Dîmeşiq- Şêx

berê wan dan Mezzê li Şamê man ta roja 20.2.1962an. Di vê girtinê de, pir nakokî di nav girtiyan de derketin holê. Hêjaye ko bi kurtî li ser vê girtinê baxivim:

Dadgeha Parastina Dewletê ya Bilind a Leşkerî bi serokatiya serbaz Derwîş Elzûnî û herdû endamên dadgehê serbaz Ednan Raxib û Ebdurehman Xefîr hat lidarxistin. Nûnerê cihgiriya giştî Yasîn Eragîlî bû. Li gorî nerîna dadgehê Osman Sebrî, Dr.Nûredîn Zaza, Reşîd Hemo û hevalên xwe.- Girtî tev -31- kes bûn-. Bi

---

Mihyedîn, 6-Ehmed Henan ji Efrînê,7-Seyid Muhemed Reslan ji Efrînê, 8-Kemal Cemîl ji Efrînê, 9-Umer Mustefa ji Kobanê,10-Hesen Ebdo Osman ji Efrînê,11-Muhemed Ehmed Elehmed ji Qamişlo, 12-Mehmûd Şewket ji Efrînê, 13-Xelîl Umer –leşker e- ji Efrînê, 14-Şewket Husên, 15-Muhemed Elî Ehmed ji Helebê,16-Mustefa Ibrahîm Mustefa ji Kobanê, 17- Umer Ebid Kurdî ji Helebê,18- Hesen Xelîl Yûsif ji Helebê, 19-Nihai Ce'fer ji Efrînê, 20-Muhemed Xelîl Yûsif ji Qamişlo, 21-Mustefa Hesen ji Efrînê, 22-Muhemed Elî Şêx Osman ji Efrînê, 23-Mehmûd Salih Baqî ji Kobanê, 24-Ehmed mele Ibrahîm ji Kobanê, 25- Ebdulqadir Kurdî ji Dêrikê, 26-Muhemed Samî (….) ji Qamişlo, 27-Ken'an Egîd ji Dêrikê, 28-Newaf Nayif Mustefa ji Qamişlo,29-Ebdullah Salih ji Eyndîwar, 30-Umer Mustefa Ferzat ji Dêrikê,31-Sadiq Muhemed Mîrza ji Qamişlo.

- cihgirê giştî yê dadgehê di biryara gunehbarkirinê de- doseya wan heft rûpel in- ji her Sêzde girtiyên pêşî re zindankirina timî –muebed- (timî) xwest, û ji hejde -18- girtiyên mayîn re di navbera pênc -5-salan ta bi bîst -20- salan zindankirin xwest.

- li ser vê mijarê ji bo agahiyên pirtir li vê pertûkê vegere: -Ji Toreya Dozê, danhev û amadekirina Dilawerê Zengî û Ehmed Şehab. Elmanya-2011. Bi zimanê Erebî ye.

gunehê ko ev girtî: (dixwazin perçakî ji erdê Sûriyê qut bikin û bi ser dewleteke biyanî ve ber din) gunehbar in. Ji hêleke din ve, di dadgehê de, li ser rêzan û biryarên partî hate rawestandin, gunehbariya herî giran ji pirsên dadgehê yên li ser rêzan û biryarên partî: (Ev Partî dozdarê avakirina dewleteke kurdî ye) û ji armanca wê: (Rizgarkirin û yekirina Kurdistanê ye). Mexabin, ji girtiyan gelek kesan rêzan û biryarên Partî neparastin û xwedî lê derneketin. Lê, Osman Sebrî li ber dadmendê dadgehê mîna lehengan rêzan û biryarên partî tev parastin û wekî parêzerekî serbilind bê şîvîşk û bivac qirên û gelş di dadgehê de kir û ji armanc û biryarên Partî û ji hebûna Kurd û Kurdistanê nehat xwar. Digel ko ew bixwe ne bi wergirtin û hildana wan biryarên Partî re bû. Digot: (Dema rêzan û biryarên Partî hatin danîn ez ne bi van dîtin û biryaran re bûm, sîmbol û biryarên me hilgirtine ji gewdê me bi gelekî mezintirin, em nikarin  dibin de rabin. Lê hevalan weha xwest. Li ber dadgehê heyfe li gotinên xwe xwedî derneketin. Digel ko ne baweriyên min bûn, lê, dîsa min ew parastin). Bi gotina hemû hevalên wî, apê Osman bi tena xwe di dadgehê de li rêzan û biryarên Partî  xwedî der ket, nemaze xwedî li her sê herêmên kurdî (Cizîr,

Kobanê û Efrîn)ê wek perçên Kurdistanê parastin. Ji hêla têkiliyên Partî bi dervî welêt re, dadmendê dadgehê jê pirsî:

- Hûn şaxek in ji Partiya Demoqrat bi serokatiya Barzanî ya li Îraqê?!.

-Na, em partiyek serbixwe ne.

-Tu wan çawa dibînî?.

- Xwedê hêz û xweşiyê bide wan.

Ji ber vê mêraniyê O.Sebrî du salan tê girtin û ji hevalên xwe tevan pirtir tê zindankirin.

Di destpêka meha sibata sala 1962-an Partî; (Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê) konfiransa xwe ya pêşîn li bajarê Şamê girêda. Osman Sebrî li vê konfiransê beşdar nabe; ji ber ko girtiyê zindanê bû.

Di destpêka sala 1963-an de, konfiransa diwemîn li bajarê Qamişlo bê beşdariya apê Osman tê girêdan, ji ber ko apo ji ber hukûmetê xwe dabû alî çûbû Libnanê. Di vê konfiransê de, wek endamê komîta navendî tê hilbijartin.

Di sala 1964-an de konfiransa siyemîn li gundê (Cim'ayê) bê beşdariya Osman Sebrî tê girêdan. Ji ber ko careke din ew û hinek hevalên xwe û kurê xwe Hoşeng di 23-5-1964-an de, li Helebê hatin girtin û di zindanê de mane ta bi dawiya sala 1965an.

Di 5-8-1965-an de, Partî konfiransa xwe li gundê (Cim'ayê) bi beşdariya endamên herêman, endamên şaxan û nûnerên komikan girê dide. Ûştê girêdana vê konfiransê ev bû; çareserkirina nakokî û aloziyên di nav partiyê de. Lê mexabin ev konfirans bû bingeha perçebûna Partî û maka avakirina Partiyeke nuh. Bi navê partiya Çep a Kurdî hat naskirin. Careke din ji ber girtin û zindanê Apê Osman beşdarî vê civatê nabe, lê ew hemû biryar û pêşinyarên konfiransê erê dike.

Di sala 1966-an de, li Qamişlo- gundê Hilêliyê bi serokatiya Apo Osman partiya çep kongirê xwe yê yekemîn girêda. Piştî kar û barê kongir bi dawî hat, Apê Osman berî dide bajarê Şamê, li devê rê û berî bighê bajarê Helebê tê girtin.

Di sala 1968-an de, Partiya Çep konfiransa xwe ya diwemîn li bajarê Amûdê bi serokatiya Apê Osman girêdide. Lê, mexabin di hundirê konfirans de pir nakokî di navbera Apê Osman û hin endamên rêvebir de diyar dibin. Piştî demeke pir kin-destpêka sala 1969-an e- Apê Osman li mala xwe rûdinê û nema tu karê partîtiyê dike.

Di sala 1969an de, dadgeha dewletê biryar bi du salan Osman Sebrî bê zindankirin da. lê wî xwe nespart destê wan û di 4/6/1969-an de, berî da serxetê. Piştî du-sê mehan vedigere. Li vegerê

tê girtin, di zindana (Qel'e) de li Şamê dimîne ta sala 1973-an.

Her ku di çû nakokî di navbera herdû partiyan (Çep û Rast) de germtir dibû. Heta nemir Barzanî bixwe nikarîbû ew birîn derman bikra, û ji kongirê (Nawberdan) ji dêvla yekirina herdu partiyan, yeke sisiyan sala 1970-yî, di bin navê “Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê – Elpartî” de hate damezirandin[11].

Bêdiro, Osman Sebrî bi derd û kovan, xweşî û nexweşî, paşketin û pêşveçûna gelê xwe re dijiya. Radestî li ber narvînê nekirye, û xwe dîlê hêvî û lavlavan nedîtiye. Lewra digot:“ jîn berxwedan e”. Ango, ûştê azadî û xoybûnê zor e. Zor nebe setem naçe. Bi lavlavan merov nagihê armanca xwe. Belê, bi baweriya tekoşîn şana hebûnê ye bawermend bû, ji neçarî pişta xwe da xebata ramyarî û bi dilekî kuldar û xemgîn, di hêvî û gumana ko rojekê ji rojan wê roja azadî û serxwebûna kurdistanê hilê. Lê, sed heyf û mexabin tim û tim ji kurdên xiniz, guhbel, nandoz, ezezîperest û nokeran piştkul bû. Di vî warî de digot: (diyar e, em kurd bi xwe nikarin kurdistanê çêkin, di demekê de, wê hinek

[11] -Di sala 1972-an de konfiransê xwe yê yekemîn girêdan.

kurdistanê ji me re ava kin. Lê, tirsa min ew e ko ew kurdistan bi destê kurdan xera bibe).

Di sala1971-ê de, hukûmeta Sûriyê nasnameyê jê dikşîne û her jiyana xwe tev di bin çavdêriya dewletê de derbas kir. Ji vê qûnaxê û pê de mala apê Osman li bajarê Şamê-taxa kurdan dibe mîna dibistana perwerdekirina kurdayetî û fêrkirina zimanê kurdî. Gelek xortên kurdan ji vê dibistanê hînî kurdayetî û rastnivîsandin û rastxwendina zimanê kurdî bûn. Ji hêleke din ve, bandora wî di warê rewşa civakî de li kurdên taxê baş diyar bû. Gelek aloziyên civatî çareser dikirin û bi saya serê wî kurdên Şamê navên kurdî li zarokên xwe dikirin. Ew cihê bawerî û rêzgirtinê bû. Deriyê mala wî ji her kesî re vekirî bû.

Bi şanazî dibêjim: Ez yek ji wan xortên ko li ber destê wî hînî nivîsandina serbest û serwextî gelek tiştan bûm.

Di roja 11-10-1993an de, li bajarê Şamê-taxa kurdan koça dawî kir, û li Cizîrê- Berkevirê hate veşartin. Hezar mihder li giyanê wî û hemû welatparêzan bibarin û cihê wan buhişt be.

Hêjayî gotinê ye, di 09.01.1998-an de, sêmînerek ji aliyê hin wêjevan, rojnamevan,

rewşenbîr û nivîskarên Kurd ve, li mala nemir Osman Sebrî, li bajarê Şamê pêk hat, daku bûyera buhartina 93-ê salan di ser roja bûyîna Osman Sebrî re, careke din were pîrozkirin, û avakirina şêwazekî rûmetiyê ji bo kesayetiya Osman Sebrî bête gotûbêjkirin. Pêşniyaza damezrandina xelatekê bi navê nemir (Xelata Osman Sebrî) hat kirin. Ev pêşniyaz ji hemû beşdaran û rêvebirên şevînê hate pejirandin. Ev xelat dê her sê salan carekê ji bo kesekî ne Kurd were pêşkêşkirin, yê ko xizmet û xebatên hêja û giring ji bo gelê Kurd, di warê zimên, wêje, dîrok, huner, şaristanî, polîtîk yan mirovatiyê de kirine.

Xelata me perçeyek zêr e, wêneya nemir Osman Sebrî û sîmbolek (Xelata Osman Sebrî ji bo dostaniya gelan) li ser e.

-Di 21.07.2000-î de, xelata xwe ya pêşî li bajarê Enqera me pêşkêşî Civatnasê navdar Dr. Ismaîl Beşikçî kir.

-Di sala 2004-an de, xelata diwemîn me pêşkêşî dosta kurdan Danyal Mitran li Parîsê kir.

-Di sala2009-an de, xelata siyemîn me pêşkêşî dostê kurdan Dr.Munzir Elfedil li Siwêdê kir.

**Osman Sebrî wek nivîskar, helbestvan û wergêr:**

Bêgoman, rêjîmên şovenîst û dagîrkerên zordar digel talankirina dewlemendiya serxak û binxakiya welatê me, bi setemkariyeke mezin êrîşî ser ziman, tore, û folklora Kurdî dikin. Êrîşî ser dîroka şaristaniya hebûna wî dikin. Lê, herwekî xuya ye, ev armanc û mebesta wan heta niha neçûye serî û di dilê wan de bûye xem û kulek mezin. Ji bo em ji bin destên van rêjîmên şovenîst û setemkar derkevin, bi sedan serhildan, raperîn, şoreş û berxwedanên bi rûmet me dane; bê hejmar law û keçên xwe di vê riyê de gorî kirine. Ev şer, di warê parastina ziman, tore, û pêmayên Kurdî de jî, bi dijwarî dom dike, û roj bi roj, gûrtir û xurtir dibe. Ronakbîr, zimanzan, nivîskar, helbestvan û hozanên Kurd yên bi rûmet di nava vî şerê ha de, cihekî taybet digrin. Xebat û têkoşînek giranbiha didin. Pêwîst e, ku em vê xebat û tekoşîna hêja û giranbiha kêm nebînin, û di vî beşê şerê tevgêra rizgarîxwaziya gelê kurd de, wan tenê nehêlin û ne zindîkuj û mirîperest bin.

Di nav Kurdên kurdistana rojava de, û bi taybetî piştî qûnaxa xebata malbata Bedir-

Xaniyan, rûpeleke nuh di dîroka toreya Kurdî de dest pê bûye. Ew dîrok, bi çapkirin û weşana herdû kovaran; Hawar (1932-1943) û Ronahî (1942-1945)-an, dest pê bûye. Ev qûnax, qûnaxeke zêrîn û pir dewlemend e. li ser destê Celadet Bedirxan û Dr.Kamîran Bedirxan û bi saya serê wan, gelek rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên mîna Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, E.Namî, Hesen Hişyar û…h.w.d, di wêjeya kurdî  de hatin diyar kirin, û wêjeyeke nuhkirî, nuhbûyî û nûjen bi xwe re vejandin.

Wêje mîna hemû heyîn û hebûnên mirovatiyê ye. Teqez afrandina mirov e. Azîn û rêzaniya xwe ji kûrahiya jiyanê werdigre. Hunerên wêjeyê haydar in bi can û bi rewan in, bi tevna sawêr, hest, sewdan û ramanên mirov ve divarqilin û lê dihingivin. Çi karê wêjeyê bi nivîsîna gotinê dest pê dibe û xêzik û rêzikan jiber dike. Karê wêjeyê ev e hunermandan hînî afrandinê bike; bê çawa ji karê xwe hunereke bêhempa û ferzende bihûne… wêje razek ji razên qeşengî û sipehîbûna hunermendê xwedî berhem e.

Dîroka wêjeyê bi dîroka zanîn û têgihiştina mirov ve girêdayî ye. Pêşketina miletan bi pêşveçûna wêjeyê ve girêdayî ye. Bêdiro, wêje çekek ji bo guhertina civakan, çêkirina mirovan û rewşa civatê ye.

Bêguman, Osman Sebrî xwediyê van baweriyan e, ji dibistana wêjeya jîwerî ye. Hemû berhemên wî helbest, çîrok û gotar vê gotina me bi cih dikin, naveroka hemû nivîsandinên wî li ser tekoşîn û gelparêziya kurdî ye, û di cîhana wêjeya jîwerî de digerin.

Berî her tiştî, Apê Osman pir ji zimanê xwe- zimanê kurdî- hezdikir. Xwediyî şêweyekî serbixwe bû. Mamosteyekî rewanbêj û hoste bû. Bi wî zimanî derd û kulên xwe, hest û ahînên xwe diyar dikirin. Bi ziman û toreya kurdî serbilind bû. Ji qelsbûn û çilmisandina zimanê kurdî pir ditirsiya. Gelekî bala xwe dida rastnivîsandina zimanê kurdî, ew diparast û wek kelepora bav û kalan, di raman û kesîtî û derûna kurdî de pêşve dibir. Bi Celadet Bedir-Xan re di danîna Elfebeya kurdî -Latînî de beşdar bû, ya ko di hemû berhemên xwe de bikar anîbû. Lê di danîna elfabeya kurdî-Latînî de xwedî pêşinyar û

nerîn bû. Li gorî nerîna wî elfebeya Celadet pênc tîp jê kêm in. ango tîpa ('p,'ç,'t,'k,'r) dengvedanê de hene, lê çima di elfebeyê de nîn in!. Lewra ewî elfebeya Tekûz weşand. Lê tevaya berhemên xwe li ser rêzana elfebeya mîr Celadet weşandine.

Osman Sebrî xwe pasevanê zimanê kurdî dibîne, û tiliyên xwe li ser hin birîn û aloziyên nivîskaran datîne. Ji ber vê berpirsiyariya dîrokî dîtina xwe li ser wan kesên ko xwe di ser zimanê kurdî re dibînin û bi qurnazî zimanê biyanî diparêzin û bi zimanê kurdî naxwînin û naxwazin bixwînin. Di ser re jî, tew xwe wek xebatkar û zanayê doza kurdî dibînin. Lê, ew qet ji wan bawer nake. Gotiye:

(Ziman zimanê me gişika ne?! Ne yê yekî an yê didiwane, gava ku em ji bo zimanê xwe bi xebitin em qenciyê bi xwe dikin. Lê heyfa yê ku heya niha bi ziman mijûl dibin gelekî kêm in). (Em miletekî bê ziman in. Anha pir xortên me hene xwendane,bi erebî jî xweş dizanin, dibêjin: (Em dê ji miletê xwe re xizmetê bikin..). Lê mixabin hînî zimanê xwe nabin, û ezê dê çawa ji wan bawer bikim...?!!).

Li vir diyar dibe ko Osman Sebrî xwediyê wê nerîna ko dibêje: ziman ûştê nasnameya her wêjeyekê ye. Ango, ziman nasnameya miletan e. bingeha vê nerînê ev e: berî her tiştî kurd bin, bi kurdî bixwînin, bi kurdî biramin, bi kurdî binvisînin, bi kurdî bijîn û bi kurdî bimrin.

Osman Sebrî bi herdû awayên helbestê (serbest û kevneşop) nivîsandiye. Nivîsên wî yên helbestî, wek di (Bahoz) de, hezkirina welêt û rizgariya kurdistanê nîşan didin. Di derya helbesta nuhbûn û nûjeniyê de melevanî kirye. Mîna: Wefda kurdî, Bang, Ho xort, Jan û Bersiva Hoşeng…hwd. Ji hêleke din ve, pir dilê wî bi helbesta kevneşop ve girêdayî ye, helbestên xwe bi kêş û bare dihûne û bi kok û rehên wê yên resen ve girê dide û ji êmîş û kaniyên welatê xwe vedixwe. Bi taybetî ji derya melayê Cizîrî –mîrê helbesta kurdî- û Ehmedê Xanî- bavê ramana neteweya kurdî- vexwariye. Gelo, çewa û kengî Apo Osman dest bi helbestê kirye?. De em bi hev re guhdarî li gotina wî bikin: (Piştî hinekî mezin bûm mêldariya şîîrê li nik min çar bû, û min gelek şîîr jiber kirin. Lê mixabin ku ji dîwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî pêva şîîrên kurdî li nik me tunebûn, ji ber vê yekê min

şîîrên tirkî yên siyasî dixwendin. Bi şopa ku wan şîîr û çîrokan di canê min da hiştibûn bi hêsanî berê min ketibû rê ya têkoşîn û gelparêziyê. Bi vê baweriyê tevî ku ne şair bûm, min berî da nivîsandina şîîrê).

Osman Sebrî, li ser helbestvaniya xwe weha dibêje: "Qet tu caran nedifikirîm ku helbestên xwe berhev bikim û bikime dîwan. Ji ber ku berî her tiştî ez xwe helbestvan nabînim. Lê, tiştên ez dinivîsim dema ku ji aliyê mirovên welatparêz û şoreşger ve tên xwendin, kêfa min tê û ez dilxweş dibim. Ji bo vê sedemê jî dem û dem ez helbestan dinivîsînim. Heger helbest û çîrok ji bo hişyarbûna gel bên nivîsîn, dê ciyê xwe di tevgera rizgarîxwaz a demokratîk de bigirin, û dê rola xwe ya pêşketî bilîzin. Min jî hewl da ku ev rol bête lîstin hemî berhemên xwe nivîsîne."

Gelek helbestên Osman Sebrî, bi terzekî marş, xweşxan û bi awayê şoreşgerî hatine nivîsîn û ji alî gelek hunermendan ve jî hatine gotin. Mîna: Ala rengîn, Marşa felatê, Marşa xortan....hwd.

Ji hêleke din ve, ewî zarok û mendalên kurdan jibîr nekirine û ji bo wan çend helbestên bedew afirandine. Mîna: Siyamend, Lewend û Tavîn..

O.Sebrî rexnê li pirnivîsandina helbestan li nik nivîskarên zimanî kurdî digre; Bê çawa piraniya nivîskarên kurd dest bi nivîsandina helbestê kirine, û dûrî nivîsandina kurdî ya serbest mane. Digot: (Gelek ji xortên me çavê xwe berdane nivîsandina helbestan,ev ne tiştekî hêja ye, divê nivîsên rastesere –pexşan- bêne nivîsandin. Belê helbest tiştekî ji edebê ye, lê ne tevaya edebê ye. Di vê ku mirov bizanibe bi zimanê xwe binivîsîne, lê nizanim hemû ji min re helbestan çêdikin...).

Osman Sebrî, ji bilî helbest û çîrokan gotarên siyasî  jî nivîsandine. Gotarên wî di kovara 'Hawar'ê de rêzên (Derdê me) çareserkirina pirsgirêkên civaka kurdî diyar dikin. Lê, gotarên wî yê herî bilind wek gotarên li ser nêçîrê, çiyayên Sasûnê, Agirî, Mirdêsan, rola jinan û sincî, hwd... bi awayekî dewlemend û pir bi nirx hatine nivîsandin. Osman Sebrî di bin bandora wêjeya jîwerî de mane û li ser wê şopê berhemên xwe şopandine, ewî gotiye: (Şîîr û çîrok heke bi awayê rênasî bên nivîsîn dikarin rûmeta têkoşîn û gelparêziyê di peyayên xurt û hêja da vejînim).

(Tomas Biwa gotibû: ko Osman Sebrî bi ristik û çîrokên zaravayên kurmancî yek ji pêştirîn û zanatirîn nivîskaran e).

Çîrokên wî yên kurt wek di (Çar Leheng) de, qehremaniya kurdan û berxwedana wan li kurdistanê ji bo azadiyê didin xuyakirin. Helbest û çîrokên wî li ser dehbeyan hemû serpêhatî û huner in, yên ku di nav cemawerê kurd de ji nifşekî derbasî nifşekî din bûn. Mîna: Dîk û rovî, Gurê pîr, Roviyê jîr, Tevdîra mişkan, Roviyê ker,Quling û Serê şêr...

Osman Sebrî xwe nivîskarê çîroka kurt, ne ya dirêj dibîne, û bandûra nivîsandina çîrokê kengî û çewa lê diyar kirye, ewî bixwe gotiye:

(Di biçûkaniya xwe de min ji çîrokan hez dikir. Çîrokbêjek li kû bûya min dişande pê tanî, an diçûm nik wî ji bo guhdariya çîrokên wî bikim, nemaze çîrokên lehengan ên efsaneyî. Herçî çîroka kurt hinekî bi min re derdikeve, lê a dirêj ez ne peyayê wê me. Rojekê ji rojan nehatiye bîra min ku bikaribim bi karek holê hêja rabim.).

Wêjenasê Kurd Prof. Qenatê Kurdo, di kitêba xwe ya Tarîxa Edebiyata Kurdî de Osman Sebrî, weha dide naskirin: "Li paş Cegerxwîn şêrê serê çiyayê Kurda yê duwemîn Osman Sebrî ye. Di rewşenbîrkirin û şerê xwenaskirina Kurdan de gelek roj û salên giran li pêşiya wî mêrî bûne. Lê ew îş û karê xwe de ji riya xwe venegeriyaye, xebitiye, şer kiriye, bo xatirê serxwebûn û azadiya neteweyê Kurd."

Osman Sebrî giringî û pêwîstiya karê wergerandinê mîna Celadet Bedir-Xan, Qedrî Can, Kamîran Bedir-Xan û Nûredîn Zaza haydar dibe û bi wergerandina her karekî re armancek temîz û bilind dibîne. Armanca wî ya sereke; sûde ji çanda miletên dî bê dîtin, zimanê miletê Kurd pê zengîn û dewlemend bibe. Ez bawer im bê çiqas ew bi zimanê kurdî zîrek û têgihiştî bû, wehareng e di zimanê erebî de jî xurt bû. Lê qet carekê jî bi zimanê erebî nenivîsî ye.

Ewî çend berhemên hêja ji zimanê erebî wergerandine zimanê kurdî û di kovarên (Hawar û Ronahî)yê de belav kirne, mîna:- Tarîxa Kurd û Kurdistan, -Dîroka jîna Napilyon,-Ezdî û Ola û Dîroka Jîna Selah Eldîn...

**Berhemên Apo Osman Sebrî yên çapbûyî ev in:**

-Elfebeya Kurdî: Di sala 1954an de.

-Bahoz: Di sala 1956 an de.

-Derdên Me: Di sala 1956 an de.

-Elfebeya Tekûz: Di sala 1982an de.

-Çar Leheng: Di sala 1984 an de.

-Di sala 1981-ê de, li almaniya komek helbestên wî ji rex buhiştî Hemereş Reşo ve hatine çapkirin û belavkirin.

-Di sala 1998-an de, li Istenbolê komek ji helbestên wî ji alî A.Balî ve hatine çapkirin û belavkirin.

-Şerê Sasonê di sala 2005-an de, ji alî min ve hatiye komkirin, çapkirin û belavkirin.

-Bîranînên Osman Sebrî ji alî min ve bi herdû zimanan –kurdî /2005 û erebî /2001- hatiye komkirin, çapkirin û belavkirin.

-Romana Dê, ya M.Xorkî ji zimanê erebî wergerandiye zimanê kurdî. Lê mexabin, bi dawî naniye. Destnivîsa wê li nik min heye.

**Serencam:**

Bêgûman, heyvanê mêranî û zanebûnê bi hev re di mirovekî de li hev nagerin û ne tên meyandin. Rêzgirtin û mezinahiya nemir Osman Sebrî ji ber van herdû xalan tê; ne tenê navekî di meydana têkoşîn, xebat û şer û cengan de geş û navdar e. Belê, mirovekî zana, rewşenbîr û nivîskarekî gewre ye. Ango, ne mirovekî normal e.

Navê wî bi qûnaxeke pir giring ji dîroka gelê me ve hatiye girêdan.

Ji dema raperîn û serhildanan ta bi dema rûxandin û şikestinan dirêj dike. Di dema ko li seranserî Kurdistanê ‘ewrên reş û tarî, kuştin, talankirin û herifandina hêviyên Kurdan bû. Ew qet cangiran û bêhêvî nebû, di hilgirtina ramana şoreşgerî û baweriya bi çek û bi tekoşînê bawer bû. Çewa xebatkarekî bi çelengî, mêranî, lehengî û serbilindiyê ve hatiye nasîn. Wehareng e di meydana rewşenbîrî, ziman û dîrokê de jî bejin bilind bû. Dema hilgirtina çek pê re nebû heval, û

gelek hevalên wî xinizî û radestî kirin û pişta xwe dane xebatê, ewî dest avête pênûsê û mîna çekekî li hemberî dijminê gelê xwe bikar anî. Bi çekê zanînê bandûreke mezin li civaka gelê xwe kir û bi roleke sereke di hişyariya hestê neteweyî li nik Kurdan rabû. Bi Ramaneke azad û baweriyeke xurt tirseke mezin di dilê dijminê gelê xwe de çand. Ji ber vê rastiya xwe li nik mirovên pergîr û kêsbaz bi mirovekî tundar dihat naskirin.

Di her qûnaxekê de lehengek, an zanayekî gewre ji nava miletekî der tê. Apê Osmên leheng û zanayê dema xwe bû. Di meydana rewşenbîriyê de ronakbîr û torevanê gelê xwe bû. Di xebatê de mirovekî rastgo û xwediyê peyva xwe bû. Tekoşerekî sondxwarî bû. Qet radestî û serşûrî di ferhenga jiyana wî de nebû. Di jiyana xwe de, hertişt gorî û qurbanî kurdayetiyê dikir. Zanyariya xebata wî di van çend gotinan de tê ravekirin; (Herçî bi zorê hat standin, bi zorê tê vegerandin). Jiyaneke serbilind, û mirineke bi rûmet dixwest. Wî digot: (Serê ko bête danîn, tucar nayê hildan), (Bi qelsî kes nebûye xwedî rûmet û şan). Di vê meydanê de, ew xebatkarê yekaneyê bê hempa bû. Wî digot: (Xebatkarê rast, divê ji sê tiştan ne tirse: ji birçîbûnê, ji zindanê, û ji mirinê).

## Çavkanî û jêder:


-**Bîranînên Osman Sebrî**- bi zimanê Erebî-komkirin û wergerandina: Dilawerê Zengî û Horamê Yezdî, pêşgotina: M.Dawidê Zeynê-2001.Libnan. çapxana Emîral.

-**Bîranînên Osman Sebrî**. Komkirin û amadekirina Dilawerê Zengî, Beyrût-2005. Bi zimanê Kurdî, çapxaneya Emîral.

-**Ji Toreya Dozê**, danhev û amadekirina Dilawerê Zengî û Ehmed Şehab. Elmanya-2011. Bi zimanê Erebî ye. Çapek taybet.

-**Bînahî**, Dilawerê Zengî. Beyrût-2011. Bi zimanê kurdî ye. Çapxaneya Emîral.

-Dîtin û hevrû yên min ên taybet bi nemir Osman Sebrî re. Naskirina min pê re ji (1983-1993) dirêj kirye.

-**Dîwana Osman Sebrî**. Berhevkar: A.Balî. Stenbol-2004.Weşanxana: Pêrî.

-**Kovara Hêvî**, hejmara 7-an, sala-1990 / Parîs.

# Rewşen Bedir-Xan
## (1909-1992)

Piştî têkçûna Sultan Ebdulhemîd û di sala 1908-an de, hatina Sultan Reşad, rewşa azadiyê pêşve çû û azadî ji girtiyan re derket. Di wê demê de Salih Bedir-Xan deh salên xwe di girtîgehê de buhurandibûn. Bi wê azadiyê re ew ji zindan û girtina timî (muebed) reha bû û ew şandin bajarê Qeyseriyê.

Di roja 11-ê Tîrmeha sala 1909-an de, Sultan Reşad hat ser hukum. Di wê rojê de Xwedê keçek da Salih Bedir-Xan. Ew keç bi xwe Rewşen Bedirxan bû. Piştî ko du salên Rewşenê li Qeyseriyê qediyan, malbata wan hatin Stenbolê; li wir gelek ji malbata Bedirxaniyan hebûn.

Salih Bedir-Xan ji Stenbolê jî berê xwe da riya Şamê. Bavê Rewşenê tucar nedisekinî û bi hêz û bi hunera xwe ji bo miletê Kurd dixebitî, li xweşî û kêfa jiyanê nedipirsî. Ew li mal û li nav û deng jî nedigeriya.

Salih Bedir-Xan gelek nivîs di kovar û rojnameyan de belav dikirin. Daxwaza wî ya

yekemîn di jiyanê de, hişyarkirin û pêşxistina miletê wî bû. Ew bê westan, şev û roj li kar bû.

Salih Bedir-Xan piştî hatina xwe ya Şamê çendekî bê kar ma. Di vê navê de şerê Cîhanê yê Yekemîn destpê kir; mercên jiyanê pir dijwar bûn. Ji bêçarî, berê xwe da kar û li zindana Keleha Şamê kar kir. Lê mexabin bi êşa tîfoyê ket; pir dirêj najot, di 30yê Adara 1915-an de, mir. Di wê demê de temenê Rewşenê negihiştibû şeş salan.

Piştî mirina Salih Bedir-Xan, diya Rewşenê ew şand dibistanê. Rewşenê piştî ko dibistana seretayî xelas kir çû dibistana mamostetiyê (Dar el-Muelîmat) û ew jî bidawî anî. Rewşen bû mamoste û ji nifşên sêyemîn ko li Sûriyê dibistana mamostetî qedandibû tê hejmartin.

Rewşen Bedir-Xan di sala 1925-an de, diçe bajarê Kerkê (li Urdun) û li wir dibe berpirsiyara dibistanê.

Li Urdunê bêdeng namîne, bi pênûseke bilind li ser doza erebî û rewşa Sûriyê û bûyerên wê demê gotarên xwe di çend rojnamên felestînî, Urdunî, libnanî û Sûrî de belav dike. Mîna rojnama "Minîrva, Mirat el-Şerq, Nîdal, el-Şe"b,

Huriye û Wijdan. Hêjayî gotinê ye ko xwediyê herdû rojnaman: Wijdan û Huriye rojnamevanê gewre Yûsif Melek bû. Ev rojnamevan dostekî dilsoz û piştgirê doza kurdan bû. Gelek belge û nivîsên hêja li ser kurd û Kurdistanê belav kirne.

Di sala 1928-an de, vedigere Şamê, dibe mamoste û berpirsiyariya (kargîra) gelek dibistanan dike.

Di sala 1934-an de, dibe endama komela Yekîtiya Jinan li Sûriyê.

Di roja 22.2.1935-an de, bi Mîr Celadet Bedir-Xan re hevjîn dike. Bi navên Sînem 21-3-1938-an û Cemşîd 9-11-1939-an keç û lawek ji wan re çêdibin. Berî ko Rewşenê lawê apê xwe Celadet bike, mêrekî din "Omer Malik Hemdî" kirbû û keçek bi navê "Useyme" jê anîbû. Rewşen Xanim bi qasî ko li dibistanê mamoste bû, ewqas jî di xwedîkirina zarokan de mamoste bû. Diyeke dilsoz û dilovan bû.

Di sala 1944-an de, li ser navê jinên Sûriyê, li Misrê beşdarî Kongra Jinên Cîhanê bû. Jiyana Rewşen Xanimê a niştimanî pir berfireh û kûr e; ew bi hemû hêz û ramana xwe li dijî Qolonyalîzma Fransa sekinî û piştgiriya doza

Erebî kir. Bi taybetî jî wê doza gelê Filîstîn parast û wê di dibistanên Ereban de mamostetî kir û gelek nivîs û gotar di kovarên Erebî de weşandin.

Di rojnama "Wijdan" hejmar -331-ê, di gotarek xwe de bersiva nivîskarê mezin "Circî Niqola baz" dide. Ewê ko ji piştgiriya Rewşenê bi doza Felestîn û Sûriyê re matmayî maye û dipirse gelo Rewşenê Çerkes an Ereb e?. Rewşen Xanim bersiva wî weha dide: "Ez bixwe, bi xwîn û canê xwe kurd im. Lê berî her tiştî ez mirov im. Dema ez li ser mafê miletan dinivisînim mirovatiya xwe di bîra xwe de tînim û wê jibîr nakim. Çawa azadiyê ji miletê xwe re dixwazim wehareng e ji hemû miletên bindest re dixwazim. Ew kesê êş û derdê bindestiyê dîtibe, nikare setemkariyê ji miletên dî re bipejirîne. Ez bawer im mirovê birçî be bi hevalê mîna xwe haydar e. Eger azadîxwaza gelê xwe me, bawer bin ne mafxura mafê tu kesî me. Azadî û serbestiya gelê min ne li ser rûxandina berjewendiya tu gelan e. Armanca min ev e ko miletê min jî mîna hemû miletên serdest bi serbestî û azadî bijî".

Di pirtûka herdû nivîskaran "Merwan el-Mesrî û M.Elî Elanî de, ya li ser jinên nivîskar ên Sûrî

(1892-1987)-an de, pir bi dewlemendî û şanazî li ser Rewşen Bedirxan nivîsandine û pesin dane.

Jiyana wê ya niştimanî gelek giranbuha ye; cihê serbilindî û mezinahiyê ye. Di gel ko Rewşen Xanim mamoste bû, xebata wê di behsa zindanan de, ji bo rastkirina tenduristiya keç, jin û pîrekên bê sincî yên di zindanan de jî hebû. Bi aramî û bêhinfirehiya xwe dest davête hemû aloziyên jiyanê. Lewra, quretî û serşorî di ferhenga jiyana wê de nebû. Jiyana Rewşen Bedir-Xan neynika jîn û danûstandina Mîrê gewre (Mezin) Celadet Bedir-Xan û malbata Bedirxaniyan bû. Ew xeleka gihandina dîroka miletê xwe ya kevin û nû ye. Ew dîroka lehengiyê ya dûr û dirêj a ko bav û bapîrên wê bi sedên salan ji bo Kurdistanê kirine. Jiyana wê ne kêmî jiyana bav û kalên wê bû, nemaze di warê dijwarî û zehmetiyan piştî mirina mêrê wê Celadet Bedirxan di 15-7-1951-an de.

Dibêjin li pişt her mêrê gewre(mezin) jinek gewre heye. Belê, Rewşen piştevana mezinahiya mîrê ronakbîrên Kurd Celadet bû. Piştevana amadekirina kovar, pirtûk û hemû afirandinên mîr bû. Digel xebatên hêja, ewê bi xwe jî di kovara Hawarê de dinivîsand. Bêdiro, em dikarin

bibêjin Rewşen Bedirxan jina kurd a pêşî ye ko bi zimanê kurdî-Latînî di kovara Hawarê de nivîsiye, û çend gotarên taybet li ser rewşa jina kurd afrandine. Rewşen Xanim di kovara Hawarê, hejmar 27-an de, di nivîsek xwe ya bi navê Kebanî û Mamoste weha dinivîse: (Mêrên ko qedera miletan di destên xwe de dibin, li ber destên jinan xwedî dibin. Terbiya xwe dielimin, heta axa gorinan ji bîr nakin, û ew tim û tim li wan hukum dikin. Ji lewre methelokê gotiye: 'Kurmê şîrî heta pîrî'). Rewşen Bedir-Xan karê jina Kurd netenê kebanî û xwedîkirina zarûkan dibîne, lê, li ba wê karê jinan ê giring li dijî nezaniyê şerkirin û perwerdekirina zarokan e.

Bêguman, di vê xebata perwerdeyî de, rola welatperweriyê jî ji bîr nake. Rewşen Bedirxan bi dengekî bilind û zelal weha bang dike: (Xwehên min ên delal, herwekî hûn jî dizanin derdê miletê me yê mezin û xedar nezanî ye. Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e. Nik miletên xwedan hukumat û teşkîlat vê nexweşiyê di xestaxaneyên xusûsî de derman dikin û ji wan xestaxanan re dibêjin dibistan. Mamoste bijîşkên wan xestaxanan e).

Em dikarin bibêjin ko Rewşen Bedir-Xan, bi xebat û nivîsên xwe di pirsa jinan de çalakiyên hêja dane. Rewşen Bedir-Xan di gotarek xwe de di hejmara 28-an a Kovara Hawarê ya bi navê (Jin û Bextiyariya Malê) de weha dinivîse; (Gelek jin hene bawer dikin ko rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne wa ye. Sea'det û bextiyarî ne ji dewlemandan bi tenê re ye. Xincîkên belengazan hene ku sea'det û bextiyarî, ji qesra dewlemendan bêtir û çêtir tê de qerar digirin û bi rihatî cih dibînin).

Rewşen Bedir-Xan dixwaze vê yekê bi jina Kurd bide zanîn: xweşî û bextiyarî ne pere û qesr û qonax in; belê, xweşî ew e gotina xweş, danûstandin, kar û xebata ku mirov ji milet û welatê xwe re bike. Xweşiya jiyanê ya bi peran diqede, lê xweşiya jiyanê a welatperwerî û zanînê naqede.

Her giringiya rola jinê, û rizgarbûn û pêşveçûna wê di civakê de, pêwîst didît. Di jiyanê de, jin kok û bingeha dibistana pêşî ye, li ser wê bingehê civak tên avakirin. Kurdan berê gotiye: 'Kurmê şîrî heta pîrî'. Gelo ew çi nifşên xwendevan û şagirtanin ko ji dibistaneke bê

bingeh û herifandî bêne der!!. Rizgarkirina jinê, rizgarkirina civakê ye.

Pêşiyan berê gotiye: Jin keleha mêran e. li pişt her mêrê gewre jinek gewre heye. Jin jiyan e, Ji dibistana jinê hemû mirovên zanyar, ronakbîr, bijîşk, parêzer, padîşah û fermandar perwerde bûne.

Ji bilî nivîsîna bi zimanê Kurdî, Rewşen Xanimê bi zimanê Erebî jî gelek nivîsar li ser Kurdan belav kirine. Rewşen Bedirxan di sala 1971-an de beşdarî Kongira Sêyemîn ya Yekîtiya Jinên Kurdistanê (li başûrê Kurdistanê) bû û bi piştgiriya xwe serketina wan parast. Di eynî salê de rûmeta endamtiya Korî Zanyarî Kurd girt, û di wê demê de li ser daxwaza Korî Zanyarî Kurd çû Stenbolê. Ev çûna wê ji bo komkirin û civandina destnivîs û pirtûkên ko di arşîv û pirtûkxaneyên Tirkan de, yên ko li ser Kurdan e bêne civandin û ji Korî Zanyarî Kurd re bêne rêkirin bû. Bi rastî jî, ev layiqî pesindanê ye ko, ew di vî karê xwe de bi zanebûn û bi bêdengî biser ket.

Rewşen Xanimê di sala 1956-an de, digel Dr. Nûrî Dersimî, Hesen Hişyar, Heyder Heyder û

Osman Efendî li bajarê Helebê Komela Zanistî û Alîkariya Kurd damezrandin.

Rewşen Xanimê di sala 1957-an de, li kongirê Esîna (Dij dagîrkeran) yê ko li Yewnanê hatibû lidarxistin, bi navê nûnera gelê kurd beşdar bû.

Di sala 1973an de, ji neçarî berê xwe dide bajarê Banyasê û li wir bi cihûwar dibe.

Rewşen Xanim bi bîhinfirehî û aramiya xwe li dijî hemû alozî û dijwariyên jiyanê bi ser diket.

Jiyana mirovan ne bi salan tê jimartin; ne jî bi mal û milkên ko mirov li dû xwe dihêle. Jiyan bîranîna şopeke kamûranî, qencî, comerdî û mirovatiyê ye, nemaze ji bo mirovên xwedî berhem, şop, têkoşîn, xebat û kar in.

Ji ber vê yekê, ez dikarim bibêjim ko Rewşen Xanim nemiriye; ew ji me haydar e, û em jî pê haydar in.

Herçiqas wê di roja 01.06.1992-an de, ji nav me koç kir, lê ew di dilê me de dijî. Heta roja mirinê jî ew ji bo gel û welatê xwe dixebitî.

Rewşen Xanim di doşeka mirinê de weha ji min re digot:

*(Kurê min dema em hebûn, hûn negiha bûn; îro hûn giha ne; lê mixabin em nema ne. Kurê min, ji hev hezbikin û piştgiriya hev bikin. Yek bin, kurê min, belawela nebin).*

Piştî ko ez hinekî li ser rewşa Kurdistana Başûr û li ser hilbijartinan sekinîm, Rewşen Xanimê gotina min birî û weha got:

*(Kurê min, yekîtiya Kurdan bide min, ezê Kurdistanek azad bidim te).*

Piştî ko Rewşen Xanimê canê xwe spart Xwedê, li ser daxwaza wê û li gor soza ko min pê re dabû- min karûbarê veşartina wê kir, û min cendekê wê ji bajarê Banyasê anî bajarê Şamê, li tenişta hevjînê wê Celadet û bapîrê wê Bedir-Xan Beg li goristana Şêx Xalidê Neqşibendî veşart. Piştî ko li mizgefta Hemo Leyla li Taxa Kurdan li ser cendekê wê limêj kirin, rê-û-resmên veşartinê bi beşdariya gelek ji dost û nasên malbata Bedirxaniyan, û nivîskar û rewşenbîran destpê kir. Ji ber rewşa Kurdan ya dijwar û awarte û li ser daxwaza keça wê Ûseyme Xanimê kesekî tu gotin û tu helbest li ser gora wê nexwendin.

Ev e Rewşen Bedir-Xan, ya herdem wekî bav û kalên xwe êşa miletê xwe dikişand û qet ji bîr nedikir. Wê mezinahiya xwe ji stûnên Birca Belek girtibû. Rewşenbîriya xwe ji dibistana Sor, ji kaniya Cizîrî û Xanî wergirtibû.

**Berhemên wê yên çapkirî ev in:**

1-Bîranînên Jinekê, Daner: Gozîda Sebrî, werger ji zimanê Tirkî bo Erebû, 1951.

2-Xeramî We Alamî, Daner: Mukerem Kamil, werger, (çîrok) ji Tirkî bo Erebî 1953.

3-Bîranînên Mamosteyekî(sê pirtûk), Daner: Reşad beg Nûrî, werger, ji Tirkî bo Erebî 1954.

4-Rûpelên ji Toreya Kurdî -1954.

5-Nama Gelê Kurd (helbest-Goran) ji Kurdî bo Erebî 1954- ji ber rewşa siyasî navê xwe li ser vê pirtûkê nenivîsiye.

6-Name ji Mustefa Kemal Paşa re, werger ji Tirkî bo Erebî (Ev pirtûk bi alîkariya min hat nivîsîn, çapkirin û belavkirin).

7-Bîranênên Min-Salih Bedirxan-,werger ji Turkî bo Erebî. (Ev pirtûk jî bi alîkariya min hat nivîsîn, çapkirin û belavkirin).

8-El-red ‘ele El-kosmopolîtiye, Mehmûd Şîniwî, werger, (ji ber hin sedemên siyasî navê xwe li ser vê pertûkê nenivîsiye).

9-Mîr Bedirxan, perçak ji pirtûka Lutfî ye. lêveger, sala:1992-an. Libnan. Wergerandina: Elî Seydo Goranî, Lêvegera Rewşen Bedirxan.

10-Bîranînên jinekê (perçê duwemîn). Ev pirtûk li Şamê-sala: 1996-an li çapxana Dar Alai hate çapkirin.

11-Rapora Mufetişê Turk ê el'am -Abdîn Osman- konevaniya Turkirina Kurdan. (23) rûpel e, di rojnama (Wijdan) de hatiye belav kirin. Werger ji zimanê Turkî bo zimanê Erebî. Sala:1956-an. Hejmarên taybet: (303-306-314-bê hejmar).

12- Nerînek li dîroka Osmaniyan, ya nivîskar Dr.Nûrî Dersimî, werger, ji Turkî bo Erebî. Min jî di rojnama El-Hîwar de belav kir.

13-Celadet Bedirxan wek min naskir. Mexabin berî ko bidawî bike mir. Min jî di rojnama El-Hîwar de belav kir.

**Pirtûkên wê yên ne çapkirî ev in:**

2-Bavê min Abdulhemîd-nivîsa Ayşe keça Sultan Ebdulhemîd e, wergerandina Rewşen Bedirxan e.

3-Bîranînên min. Destnivîs e.

# Seydayê Tîrêj (1923-2002)
# (Jiyan û Berhem)

Mamoste û helbestvanê helbesta resen nemir Tîrêj di sala 1923an de, li parêzgeha Hisiçagundê (Nicim) hatiye dinê. Navê wî yê rast Nayif e. Ew kurê Heso ye. Gava ew dibe şeş salî, bavê wî mala xwe koç dike û li gundê Sêmitik bi cîwar dibin. Tîrêj li wê derê û li cem mele Ibirahîmê Golî, Qur'anê û çend pirtûkên olî dixwîne. Wek gelek helbestvanên Kurd, ew jî di dibistana olî de dest bi xwendin û nivîsandinê dike.

Di sala 1937an de, hatiye bajarê Amûdê û li wê derê dest bi dibistanê kiriye. Pênc salan li wê dibistanê xwendiye. Lê, ji ber mercên aborî, xwendina xwe ne domandiye. Li wê derê, têkiliyên wî bi helbestvanên mezin Cegerxwîn, Qedrî can, Hesen Hişyar û Nûredîn Zaza re xurt bûne. Bi akam û bandûra wan jî, evîna helbestnivîsandinê di dilê wî de şax daye. Bi wan re xebata niştimanperwerî kiriye, û wek gelek welatperwer û ronakbîrên Kurda, seydayê Tîrêj jî, di nava civata Xoybûnê de cihê xwe girtiye. Ligel nivîsandina helbest û çîrokan, tekoşînek

ramyarî jî meşandiye. Dîsa S.Tîrêj di bin bandora Cegerxwîn de dimîne û ji sala 1948-1952an di nav refên aştîxwazan de kar dike.

Di sala 1952an de, bi destê hêzên ewlekariyê tê girtin û dîwanek ji helbestên wî yên ne belavbûyî tê talankirin.

Piştî ku Seyda ji zindanê reha dibe, berî dide nav Erebên Cibûran, û ji neçarî demek pir dirêj xwe li nav wan diparêze.

Di sala 1973an de, berî dide bajarê Hisiça û li wir bi cîwar dibe, ta ko ji nav me koç dike.

Seyda, di bîr û baweriyên xwe de Barzanî bû. Lê, hevaltî bi tu rêxistin û partiyan re nekir. Kurdekî serbixwe bû.

Di roja şemiyê 23.3.2002an de, demjimêr heştê hêvarî li nexweşxana Dr.'Îsam Bexdê li bajarê Hisiça li Cizîrê, helbestvanê helbesta resen seydayê Tîrêj çû ber dilovaniya xwedê.

Di roja 25.3.2002an de, piştî limêjê, laşê wî ji mizgefta Hac Qasim li taxa 'Ezîziyê demjimêr 11ê nîvro bi coşeke mezin derxistin, û li gundê Girkeftar veşartin.

**Seydayê Tîrêj û Helbest:**

Rêjîmên şovenîst digel talankirina dewlemendiya serxak û binxakiya welatê me, bi dijwariyek mezin êrîşî ser ziman, tore, û folklora Kurdî dikin. Lê, herwekî xuya ye, ev armanc û daxwaza wan heta niha neçûye serî û di dilê wan de bûye kuleke mezin. Ji bo em ji bin destê van rêjîmên şovenîst derkevin, bi sedan serhildan û berxwedanên bi rûmet me dane; bê hejmar law û keçên xwe di vê riyê de me gorî kirine. Ev şer, di warê parastina ziman, tore, û zargotina Kurdî de jî, bi dijwarî dom dike, û roj bi roj gûrtir dibe. Ronakbîr, nivîskar, helbestvan û hozanên Kurd yên bi rûmet di nava vî şerê ha de, cihekî taybet digirin. Xebat û têkoşînek giranbiha didin. Pêwîst e, ku em vê xebat û têkoşîna hêja û giranbiha kêm nebînin, û di vî beşê şerê tevgêra rizgarîxwaz ya gelê kurd de, wan tenê nehêlin û ne zindîkuj û mirîperest bin, di saxiyê de xwedî li wan derkevin.

Yek ji wan helbestvanên bi nav û deng jî, seydayê Tîrêj e.

Seydayê Tîrêj li ser şop û riya helbestvanên helbesta Kilasîk ya resen helbesta xwe ristiye. Bi

van çend gotinan nerîna xwe di helbestê de diyar kiriye:

> “*Ez li helbestê bi nezim, awaz, qafiye(serwe), û naveroka wê dinêrim. Ev her çar şert wê dikin helbest*”. Seyda, rûmet, ronahî û cewherê helbestê jî weha dibîne:

**“..Ma rûmeta şi’rê çiye, ned’ xizmeta milet debî**

**Ronahiya şi’rê çiye, pesnê welat ku têd’ nebî**

**Çibkim ji wê şi’ra rijî, danegire sewda û mejî**

**Derdê dil û can nakujî, çaxê ku cewher têd’ nebî..”**

Ew, li gorî dîtina xwe van mercan ji bona helbestê dibîne, û ji xwe re dike mîna per û baskên balayekî baz ko, bi yek firê baskê xwe li ezmanê helbesta resen dide, û xwe di kûrahiya dilê xwendevanê helbesta Kurdî de bicîwar dike. Germahiya tîrêja helbestê, pencên xwe di dil û hestê xwendevan de rewa dike, û xwendevanê xwe di nav tevna pursir û pursiriyê de dîl dike. Bi vê raza ne penî, tezînokên xweşiyê û akama xwe li dil, hest û derûnan dihingêvin.

Li pişt evî bazê serbilind, bazekî şêt û bêhempa di gasîna helbesta Kurdî de heye. Ew baz jî seydayê nemir Cegerxwîn e.

Mamostayê mezin û bi navûdeng Cegerxwîn di dîwana xwe ya (Kîme Ez) de, li ser seydayê Tîrêj, bi navê wî yê rastî (Nayifê Heso) helbestek nivîsandiye û hêviyên hêja ji wî kirine. Seydayê Cegerxwîn di wê helbesta xwe de weha dibêje:

**“... Ev xwendin û zanebûn**

**Nêzîk dikin serxwebûn**

**Xortên wek te pir zana**

**Gerek bêjin; Nezana**

**Bira destên hev bigrin**

**Di vê rê de em bimrin...”**

Tîrêj, di bin baskê Cegerxwîn de berz û mezin dibe. Hînî perwaze û firê dibe. Di derya Cezîrî û Xanî de hevotî melevaniyê dibe.

Linik wî, bejna helbestê pir bilind e, bi xeml û xêz e, bi kêş û serwe ye, bi zimanekî rewan e, pesin û halan e, haldan û salixdanên rojeve û gazin û hêviyên rewşa gel di jîna jîweriyê de dihûne, ko di yek hest û hizrî de, li ber tîrêja ronîkirina riya hişyariyê têne meyandin.

Wek me gotî, bi awayekî kilasîk helbetên xwe dihûne: (pesin, şînî, evînî, xweşxwan, perwerî û li ser zimanê bale û teban), kêşa helbestan li ser movik û bi bare ne. Çewa seyda di bin baskê helbestvanên me yên kilasîk de mezin bû, weharenge gelek helbetvanên me yên kilasîk-nivîs di bin bandora seydayê Tîrêj de mane, û akameke xurt li nifşê pey xwe re kiriye.

Ew ji dibistana helbesta jîwerî bû, bi rewş û bûyerên gelê xwe ve pir girêdayî bû. Heger merov li rêzkirina naveroka helbestan hûr-hûr meyzeke, merov xelekên dîroka gelê xwe, û bûyer û serpêhatiyên wan gav bi gav, roj bi roj û dem bi dem lêdivarqile. Ji wan bûyerên herî balkêş ya ko bû sedemê xweştir, ciwantir û şêrîntirîn helbest bi seydayê Tîrêj re bête der. Ew kuştiyarî, talankirin û malwêrankirina ku bi serê gelê Kurd de hatibû. Têkçûna peymana yazdehê Adarê bû. Seyda, volqana derûna wî, kelandin û lihevketina hundirê wî, sergêjî û pizotên hest û hinav û cergê wî bi hev re, ew dane ber pêlan û peqiyan, li ezmanê toreya Kurdî helbesta (Ey bilbilê dilşadî) hate vejandin. Ev helbest nûzayeke nû bû di dîroka helbesta Kurdî ya resen de. Em dikarin bibêjin seyda bi vê helbesta

xwe derbasî gerdûna xweştirîn helbestên Kurdî dibe.

Di helbestên xwe de, zor û sitemkariya li ser neteweyê Kurd, hoy û sedemên bindestiya gel, û ji bo rizgariya Kurdistanê pêwîstiya têkoşînek bi yekdest û canbêzariyek bê sînor didît, bi hunermendiyeke mezin û bi zimanekî şêrîn û zelal ev rewş aniye ziman.

Bêdiro, bi derd û kovan, xweşî û nexweşî, paşketin û pêşveçûna gelê xwe ve dijiya. Radestî li ber narvînê nedikir, û xwe dîlê hêvî û lavlavan nedidît. Lewra digot:“ *jîn divê kotek û zor e”*. Ango ûştê azadî û xoybûnê zor e. Zor nebe setem netê hilavêtin. Bi lavlavan merov nagihê armanca xwe. Têkoşîn şana hebûnê ye. Bi baweriyeke bêbend û bê sînor rizgariya Kurdistanê bi şerê çekdariyê dibîne, û dibêje:

Ez narevim narevim

Pêşmerg im  ez narevim

Wek hîm û tehtê çiyê

Tucar ji cih nalivim

Bi zarotî diya min

Şîr daye min bi xwînê

Dunya li min bi yek bî

Ji ya xwe danakevim.

Bi rastî Seyda, heta bi roja dawîn ji ya xwe nehat xwarê, û digel ku ew bixwe ji malbateke xizan û perîşan bû jî, lê ewê yekê tucarî nikarîbû çavkaniyên helbestên wî ziwa û bimiçiqîne, yan berê pênûsa wî ji bîr û baweriyên wî biguhêrîne. Bi pênûseke bejinbilind û zimanekî rewan û zelal, her çavkaniyên wî diherikîn û dizan.

Dara evîna wî tim şîn e. Bi hezar berê rengereng xemilandî ye. Lê, heger berê darê tehl nebî şêrînî û sipehîbûnê jî nadin. Tenê şêrîniya gulê bi dîtin û şîravê xweş e. Lê ya xweştir ew e, ko bilbilekî şeyda bi deh hawan bixwîne û pesnê xeml û xêza gulê bide . Wê gavê nuh gulê li naz û kubariya xwe hay dibe, li ber sura bayê sibê diserçime û bi qurnazî serî dihejîne. Durv digirnije, rûgeş û dilşa dibe. Gul! dezgîr e, bilbilê şêt dilketî ye. Heger tu axaftineke bê sûde, lavijeke bê awaz, sazeke bê dûzan be, tucarî tuwê nikaribî dilê gulê bidest xwe bikî; ji ber ko gulê dilkoçer e.

“..Wan nêrgizan girtî xunav

Bişkeftî xunca sorgul e

Nêrgiz û sorgul bişkivîn

Çiçek û lal û yasemîn

Xweş tên ji wan bex û bîn
Axifte canê bilbil e
Axifte wî can û ceger

Sermaye axîn û keser

Hêstran dibarê cot û fer

Lewra ku çav herdem şil e..”

Seyda, li ser êmîşê welatê xwe mezin dibû, û pir ji xweristiya welatê xwe hezdikir. Girêdaneke xurt di navbera seyda û xweristiya welatê wî de hebû. Di helbestên xwe de pir li ser av û dar, gul û giya, deşt û çiya, mêrg û kanî, buhar û zivistan, dehl û zevî û bale û tebayên welatê xwe digot. Navên hersê dîwanên wî navên çiyayên Kurdistanê ne: **(Xelat, Zozan,Cûdî).** Binavkirina dîwanên wî pirtir ji me re diyar dike bê seydayê Tîrêj çiqasî bi xweristiya welatê xwe ve girêdayî bû.

**“..Rojek ji rojên buhara rengîn**

**Ez diçûme ser çiyayê Metîn**

**Çiyakî bilind hemî ber û dar**

**Li jêrê çiyê gelî û zinar**

**Li dev newalan hemî bax û rez**

**Li binya çiyê hemî êl û pez..”**

Ew, di temenê xwe de kalemêr bû. lê berê dara evîna wî naz e, ciwan e. xweştir û ciwantirîn helbestên evîniyê hûnandine, û li ser hezkirin û evîndariya keç û xortan û yar û dilberan lorandiye. Li ser dûrî, gihandin û kavilên evîndariyê nivisandiye.

**Ma gelo nayê te bîrê, ku te dildarek hebû**

**Her wekî reswa û kola, tim l’ber dergahê te bû**

**Her dema ku te nedîba roj dibû lê wek tenî**

**Xan û eywan tim li wî zindan û hebs û çale bû**

Seyda ne tenê li ser heskirina keç û xortan nivisandiye, lê belê rola keç û xortên xwendevan di rêvebirina kar û xebatê de mîna serê rimê dibîne û bi dengekî bilind hawar û gaziya xwe

digihîne xortên xwendevan û ji wan dixwaze ku bi rola xwe ya dîrokî rabin:

**“Xortê jîr û xwendevan çare û ûmîda milet**
**Rabe ji xew tu carek serê roja me derket**

**Xwe rapêçe birader ji bo kar û xebatê**

**Kes nema ye di xew de cîhan pêkve li hev ket**

**Li çar kenar û hawêr şer û halan û ceng e**

**Karwanê riya jînê binêre va bi rê ket**

**Li şûnwara nemînî dem pir xweş e birader**

**Di vê wextê nemane tu kes bê al û şewket...”**

Seyda, gelek stranên folklorî bi kêş û serwe hûnandine. Ew stran ji mirinê reha kiriye û sipehîbûn û qeşengî berdaye nav rewanê wê de, û bi hunerek pir mezin û bilind hûnandiye. Mîna: Siyamend û Xecê 335 malik in, Sîpan û Perwîn 400malik in û Ciwan û Kejê jî 421malik in.

Weharenge bi dîrok û mêjiwa gelê xwe ve jî girêdayî bû û leheng, mêrxas û navdarên dîrokê di helbestên xwe de anine ziman.

**“..Buhiştek Xuda ye li xakî zemîn**

**Berê ew bi navê Meya Fareqîn**

**Ne dûre ji havîngehên ber Ferêt**

**Bi nav û bi deng bûye bûka welêt**
**Ji berya hezar sal Meya Fareqîn**

**Dibû dewletek serbixwe nazenîn**

**Dema bûye dewlet bi serxwe'v dihat.."**

## Berhemên wî yên çapkirî ev in:

1-Dîwana **Xelat**, pêşgotina: Dilawerê Zengî, Libnan-Beyrût-1985. Ev dîwan di sala1990î, li siwêdê jî careke din hatiye çapkirin.

2-Dîwana **Zozan**, pêşgotin: D. Zengî, Libnan-Beyrût-1990.

3-Dîwana **Cûdî**, pêşgotin: D. Zengî, Libnan-Beyrût-1998.

4-Serpêhatiyên Kurdan, perçê(1)ê. Şêx Tewfîqê Huseynî, wergerandina ji bo zimanê Erebî ye.

**5-**-Mewlûda Pêxember(Kurdmancî). Pêşgotin: D. Zengî, Libnan- Beyrût-2006

**6-**-Serpêhatiyên Kurdan, perçê(2). Pêşgotin û wergerand ji bo zimanê Erebî: D. Zengî, Libnan-Beyrût-2009.

Li vê dawiyê berhemên seyda li Bakurê kurdistanê ji alî weşanxana Peywend, çapa yekem, 2015, Stenbolê hatine çapkirin. Hersê dîwanên wî (Xelat, Zozan, Cûdî), di yek pirtûkê de. Herweha herdû serpêhatiyên Kurdan perçê (I-II) di yek pirtûkê de û Mewlûda pêxember jî hatiye çapkirin.

**Seyda sê caran hatiye xelat kirin:**

-Xelata roja helbesta Kurdî li Sûriyê 1995.

-Xelata(100)saliya rojnamevaniya Kurdî.1998, Hewlêr.

-Xelata Koma Helebçe ya Folklorê Kurdî li Cizîrê- Hisiça. 2001.

# Helbestvan Yûsuf Berazî (Bêbuhar)

## (1931-2009)

Ji biçûkaniya xwe de min ji helbestê hezdikir. Min pir guhdarî li stran û berhawan jî dikir. Serhawe û helbest ji min re mîna nan û avê bûn. Di jiyana xwe ya rojane de bê wan qet min aram nedikir. Rojên min bê xwendin û nivîsandinê derbas nedibûn. Roj bi roj, şêt û şeyda, hezkirin û evîndariya rewşenbîriyê li min gûrtir û hartir dibû. Ji ber agirê wê, min çavê xwe li ûşt û akamê digerand. Min çavê xwe li mirovên rênas û rêberên vê evîndariyê digerand. Di serî de, evê evîndariya rewşenbîriyê ez bi seydayê Ceger-xwîn û Tîrêj dam naskirin. Ez bi Hesen Hişyar, Ehmedê Palo, seydayê Keleş, Mele Nûriyê Hesarî, Ehmedê Şêx Salih û …htd dam naskirin. Ez bûm suxte, şagirt û xwendekarê wan. Li civat û rûniştinên wan beşdar dibûm. Di baweriya min de ez guhdarekî baş bûm. Lê, gerok bûm, dilkoçer bûm, her roj mîna mirovekî tî, ez li kaniyeke nû digeriyam, min peyala xwe ji kehniya wan dadigirt û vedixwar. Min hinek ji têna agirê dilê xwe pê dişkenand.

Di sala 1984-an de, min helbestvanê gewre Bêbuhar, cara pêşî, dît. Ne ko min nav û dengê wî nebihîstibû yan min berhemên wî bi dengê dengbêjên mîna Mehmûd Ezîz, Seîdê Gabarî û bilbilê xemgîn Mihemed Şêxo ne bihîsti bûn. Lê, ji bextê min î reş li hev ne dihat ko em hev bibînin. Di riya Hunermendê mezin Mihemed Şêxo re min ew li Şamê naskir.

Rojekê destbirakê min hunermend Mihemed Şêxo hate mala me û mirovek pêre bû. Mirovekî bejin bilind bû. Bi cilin temîz û spehî bû. Bi qilafet û zend û bend bû. Mirovekî pir mûdêrin û efendî bû. Di wê rojê de Seydayê Tîrêj jî li malê, li cem min bû. Dema ko derbasî rewakê bûn, ewan û seydayê Tîrêj silavin germ dane hev. Di wê gavê de, min mêvanê xwe naskir. Mêvanê min helbestvanê gewre Bêbuhar bû. Ew Bêbuharê ko ez bi hisreta dîtina wî bûm.

Di wê rojê de, ji bextê min î sipî, sê bazên çeleng li mala min civiyan. Birastî, min ji dîtina çavên xwe bawer nedikir. Eger min şev û roj xwe bergorî Xwedê jî bikira, wilo li hev nedihat. Te digot ez di xewn û xeyalan de dijîm. Lê, vê carê xewna min rast e. Bi riwekî geş û bi zimanekî xweş berê xwe da min û got: (Birazî! Ez jî mîna

seydayê Tîrêj mêvanê te me. Karê ko ez pê hatime mîna karê seydayê Tîrêj re, bê te çawa dîwana seydayê Tîrêj çêkir, tê ya min jî çêkî). Birastî, ji kêfa re nema erdê ez hilanîm …per û bask bi min ve nîn in ko ez bifirim. Ew kesên ko nav û dengê wan ji min re mîna efsane û xeyalan bûn, îro ez wan li ber çavên xwe dibînim.. Na, na û mêvanên min in jî. Ez pir bi hatina wan dilşa bûm. Ji kêfa re min kumê xwe avêt azmana.

Li dora bîst û pênc rojan (Bêbuhar) mêvanê min ma. Min dîwana wî Zindan tev li ser tilnivîsê ji tîpên Erebî veguhest tîpên latînî. Li ser daxwaza wî min pêşgotinek ji dîwana wî re jî nivîsî. Helbestvanê berêz jî di vê dîwana xwe de helbestek pir bi nirx û buha diyarî min kir. /Ez spasdarê wî me/. Ji wê rojê de, peymana biratî, hevaltî û dostaniyê me da hev.

Yûsufê Berazî (Bêbuhar) xwedî pirhuner bû. Mirovekî welatparêz û xebatkar bû. Mirovekî Helbestvan, Sazbend û dengxweş bû.

Di sala 1957-an de, partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê hate damezirandin. Tekoşerê gewre Bêbuhar ji nifşên pêşî bû ko tevlî tevgerê dibe. Ji ber ko mirovekî welatparêz û miletperwer bû. Ji

ber xebat û karê siyaset û ramyariyê, gelek caran hatiye girtin û ketiye hebs û zindanan. Di zindanê de pir lêdan, êş û dijwarî kişandiye. Li ser gotina hevalê wî Mele /Dawidê Zeynê/ yê di wê demê de, pê re girtî bû, dibêje: (Di sala 1961ê de dema em hatin girtin Yûsuf (Bêbuhar) di zindanê de girtî bû; mirovekî mêr û mêrxas bû. Ji hevalên xwe tevan pirtir lêdan dixwar û qet radestî nedikir û serê xwe ne ditewand. Mêraniya wî hêrs û xurtî dida me girtiyan tevan. Tekoşerekî gernas û şoreşger bû.

Gotin dîsa ya Mele Dawidê Zeynê ye:( Her roj du-sê caran di zindanê de li me dixistin. Xwîn ji nav tiliyên me derdibûn, canê me ji lêdanê reş û şîn dibû. Setem û zora li me dibû li tu kesî nebûye. Carekê ji neçarî Yûsuf (Bêbuhar) yek ji wan (mûxaberatan) parastinên ko li me dixistin girt û da ber lukim û pêhna, ew (mûxaberat) di nav xwînê de hişt. Piştî ko yê mûxaberat lêdana xwe xwar, hevalên wî ew birin nexweşxanê, heft rojan di nexweşxanê de ma. Lê, mala wan ne ava be lêdaneke pir zor li Yûsuf (Bêbuhar) dan û ew pir êşandin, û hema ji mirinê riha bû).

Ev mêranî, serfirazî, û welatparêziya wî her kes jê re dîdar e. Helbesta pêşî ko nivîsandiye bi

navê (Hebs û zindan) wêneya jiyana wî ya tekoşînê ye. Ev helbest ji her kesî ve naskiriye. Navê dîwana xwe ya yekem jî kiriye 'Zindan' e. Navên her pênc dîwanên wî nîşana volqana raparîn û liberxwedanê ne. Nîşana omîd û daxwazên gelê Kurd in.

Bêdiro, helbesvanekî jîwerî bû. Ji wêjeya jîweriyê dihat naskirin. Ji naveroka helbestên wî diyar e, ko ew bi derd û kovan, xweşî û nexweşî, paşketin û pêşveçûna gelê xwe ve girêdayî bû. Pir derdê zor û sitemkariya li ser neteweyê Kurd, hoy û sedemên bindestiya wan dikşand. Ewî ji bo rizgariya Kurdistanê pêwîstiya têkoşînek bi yekdest û canbêzariyek bê sînor didît. Bi hunereke bilind û bi zimanekî şêrîn û zelal ev rewş di helbestên xwe de tev aniye ziman.

Seydayê Bêbuhar li ser şop û riya helbestvanên helbesta Kilasîk ya resen helbesta xwe ristiye. Di helbesta Kurdî de xwedî cihekî berz û diyar e. Xwedî gencîneyeke dewlemend û buha ye. Di helbesta resen de bazekî serbilind e. Li pişta evî bazê serbilind, bazekî şeyda û bejin bilind heye; ew jî serdarê evîndaran seydayê Cegerxwîn e. Bêbuhar mîna gelek helbestvanan di bin baskê bazê aza nemir Cegerxwîn de hînî

perwaze û firê dibe. Bêbuhar di derya helbesta Cegerxwîn de hevotî melevaniyê dibe.

Çawa di meydana tekoşîn û siyasetê de xebatkarekî serfiraz û leheng bû, weharenge di meydana rewşenbîriyê de jî helbestvanekî bêhempa û zîrek bû. Mirovekî xemxurê pirsa gelê xwe bû. Berketiyê belengazî û xizaniya miletê xwe bû. Mirovekî pir hestenik, dilovan, rûgeş, nefsbiçûk, civatxweş û bi danûstendin bû.

Seydayê Bêbuhar ji biçûkaniya xwe de dest bi hûnandina helbestê kiriye. Naveroka helbestên wî; şoreşgerî, welatparêzî, xweşxwan, perwer û evînî bû. Awayên helbestên wî nerm, rewan û gelerî bûn. Bi şêweyekî rehet, hêsan û sivik, helbestên xwe dihûnandin. Bi rengekî gelemperî helbestên wî dibûn stran; ji ber ko mirovekî hestenik, guhsaz û sazvan bû. Helbestên xwe bi awaz didane dengbêjên wê demê, û li ser serê wan hunermend Mehmûd Ezîz Şakir, û pişt re Seîd Gabarî û Mihemed Şêxo, û li vê dawiyê Zubêr Salih û hinin din.

Rojekê min jê pirsî: Seyda! Hewqas dengê te xweş e, saza te nûjen e, gelek alavên mûsîqî jî didî, çima tu nastirê?! Ji min re got:

(*Min di serî de karê siyasetê kir, karê siyasetê û dengbêjî li gorî wê demê li hev nedihatin. Civakê qet mirovên dengbêj qebûl nedikirin. Çawa ez karê siyasî bikim û dengbêj jî bim??!! Pir dijwar bû… Bîr û baweriyên bi doza gelê min, û karê xebatkarî zora dengbêjiyê bir. Lê, min ji xwe re her û her distira û awaz çêdikirin…û min awazên xwe didane dengbêjên wê demê .. Ez çi bikim, bi vî awayî min kela dilê xwe hênik dikir*).

Di sibeha roja pêncşemê 15/1/2009-an de, li bajarê Serê Kaniyê -parêzgeha Hisiça, siwarê helbesta resen ji nav me barkir. Bi çûna wî re stûnek ji stûnên helbesta Kurdî ya resen hilweşiya. Sed mehder û dilovanî li giyanê wî bibarin û cihê wî buhişt be.

Di dawiya gotara xwe de, ezê rê bidim mamoste û helbestvanê gewre Bêbuhar ko kurtejînenîgariya xwe bi we bide naskirin:

**Kurtejînenîgariya min:**

Ez Yûsif kurê ‘Elî’ Elîyê Şêxo me, pêşî cîwarê bav û kalên me bajarê Kobanê bû. Lê, piştî

fermana osmanîyan bav û kalên me çûn bakurî bajarê Helebê, li gundê Tilcircê bi cîwar bûn. Ez di sala 1931 -ê de li wî gundî ji dayik bûm. Di sala 1947 -an de me jê barkir, û em li Minbicê bi cîwar bûn. Piştî heft salan, ango di sala 1954 -ê de em hatin bajarê Serê Kaniyê û ta nuha jî em lê dijîn. Berî ku ez bibim helbestvan dengê min gelekî xweş bû, min li tenbûrê “biziq” dixist û min bi heval û dostên xwe re di civatên gelêrî de stiran digotin.. Stiranên me wek ku min gotî hew di şevbuhêrk û civatên gelêrî de bûn. Di wê çaxê de tomarkirin tunebû.

Çîroka min bi helbestê re dûr û dirêj e, Berî ku ez têkevim warê stiranê, min ji helbestê hez kir. Min di riya danûstandinê re jê re kar kir. Min seydayê nemir Cegerxwîn naskir û têkiliyên min pê re xurt bûn. Dûvre têkiliyên min bi mamosta Reşîdê Kurd re çêbûn. Wî jî hişt ez hînî rêzimana kurdî bibim. Mele Sîrac û mele Reşîd hebûn, gelekên din jî hebûn, lê nayên bîra min. Min di rêya van ciwanmêran re gelek pirtûk xwendin; mîna dîwana Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, pirtûkên li ser pêlawazan, yên li ser dîroka kurdî û herweha pirtûkên bi zimanê farisî jî. Ji sala 1966-1979-ê, çi helbesta ku min

dinivîsand, min ji seydayê Cegerxwîn re dibir da ku serast bike..

-Min gelek helbest dane stranbêjan, yê pêşî hunermend *Mehmûd Ezîz Şakir* bû. Di sala 1967 -ê de min ew naskir, û min gelek helbest tevî awazan dane wî.
Mîna:
Hebs û zindan gotin û awaz Bêbuhar.
Perwîn gotin Rêncber awaz Bêbuhar.
Rabe ji xewê gotin û awaz Bêbuhar.
Şînbû rîhan gotin û awaz Bêbuhar.
Eman dilo gotin û awaz Bêbuhar.
Gulîzar gotin û awaz Bêbuhar.
Dilê min her bi ahîn e gotin Bêbuhar awaz mamosta Mihemed Elî şakir.
Şêrîn tu cînara min î gotin Bêbuhar awaz mamoste Mihemed Elî Şakir.
Mehmûd Ezîz çû êzgeha kurdî li Bexdayê û stiran li wir tomar kirin.
Piştre *Se'îd Gabarî* derket. Hat cem min, min helbest danê.  Ew jî ev in:
Koçê mi bar kir. Hat xweş buhar. Bê bext felek. Di tarî da. Ew jî çû êzgeha kurdî li Bexdayê û stiran tomar kirin. Min hunermend *Mihemed Şêxo* naskir, min gelek stiran dan wî jî.

Mîna:
Hebs û zindan. Ez bûm ferar. Şêrîn tu cînara min î. Rabe ji xewê. Yarê şekir. Pismamo. Şeva tarî. Dayê (ez jî bi cî bim). Dayka dilovan. Eman. Eman. Çibkim bi can. Derdan çi ez dil jar kirim. Koçê mi bar kir. Welat welat. Gulîzar. Eman dilo. Perwîn (gotin: Rêncber-awaz:Bêbuhar). Kûba û Vêtnam. Û hindek stranbêjên din jî hene ku min helbest tev awazan dane wan wek Zubêr Salih, û Mistefa Xalid …….

**Berhemên çapkirî :**

1. Zindan helbest /1988.Pêşgotina: Dilawerê ZENGÎ.
2. Bang helbest /1997
3. Raperîn helbest /2002
4. Serxwebûn helbest/2006. Pêşgotina: Ibrahîm El-Yûsuf.

5.Pêşketin helbest /2007

Û gelek dîwanên min yên ne çapkirî hene.

# Hesen Hişyarê Serdî (1907-1985)
# (Jiyan, Tekoşîn û Berhem)

**"Millet'im rabe binêre îro çaxê xweserî**

**Kes ji te pêve nemaye, dîl û jar û bê serî**

**Mane şerm e, em tenê mane dibin destê neyar**

**Ta bi kengî wer bimînin, ew şivan û em kerî"**

**H.H. Serdî**

Hesen Hişyar kurê Mistefayê Hecî Umer e, ji kurdistana bakur, ji wilayeta (Diyarbekir an reş Amed), qeza (Hênê), gundê (Serdê), ji malbat û barîxa wan re (Sadîqan) tê gotin, ku ji êla (Zerikan) e. Di sala 1907[12]-an de, li wî gundê bav

[12] Hesen Hişyar di qewêtiya xwe de, ya ku di 25-ê Hezêranê 1984-an de, ji zarokên xwe re nivisandiye, dîroka bûyîna xwe (1907)-an dide diyar kirin. Ez bawer im wê ev ya rast be.Di hin destnivîsên wî de, bûyîna xwe di sala  (1905)-an de nivisandiye, ez bawer im wê ev şaş be, ji ber ku (li ser gotina wî) dema şoreşa şêx Seîd 1925-

û bapîrên xwe, hatiye dinê. Zarotiya xwe, wek hemû zarokên gundan, piştî ku temenê wî bûye heft salî, li ber destê melê gund (Hadî Emîn) qurana pîroz xwendiye. Piştî mirina bavê wî, diya wî (bi xwe Zazî ye) wî dişîne gundê xalê wî (Derqam), li wir, li ber destê xalê xwe şêx Ehmed hînî çend pirtûkên olî bûye. Piştî ku bîrewer dibe, li ber destê mamostakî penaber (Muhacir) bi navê (Haşim) sê salan xwendiye, û serwextî gelek tiştên nuh bûye.

Di dema cenga cîhanê ya pêşîn de (1914-1918). Pireya bûyerên wê cengê tên bîra wî, nemaze pergala birçîbûnê, nexweşiyê û penaberiyê (Muhaciriyê). Giraniya şer ketibû kurdistanê, ku hingê enî tuxûbê Qersê bû. Piştî salekê, leşkerên Osmanî berûpaş vedikişiyan, roj bi roj eniya şer bi şûn de vedigeriya, heya ku enî kete (Erzerum, Wan, Bedlîs, Artevîn û Mûş),

---

an de tê girtin û ji ber biçûkbûna temenê wî biryara bidarvekirinê lênakeve, ew tenê 15 salan ferwerî dibe.

kurdên van hawîran tev de welat berdidan û penaber dibûn.

pergala eniya şer li (deşta Parsîn, Erzerum û Hesen qela) pir nexweş bû. Ev qad, li tuxûbê Kurdistana Bakur û Ûris dikeve. Gundê Hesen Hişyar û malbata wî, li dora not malî bûn, çel û heşt peya çûn wî şerê mirovxwer, yek ji wan venegeriya. Di wî şerî de, leşker di nav berfê de, bê çek û xwarin tev de, ji ber sipî û nexweşiyan qir dibûn. Rewşa kurdan û welatê wan Kurdistanê pir dijwar bibû.

Di 16/5/1916-an û di riya van her sê dewletên mezin Rûsiya, Birîtanya û Ferensayê re, û bi navînkirina -peymana reş -Saykis –Bîko-, Bakurî Kurdistanê giha Turkiya, Başûrî Kurdistanê giha Îraqa nuh, Rojavayê Kurdistanê giha Sûriya, û ji xwe Rojhilat tev di bin destê Îranê de ma.

Piştî rûxandina dewleta Osmanî, kurdan derfet û nîreke nuh di derbirîn û çareserkirina pirsa xwe de dît. Nemaze di danezana rêbaza Wilson ya çardexal de;  ji bo mafên miletan bi azadî û

serxwebûnê bê çespandin. Lê, mexabin biryarên Sêvirê, li kongira Lozanê 23.07.1923-an binpê kirin, û hevkaran soz û peymanên xwe bi Kurd û Kurdistanê re xwarin.

Piştî têkçûna peymana Sêferê û îmzekirina Peymana Lozanê, di 29-ê Cotmeha 1923-an de, Komara Tirkiyê tê çespandin. Hebûna kurdan tê tunekirin. Li ser vê yekê, hinek serbaz, axa, beg, şêx û rewşenbîrên kurd li Erzerumê di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de, bi navê (Komîteya Îstîqlala Kurdîstanê) yan jî tevgera (Azadî) rêxistineke siyasî didamezirînin. Di çiriya paşîn, sala 1924-an de, ji nişka ve Xalid beg û nûnerê Bedlîsê Ûsif Ziya herdû hatin girtin, birin Bedlîsê, û bê pirs û bersiv herdû bidarvekirin. Ev rêxistin, bingeha pêxistina agirê şoreşa Şêx Seîdê Pîran 1925-an bû.

Bi vêxistina agirê şoreşa Şêx Seîdê Pîran re, Hesen Hişyar tevlî wê serhildanê dibe, û bi hestekî neteweyî û bi ramaneke azadîxwaz, di teqîna gula pêşî ji şoreşê tifingê, hildigre û tevlî refê şervanên azadiyê dibe. Di gelek eniyên

cengê de, berevaniyeke lehengî û mezin dike. Di nava agirê şer û cengê de, nexweşî, dijwarî, xinizî, mêranî, qehremanî, cangorî û pakrewanî tev bi çavên serê xwe dîtine. Lê, ewî newqa xwe ji dijmin re vala nekiriye û bi lehengî û liberxwedanî şer kiriye. Piştî şoreş têkçû, rêjîma Atatuk dest bi girtinê kir. li herderê welat dest pê kirin, li gorî awirên wan, sûc bêsûc herkes digirtin. Ewçend ku ji zindanan pê ve mizgeft û dêr jî dagirtin.

Hesen Hişyar jî, ji wan girtinan bêpar nema, ew jî hate girtin. Li ber dadgeha leşkerî bi darvekirinê hate ferwerî kirin. Lê, ji ber temenê wî biçûk bû, panzde salan arih kirin. Di nav van zindanan de (Diyarbekir- Xarpêt- Qeyserî û Nigde), li dora sê sal û nîvan girtî maye, paşê ew jî dikeve ber biryara riha, ya ko di sala 1928-an de derket û ew vegeriya welêt. Piştî bûriya giştî, diçe bajarê Diyarbekirê wek kargêrê cergeya tabûya Qulpê li ba dewletê kar dike.

Di sala 1930-î de, bi geşkirina agirê şoreşa Sasûn û Araratê re, rêjîma turk kesên di cihê

gumanan de digirtin, nemaze yên berê hatibûn arih kirin. Dîsa Hesen Hişyar giha refên şervanên azadiyê. Piştî mayîna sê salan li serê çiyan, ku ji Licê heya Xarpêt û Bîngolê digel du hezar şervanî. bi şev û roj ji bo piştgiriya Araratê bi dijmin re şer dikir. Şoreşa Araratê têkçû, û ew û çar peya daketin binya xetê-Cizîrê.

Di sala 1934-an de, ew û du pismam û birakî xwe, bi du gulan birîndar, daketin Cizîrê, li bajarê Amûdê, bi cihûwar bûne. Ji ber rewşa bêkarî, zîvarî û belengaziyê, di riya Qedûr beg re li gundê (Rihîkê) li nav êla Milan, ku dikeve navbera Amûdê û Dirbêsiyê demekê dimînin. Ji neçarî, ji wir jî bar dike û diçe gundê (Eyîn Qirdê) sê salan li wir cotkariyê dike. Dîsa ji wir jî bardike û diçe (Senceqê)- dikeve qubleyê Amûdê-. Di sala 1938-an de, li gundê (Senceqê) dibistanekê ji bo hînkirina zimanê Kurdî vedike. Piştî salekê ji vekirina wê dibistanê, bi destê firensizan hatiye girtin. Piştî şeş salan ji jiyana cotkarî û gundîtî, bi malbatî, di sala 1940-î de, dîsa vedigere, li bajarê Amûdê bi cî dibe. Li

bajarê Amûdê firoşgeheke pertêl vedike.  Di wê demê de, bajarê Amûdê navenda çand û wêjeya kurdî bû. Bi saya serê gelek welatparêz û gelperwerên mîna: Reşîdê Kurd, Mele EvdulHadî, Cegerxwîn, Qedrî can, Ûsê Hersan, Mihemed Elî Şiwêş, şêx Selîm, Nûredîn Zaza, Şêx Beşîr, Ehmed Nafiz, Tîrêj û Hesen Hişyar…. HT.. bajarê Amûdê rûgeha welatparêz û şervanên azadiyê bû. Hingê kovar û rojnameyên kurdî pir dihatin çapkirin û belavkirin mîna: (Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr), belavokên civata Xoybûnê û hin kovar û rojnameyên ku bi zimanê erebî dihatin weşandin mîna: (Wijdan û Huriyê) .. HT. Li herêma Amûdê û derdora wê abone û kiryariya wan kovar û rojnameyan tev di riya Hesen Hişyar re bû. Ji milê dî ve, nivîskarên van kovaran, di riya wî re nivîsandinên xwe rêdikirin û berhemên wan dihatin weşandin. firoşgeha wî bûbû wargeha xortan, hêlîna fêrkirin û danûstendina li ser zimanê kurdî, navenda her mirovekî welathez û gelparêzan. Ew bi xwe, di wan kovar û rojnameyan de dinivisand û bi herdû

zimanên Kurdî û Erebî berhemên xwe belav dikir.

Hêjayî gotinê ye, di wê demê de, bajarê Amûdê navenda zana û zanyarên olî yên gewre û mezin bû mîna: Şêx Mihemdê Moza, mele Ebdulletîf,mele Fethulla, mele Ebdulhelîm, şêx Beşîr Elhamidî, şêx Ubêdê şêx Zahir, şêx Ehmedê Kesk, şêx Ebdulmecîdê Huseynî, şêx Efîf û şêx Selîmê Huseynî….HT.

Di navbera salên 1953-1957-an de, têkilî û danûstendinên Hesen Hişyar bi rojnameya Wijdan û Huriyê re hebûn.

Di sala 1956-an de, li bajarê Helebê, Hesen Hişyar û çend hevalên xwe civatek bi navê (Komela Zanistî û Alîkarî ya Kurd) pêk anîn.

Damezrênerên komelê: Dr. Nûrî Dêrsimî, Rewşen Bedirxan, Hesen Hişyar, Osman Efendî û Heyder Heyder bûn. Armanca komelê; pêşxistina ziman, tore û dîroka gelê Kurd bû. Mexabin, pir dirêj nekir. Li dora du salan (1956-1958) tenê berdewam kir.Lê pir çalakiyên hêja

kirin. Damezrênerê komelê Hesen Hişyar di destnivîsên xwe de dibêje:

-`Bi doza Kurd ve me (18) rûpel nivîsarek li Misrê bi destê Mihemed Hilmî beg da kongirisa (Bandok).

-Ji bona şoreşa (Ciwanrû yên Kurdên Îranê) me (protustokî) bi navê (Jenosît) bi zimanê (Erebî, Turkî, Farisî û Firansewî) dijî (şah) da belav kirin.

-Bi (Partiya Eyoka ya Qubrisî) re, me hevalbendî girêda, her buyerên wan me di rojnama xwe de didane belav kirin, ji ber ko ew jî dijî dewleta Turk û Ingilîz bûn. Çawa ko meseleyên Kurd jî li (Atîno) serekê diyaneta Islamî (Hafiz elîreşad) werdigerandin zimanê (Yûnanî) û di rojnameyên wan de didane belav kirin.

-Li (Beyrûtê) di rojnameyên Erebî de li ser Kurd û Kurdistanê di rojnameya (Wicdan-Huriyet) de didane belav kirin`.

Evê komelê gelek pirtûk dane çap kirin û belav kirin. Ji wan pertûkan:

- El-red `ele kosmopolîtiye – Hesenên Şiniwî. (Bi zimanê Erebî).
- Kîfah El-ekrad – Samid El-Kurdistanî. (Bi zimanê Erebî).
- Dêrsim di tarîxa Kurdsitanê de- Dr. Nûrî Dêrsimî.(Bi zimanê Turkî).

Diyar e, kar û çalakiyên vê komelê ji temenê wê pirtir bûn. Bi temenekî kin, ko du salan bi tenê dirêj kir, xebatin berfireh ji gelê xwe re kirin. Evê komelê -mîna komelên din- piştî damezirandina Partiya Demoqrat ya Kurdistanê, ewê jî xwe helkir.

Di sala 1962-an de, ji bajarê Amûdê berî dide bajarê Qamişlo, li wir, bi cî dibe, ta ku ji nav me bar dike.

Di sala 1966-an de, kovara AGAHÎ[13], bi destê ronakbîrê gewre Hesen Hişyar derket. Di rûpelê

[13] Ji bo agahiyên li ser kovara (AGAHÎ) yên ku heta niha hatine belavkirin, digel wêneya bergê kovarê, ku ji alî gelek nivîskar û rewşenbîrên me bikar anîne , tu kesî çavkanî û jêderê wê negotine û

pêşîn de hatiye nivîsandin: (Kovarek(e) zanistî, toreyî, tarîxî û siyasî ye). Kovar, li parêzgeha Hisiça, bajarê Qamişlo derdiket. Ji alî tîp û gewdê kovarê 20X40 s.m-ye. Rûpelên wê ji (15-33) rûpelan hevedûdanîye. Ji ber rewşa ramyarî xwediyê kovarê kovara xwe li tilnivîsê dida û bi hejmareke hindik û bi awayekî veşartî belav dikir. Ne tenê barê xercî û belavkirina kovarê li ser milê xwediyê kovarê bû, belê nivîsandin û amadekirina wê jî jê dihate xwestin. Kovar di nîrekî pir dijwar de derdiket. Lewre tu demek diyar ji derketina wê re nebû. Hejmarên vê kovarê gihane nozde hejmaran. Naveroka kovarê pirtir ramyarî û dîrokî bû. Xwediyê kovarê nerîn, dîtin û bîr û baweriyên xwe di riya vê kovarê re didane belavkirin. Hin caran bûyerên Kurd û Kurdistanê belav dikirin.

Di kovarê de du helbest û nameyek bi tenê ne yên xwediyê kovarê ne. Helbestek ya nemir Ehmedê Palo, û ya din ya nemir Hemzayê Muksî

---

nedane xuya kirin. Ji ber ko tu kesî berî min li ser vê kovarê nenivisandiye. Ev jî cihê mixabiniyê ye.

ye. Name jî ya Prof. Qenatê Kurdo ye, ya ko di sala 1956-an de ji Komela Zanistî û Alîkarî ya Kurd re rêkiribû. Qenatê Kurdo di wê nameya xwe de dibêje: (Gelî biran ji wê xebata we re sipas dikim, eger çiqasî dijwarî bikevin pêşiya we jî, divê hûn zêdetir navê Kurd û Kurdistanê di roznaman, kovaran û her nivîsarên piçûk û mezin de bidin belav kirin. Em di esra bîstî de ne esra ronahî û atomî de ne. Îro miletên bêdeng zû asîmîlasyon dibin, heya zarok negiriyê dê bi wê dilovaniya xwe şîr nade wî an wê....).

Xwediyê kovarê daxwaz û sedemên derketina kovara xwe dide diyar kirin û dibêje:

(Daxwaz ji vê kovara veşartî û destnivîs: Herwekî ji zanan re qenc agahe ko li gor rêzan û heq nenasiya rojhelatê navîn dewletên Kurdistan vegirtî, xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî gunehkariyek ji kiryariya (muxederatan) gelek mezintir û dijwartir e...).( Nemaze kurdên Sûrî ji (1958)an de, di giriftariyên dijwar de hatine girêdan... di her awayên teqalîdên xwe ên qewmî

û civatî de pêçandî mane! Çewa ko her niştimanperwerên ji hev dûr nikarin bi serbestî û hêsanî bigîne hev û serpêhatiyên tê de, ji hev re bidin zanîn û li ser çare dîtinan heş û agahiyan bi hev biguhêrin..!). (Ji ber wan bûyerên zeman û mekan di armanca xebatê de ji bo agahdariya hin niştimanperwer li gor pêkanînê min xwe berpirsiyar dît. Da ko nûçe û bûyerên der û hundir ên ko doseya Kurdistan, di xwe de digre ji wan re bişînim. Lewre rojên teng û tarî nêçîrê tarîxê ne).

Xwedî û berpirsiyarê kovarê li ser vê bingehê kovara xwe derdixist, û raman û baweriyên xwe didane belavkirin. Bi giyanekî gewre û ramaneke bîrewer pêwîstiya yekîtiya tevgera Kurdî dide diyarkirin. Bi xurtî şerê perçebûn û jihevketina tevgera Kurdî dike, dibêje: (Çep û rast herdû milên laşekî ne, laş ko nebe kîjan milê çep û rast!!??).

Xwediyê kovarê mîna bijîşkekî pespor destê xwe datîne ser birîna nesaxiya tevgera Kurdî, ya

ko sedema jihevketin û bindestiya gelê Kurd e, bi zanîn diyar dike û çare û derman jê re dibîne. Ew çare û derman yekîtiya tevgera Kurdî ye.

Hesen Hişyarê Serdî gencîneyek devgirtî ye. Dîrokvan, helbestvan, rojnamevan û tekoşerekî gernas û navdar re. Di kûrahiya heşt hezar sal berî zayînê de, li ser dîroka kevnareya şaristaniya gelê xwe nivîsandiye, û bi belge çespandiye. Nijadê kurd bi kok û rehên wê yên dîrokî, li ser xaka bav û bapîran vejandiye, û bi awayekî zanistî xelekên dîrokê bi hev girê dane û li ber çavan raxistine. Gelek caran bi awayekî zanyarî nerîn û dîtinên xwe bi şehekî taybet dihûne.

Ew bixwe dibêje: (Çima ji tarîxê re tê gotin: Muqedes?. Ji ber ku salix ji wan insanên zemanên bûriyên dûr ve dide, her tevgerên jiyîn û serpêhatiyên wan bi wî zeman û mekanî ve girêdayî bixwe digre, wê rewş û her awayê wanên civatî, abûrî, dezgedarî, zanistî û siyasî ku ji wan bi şûn de wek: Sî an rêça wana mayî di zemanê îro de ji me re dide derpêşkirin, ku ji

muerixre muhendisê zeman û mekan tê gotin û ji paraztina mentiqa tarîxê re pîroz tê gotin).

Dîsa gotin ya ronakbîrê gewre Hesen Hişyar e: (Bi wê agahiyê divê em zanibin dema ku bixwazin zanibin ku tarîx ne pêgirtiyê nizam û qanûnên dewleta ne, wiharenge ne pêgirtiyê pirogiramên partiyên çep û rast û ne jî bi (felsefe yên rûhî û madî) ve jî girêdayî ye, ji ber ku ew tev de li ber mirêka tarîxê ne, ne tarîx ji ronahiya wan pêk tê no, felsefe di tecariban de xwe bi tarîxê digre. Em siya tarîxê û tarîx siya zeman e, ew zemanê ku ji xwe ye, bixwe ye û li xwe ye, her peyda ji zemanin lê zeman her ji xwe ye jêre pêşî û dawî nîne her tişt ji ve ne û pêvena, bê zeman îlmê felekiyat, riyaziyat û fîza jî nikare qiyas û nisbet bigre).

Hesen Hişyar bi dûrbîneke pir hûr, kûr û zelal sedemên her serpêhatî û bûyereke dîtî û jiyayî bi nav û nîşan rave dike. Ji peymanên navdewletî û sozên hevkaran, xapandina kurdan, parçekirina kurdistanê û sînorên çêkirî bigre, ta bi xinizî,

xapandin, nakokî û bêbextiya axa, beg, şêx û nezanên kurdan re derkeve, bi zelalî ta bi derziyê ve dike.

Em dikarin bibêjin seydayê gewre Hesen Hişyar dîdarê li ser hemû bûyerên dema xwe bû.

Seydayê gewre pir helbestên hêja û ciwan ji bo hişyarî û geşkirina hestê neteweyî nivisandine. Helbestên xwe bi awayekî kilasîk, bi pêlewaz û terazû hûnandiye. Naveroka wan li ser welatparêzî û berxwedanê ye. Xwediyê pirtûkekê li ser urûda kurdî ye. Gelek gotar û nivîsandinên wî di warê siyasî û ramyariyê de hebûn. Mirovekî siyasetvan bû. Xwediyê ezmûn û serpêhatîyan bû.

Hesen Hişyar bi sê zimanan (Erebî, Farisî û Turkî) dizanî bû. Yek ji nivîskarên her sê kovarên navdar (Hawar, Ronahî û Roja Nû) bû. Seydayê Tîrêj demekê li ber destê mamoste Hesen Hişyar fêrî zimanê Farisî bûye. Hesen Hişyar nav li seydayê (Tîrêj) kiriye û ji wê rojê de, seyda bi vî navî di nava gel de tê naskirin.

Hêjayî gotinê ye Hesen Hişyarê Serdî pênc law û heşt keçên xwe hebûn navên wan ev in:

Law: Selahedîn, Mustefa, Gorgîn, kesra, kamîran.

Keç: Perwîn, Gulistan, Gewher, Jale, Hêvîn, şêrîn, şevîn, şehban.

**Berhemên seyda ev in:**

-Pênc cild dîroka kurd ji (8000) sal berî zayînê heyanî qirnê (19)-an.

-Pênc cild dîtin û bîrhatinên min ji (1914-1984) bixwe digrin.

Sed heyf û mexabin ku hemû berhemên wî destnivîsin, nehatine çapkirin, ji bilî cildê yekemîn ji (dîtin û bîrhatinên min) ew jî, bi destê min, li libnan- Beyrût, çapxana Emîral, di sala 1993-an de hatiye çapkirin.

-Dîwanek ji helbestan.

-Zerdeşt û Newroz Bûza û Konfiçyos.

-Felsefa xebata welat.

-Gazî û hawara navbera Zagros û Zara-kirasekî ye.

-Urûda Kurdî ji bo helbestan.

-Nozde jimarên kovara Agahî.

-Deh muzakeratên ku min dane şoreşa Îraqê.

-Muzakeratên (Qedrî beg) min wergerandiye zimanê Kurdî.

-Şoreşa şêx Seîd û Araratê.

-Kirasê sipî û destê reş.

Ronakbîr, siyasetvan, dîrokzan, helbestvan û tekoşerê gewre, di 14-ê Êlonê sala 1985-an de, ji nav me koç kirye û li Dugirê hatiye veşartin. Hezar dilovanî li giyanê wî bibarin û cihê wî Buhişt be.

**Jêder û çavkanî:**

- Hesen Hişyar,(Dîtin û Bîrhatinên min) cildê yekemîn, li libnan- Beyrût, çapxana Emîral, di sala 1993-an de, bi destê min hatiye çapkirin.

-Kovara AGAHÎ- Rûpel:2.Hejmar:3. Sal: 1969.

-Kovara AGAHÎ- Rû:10.Hejmar:15. Sal: 1980.

-Kovara AGAHÎ-Rû: 11.Hejmar:16 . sal: 1981.

# Tekoşerê Gewre Ismaîl Umer

## Bavê Şiyar (1947)-(18/10/2010)

**Kurtejîneniîgariya Bavê Şiyar:**

Di sala 1947-an de, li gundê Qereqoyê hatiye dinê, û li wir xwendina xwe ya seretayî xwendiye.

Di sala 1960-î-1966-an li bajarê Dirbêsiyê li dibistana (Yermûk) xwendina xwe ya navendî bi dawî aniye.

Di sala 1965-an de, tevlî tevgera kurdî dibe û rûmeta endamtiyê di partiya Çep ya kurdî de werdigire.

Di sala 1967-an-1970-î de, Li Zankoya Şamê dixwîne û bawernameya (diploma) beşê Cuxrafya (Xaknigariyê) werdigre.

Di sala 1970-î piştî girêdana kongirê niştimanî, li ser riya partî karê xwe berdewam dike.

Di sala 1971-ê–1974-an de, leşkeriyê dike. Di sala 1973-an de, di şerê Tişrînê de nîşana lehengiyê (serbazî) werdigre.

Di sala 1975-an de, li bajarê Qamişlo dibe mamostê dibistanê û li wir bi cih û war dibe.

Di sala 1976-an de, dibe endamê komîta herêmî li Cizîrê.

Di sala 1977-an de li kongirê partî yê didiwan beşdar dibe, û bi alîkariya wî kongir gelek biryarên hêja werdigre.

Di sala 1979-an de, bi xurtî li hemberî biryara komîta navendî disekine û nahêle ko ew biryar here serî -ya ko dixwest: (qelskirin û kêmkirina têkiliyan bi p.d.k.îraq re).

Di sala 1980-î de, di kongirê sisiyan de, wek endamê komîta navendî û endamê mekteba siyasî tê hilbijartin.

Di sala 1980-î de, piştî hatina conta leşkerî li Turkiyê û binxetbûna gelek partîzanên kurd. bavê şiyar bi xurtî xwedî li wan derdikeve û piştgiriya wan dike .

Di sala 1984-an de, di kongirê partî yê çaran de careke din wek endamê komîta navendî û mekteba siyasî tê hilbijartin.

Hêjayî gotinê ye, rola wî ya gewre û berbiçav di damezirandina 'Hevbendî' de diyar e. Bi keda wî cara pêşî bû ko di nav tevgera Kurdî de, li Sûriyê Hevbendiya Kurdî tê damezirandin.

Di sala 1989-an de dibe sekreterê Partî (kongirê awarte).

Di sala 1990-î de, yekîtiya rêxistinî di navbera Partiya wî û Partiya (Kar) û refek ji hevalên Partiya Çep de çêdibe. Bi rêveberiya wî partiyeke nuh bi navê (yekbûn) tê avakirin.

Di sala 1992-an de, digel şandek ji partiya xwe (yekbûn) li ser vexwendina partiya Yekîtîya Niştimanî Kurdistan diçe kurdistana başûr û li kongirê wan beşdar dibe. Di wî kongirî de gotinekê bi navê pênc partiyên kurdên binxetê yên beşdar dixwîne.

Di wê çûnê de, serdana gelek partî û rêxistin û tevgerên kurdistanî dike, û bi taybetî ew serdana wî ya dîrokî ji sekreterê partiya demoqrata kurdistanê-Îran nemir Sadiq Şeref Kendî re.

Di sala 1993-an de, dîsa yekîtiyeke rêxistinî bi çend partiyan re çêdike û partiya yekîtî a Demoqrat ya Kurd li Sûriyê dadimezrîne û wek

sekreter tê hilbijartin, û li vê dawiyê jî wek serokê partiyê tê hilbijartin û li ser serê karê xwe dimîne ta ko ji nav me bardike.

**Bavê Şiyar û serjimara awarte:**

Di sala 1992-an de, ji bo bîranîna 5-ê çiriya pêşî ya sala 1962-an, wekî roja bîranîna serjimara awarte li parêzgeha Cizîrê hat nîşankirin. Bi pêşniyara nemir ew roj bi awayekî nuh ji rengê xebatê hat bibîranîn, (ev rengê tîkoşînê di nav bizava tevgera Kurdî li Sûriyê de karekî nuh bû) û ji ber wan çalakiyan, bi dehan hevalên wî hatin girtin.

Ew roj bû rojeke dîrokî di tevgera û bizava kurdên Sûriyê de. Bê dudilî, Bavê Şiyar xwedî li girtî û malbatên girtiyên xwe derket. Piştgiriya wan bi xurtî kir. Tîkoşîna hevalên xwe yên di hundirê zindanê û yên dervî zindanê bi hev girêda, û ew doza wan î dadmend li dunyayê belavkir. Bi dehên komcivîn û semîneran girêdan. Gelek poster, belavok û pirtûk di vî warî de dan belavkirin. Birastî pireya caran ew bi xwe li pêşiya dadgehê beşdar dibû. Bêdiro, ew kar û xebat bû mîna dibistaneke serbixwe di qata tîkoşîna Kurdên Sûriyê de.

Roj bi roj xebata wî di nava gel de xurtir û gurtir dibû. Baweriya milet pir pê dihat, ji ber ko ne miriyê navûdengê kesayetî û partiya xwe bû. Mebesta wî bicihkirina nasnama gelê Kurd bû. armanca wî yekîtiya tevgera kurdî bû.

**Bavê Şiyar û kongirê niştimanî:**

Ji çend salan de  Bavê Şiyar xwediyê projeya girêdana kongirekî niştimanî ji bo Kurdên Sûriyê bû. Mebest jê yekbûna gotina kurda bû, yekirina daxwaz û xwestekên gelê Kurd bû. Ev proje, projeya wî bû…ev armanc û xwestek a wî bû.. ev xwestek bû ya partiya wî, û pişt re bû projeya hevbendiyê.. Hevbendî  ji bo  vê projeya xwe name ji hemû partiyên Kurdên Sûriyê re rêkirin. Di roja îro de, bi saya kar û xebata wî hin gav tên avêtin.

Bavê Şiyar ne tenê kuldar û xemxurê yekîtiya tevgera Kurdî bû, lê belê wek Kurdekî Sûrî armanca wî yekbûn û yekirina xebat û tevgera Kurd û ya Erebî bû. Bi saya serê wî, ew dîwarê çêkirî di navbera tevgera Kurd û Ereban de hilweşiya, û bi têkilî û danûstendinên xwe, bi xebat û keda xwe, ew çalakiyên bi birayên Ereb re gihandine wê qûnaxê ko di sala 2005-an de

banga damezirandina Danezana Dîmeşiqê (Ilan Dimeşiq) bête der.

Digot: Tucarî bale bi yek baskî nafire. Divê xebata neteweyî û xebata niştimanî bi hev re, di yek rêzê de bin.  E.Xanî dibêje:

"**Pirsî ji dinê min ev bi hikmet**

**Mihra te çi gote min go himmet".**

**Bavê Şiyar û şerê xwekujiyê:**

"Ez mame di hikmeta Xwedê da

Kurmanc di dewleta dinê da

Aya bi çi wechî mane mehrûm

Bilcimle ji bo çi bûne mehkûm

Lew pêk ve hemîşe bê tifaq in

Daim bi temerrid û şiqaq in

Ger dê hebuwa me ittifaqek

Vêk ra bikira me inqiyadek

Tekmîl dikir me dîn û dewlet

Tehsîl dikir me ilm û hikmet".

Bavê Şiyar baweriya wî bi yekîtiya kurdan bê sînor bû. Di ber vê baweriyê de gelek ked û cefakêşî kişand. Li dijî perçebûna kurdan bû. Li dijî şerê birakujiyê bû.

Dîtin û nerîna wî di şerê navxweyî de cihê rêzgirtina hemû tevgerên Kurdî bû. Bi xurtî li hemberî şerê birakujiyê sekinî û qet mêldarîya hêlekê li dijî hêla din nekir. Digot: (Ev şer, şerê xwekujiyê ye. Ji me bê xwestin emê navçiyê bikin, em ji birayên xwe re amade ne. Di şerê birakujiyê de, tu kesê serkeftî nîn e).

**Bavê Şiyar û rola jinê:**

Di pêvajoya xebata wî de, jina kurd cihekî xwe yî hêja û berz hebû. Pir qedr û qîmetê jinê digirt û herweha piştgiriya xebata wê dikir. Wekî pêşiyan gotiye: (jin stûna malê ye). Bi tundî li hemberî nerîna çewt û ramana paşveçûyî, û serdestiya mêr di dermafê jinê de disekinî, û şerê wan gerdişên kevneperest dikir. Her giringiya rola jinê û rizgarbûn û pêşveçûna wê di civakê de pêwîst didît. Di jiyanê de, jin kok û bingeha dibistana pêşî ye, li ser wê bingehê civak tên avakirin. Kurdan berê gotiye: 'Kurmê şîrî heta pîrî'. Gelo, ew çi nifşên xwendevan û şagirtan e

ko ji dibistaneke bê bingeh û herifandî de bêne der!.

Rizgarkirina jinê, rizgarkirina civakê ye. Pêşiyan berê gotiye: Jin keleha mêran e. li pişt her mêrê gewre jinek gewre heye. Jin jiyan e, Ji dibistana jinê hemû mirovên zanyar, ronakbîr, bijîşk, parêzer, padîşah û fermandar perwerde bûne. Ji ber giringiya rola jinê di civakê de, û pêwîstiya hebûna wê di kar û xebata tevgerê de, Bavê Şiyar biryara derxistina rojnameyek bi navê (Jina Kurd) wergirtibû.

**Bavê Şiyar û rewşenbîrî:**

Bavê Şiyar ne tenê mirovekî xebatkar, konevan, welatparêz û rêber bû, belê mirovekî xwedî pênûseke bejinbilind û giranbuha bû. Pênivîsa wî ne erzan bû. Mirovekî nivîskar, zana, rewşenbîr û zanyar bû. Bi herdû zimanan, zimanê Kurdî û Erebî dinivisand, xweş mamoste û ronakbîr bû. Bi sedên gotar û lêkolînan nivîsandine. Mirovekî pir qedrê zimanê miletê xwe digirt. Lewra ew bû xwediyê biryara ko tu kes rûmeta endamtiyê di partiya wî de wernagire, ko bi zimanê dê nexwîne û nenivisîne.

Bavê Şiyar rola çapemeniyê di civaka gelên azadîxwaz de xweş haydar bû. lewra kovara 'Gelawêj'ê bi awayekî spehî û çapeke rengî weşand, û pişt re kovara 'Pirs' û 'ElHîwar'ê tên meydanê. Bi saya serê wî her sal bîranîna roja rojnamegeriya Kurdî dihate girêdan. Piştevanê pireya çalakî û şevbihêrkên toreya kurdî bû. Rêzgirtina wî ji hemû nivîskar, rojnamevan, rewşenbîr û hunermendan re hebû. Alîkarî û piştgiriya gelek nivîskaran di çapkirin û belavkirina berhemên wan de dikir. Bi destê xwe gelek rewşenbîr, welatparêz û hunermend xelatkirin. Digot: (Ew tevger û bizava ko qedrê rewşenbîrên xwe negire û xwedî li berhemên wan dernekeve, xebata wê seqet û kulek e, mîna dara bê ber e.).

E.Xanî dibêje: **"Da xelk nebêjitin ko ekrad**

**Bê mehrifet in bê esl û binyad".**

**Wefadariya Bavê Şiyar:**

Bavê Şiyar mirovekî pir wefadar bû. Bi tevger û lebata xwe li pêşiya demê bi lez û bez bû. Her li civata heval û dost û nasan bû, derbasî her malê dibû,  Bi xweşî û nexweşiyên wan re dijiya, ji wan re birayê mezin bû. Tu cudayî li nik wî

tunebû. çi xizan û dewlemend bin, çi biçûk û mezin bin, xwe di ser kesekî re nedidît. Pir nefsbiçûk bû. Em jibîr nekin wefadariya wî bi kuflet û mala wî re nîşana mêrê qenc û zilamê baş bû.

Ne tenê wefadariya wî bi malbat, dost, hogir û hevalên wî re bû, belê heta bi wan kesên ko ne wek wî diramiyan re jî. Ew hevalên ko li malên xwe rûdiniştin û dûrî refê kar diketin. qet ji serdan û çûna cem wan qutnedibû, û tucarî paşgotin û bêbextî li wan nedikir. Wekî helbestvan gotiye:

*"Yê ko dinê de gunehan nekir kiye bêje*

*Û yê gunehan nekir çawan jî bêje*

*Min xirabî kir ko te jî bi xirabî li min vegerand*

*Êdî nav bira min û te de çi ferq heye bêje".*

Rojekê gunehê kesekî hilnegirt. Dijîtiya kesekî nekir. Hevalê hevalê xwe bû. Mirovekî bi nan û xwê bû. Berî her kesî bi xwe re wefadar û dilsoz bû. Xwedî sinceke temîz û pir paqij bû. Teqez ne mirovekî normal bû.

Belê, tim û tim çekê bersiva wî mîna bersiva pêxember Zerdeşt bû: gotina xweş, ramana rast û karê baş bû.

**Bavê Şiyar kî bû?!**

Bêguman, di pîşe û karê xwe de mamosta bû. Ne tenê mamosteyê zanînê bû. Belê, ew mamosteyê konevaniyê jî bû. Mirovekî bihinfireh û bi dan û stendin bû. Rastgo û bi bawerî bû. Zimanxweş û kêmpeyv bû. Rûgeş û dêm girnijî bû. Bi saman û cemşen bû. Bi mebestê temîz bû. Guhdarekî baş bû. Ji dozê re parêzer û pasevan bû. Bi perwer û sincî bû. Bi torîn û paydar bû. Bi çakbîn û coşdar bû. "Hin bedbîn in, hinên din çakbîn in hinên dîtir rastbîn in, hinên dêtirîn dijîn, dimirin bêj ko tiştekî bibînîn". Pir nermîn û rewan bû. Bê paye, nefsbiçûk bû. Ne pergîr û kêsbaz bû. Ne qure û oflaz bû. Ne xawenê çenebaz bû. Dahêner û bîrgeş bû. Bi dîtin û nerîn bû. Bi pênûs û raman bû. Rewanbêj û zanyar bû. Bê hempa, bejinbilind bû. Bi narînî gewre bû. Bi tenahî û dilsoz bû. Ferzend û gorgîn bû.  Siwarê hespê sipî bû. Peyîkê bi peyam  bû. Pêşeng û  pêşewa bû. Bi dadmendî Enûşêrwan bû. Bi comerdî Hatimê kurd bû. Bi mêranî cihşînê Ristemê Zal bû.

## “Ne Dikin û Ne Dihêlin Em Bikin” ?!

Berî her tiştî, ez dixwazim bibêjim, ev gotara min ne lêkolîneke siyasî ye, belê hin gazin û ronîkirina rewşeke girêkûtkî ye. Wêneyek ji jîweriya me ye. Dibe ev gotar bi hin kesan tehl be. Lê em ji bîr nekin Kurda berê Gotiye:” rastî tim tehl e”. Ji mafê min e ez vê rastiyê bibêjim. Çîroka vê gotarê, serpêhatiya kalemêrekî ye. Ev kalemêrê ku di civaka xwe de hatiye jibîrkirin, bi saxî hatiye mirandin. Gelo gunehê kê ye û ji kê tê xwestin?!. Ez bawer im yên mîna wî di civaka me de pir in. Lê, ez bi xwe rastî vî kalemêrî hatime, û rewşa wî bandoreke pir mezin li min kiriye. Ew bû sedemê nivîsandina vê gotarê, ne tiştekî din. Vêca berî ez dest bi çîroka vî kalemêrê hêja bikim, ezê rewşa vê rastiya tehl ji we re bibêjim.

Em bawer in, di bin siya rejîmên setemkar û zordar de, jiyana mirovan ne azad û ne serbest e. Jiyana miletekî bindest û bê narvîn, wê di çarçewa qedexe û talan kirinê de bijî. Vêca, miletekî wekî miletê Kurd, di bin siya pênc rejîmên zorker de bindest û perçebûyî, ji mafê jiyanê bêpar e, weha reng e wê ziman, tore, çand û folklora wî jî qedexekirî be. Ez bawer im di bin

barê van dijwarî û girêkûtkan de, wê kesatiya wî (Şexsiyeta wî) gelî jî dibin bandora rewşenbîriya neteweya serdest de windayî be. Vêca, ji bo xweparastin û kêmkirina bandora rewşenbîriya serdest û pêşvebirina civaka xwe, berî her tiştî avakirina dezgeh, rêxistin û civatên civakî, rewşenbîrî û siyasî tên xwestin.

Di civaka her miletekî de, pêwîst e rêxistin û dezgeh bêne avakirin. Armanc ji sazkirin û çêkirina van rêxistin û dezgehan ev e; berî her tiştî, kesatiya (şexsiyeta) xwe –wek netewenas bikin û xwe bidin naskirin. Heger me xwe naskir, daxwaz û xwestekên me jî zelal dibin. Dost ji dijminan tê cidakirin. Kar û xebata tektîkî û istiratîcî jî tevlihev nabin, û mafê her miletekî li gorî rêzan û rêdanên diwelî tên zelal kirin.

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn Kurdan dest bi avakirina civat, komele û rêxiztinên rewşenbîrî, civakî û siyasî kirine. Evan dezgeh, civat û rêxisitanan, roleke pir mezin di geşkirina hestê neteweyî û hişyarkirina gelê Kurd de lîstin. Lê, li gorî mercên îroyîn, rewşa rêxistin û tevgerên me Kurdan û bi taybetî li nav Kurdên Binxetê çi ye?!.

Berî her tiştî Partî çi ye?! û ji bo çi têne avakirin?! Partî bi xwe wesîle ye, ne akam e. Ji komek mirovên bîrewer û zana di hizr û bîr û baweriyên xwe de mîna hev diramin, li hev dicivin û tozik û rêbazin ji kar û barê xwe re datînin, û kar ji bo pêkanîna armancên gelê xwe dixebitin. Armanca dawî û pêşî ji hebûna partî û rêxistinan di civaka Kurdî de ji bo pêkanîna mafê miletê Kurd e. Ji bo kurdayetiyê ye. Ji bo pêşxistina civaka Kurdî ye. Ji bo kar û xebatê ye, çi di warê siyasî û çi di warê rewşenbîriyê de be.

Gelo, Partiyên me çiqasî nêzîkî van merc û armanca ne?!.

Berî bersiva vê pirsê bidim, ez dixwazim bêjim: di 14-ê hezêrana sala 1957-an de, Partiya Demokrat a Kurdistanê li binxetê hat damezrandin. Armancên giring yên partiyê rizgarkirin û yekirina Kurdistanê bû. Tozik û rêzana wê bi zimanê Kurdî bû. Ji bo hînkirina zimanê Kurdî Elfebeya Kurdî ya Nivîskarê gewre Osman Sebrî çap û belav kirin. Berî her tiştî endamên xwe hînî nivîsandin û xwendina zimanê Kurdî dikirin. Hestê neteweyî di nav heval û dostên xwe de geş dikirin. Ji sekreter ta bigihê Endamên komikan di

nav gelê xwe de digeriyan û ew li ser rewşa civakî, ziman û siyasetê hişyar dikirin.

Em pir dûr neçin,û bersiva pirsa xwe jibîr nekin.

Aniha em di babilîska bîst û yekê de ne, ango ev bû çel û çar sal e ku di ser damezrandina Partiyê re derbas dibin, ez dibêjim hêjaye em vê pirsê ji xwe bikin û bersiva xwe bidin.

Ji partiyekê em îro xwediyê diwazde partiya ne. Em jibîr nekin berê Kurda gotiye: ”Malê ji te bi hezar mal be”?1. Di sala 1962-an de, serjimara awarte li parêzgeha Cizîrê çê bû û di encamê de, nasname ji du sed hezar kesên Kurd hate kişandin. Di sala 1973-an de, Erebên (Xemir) anîn Cizîrê û erdên Kurdan dan wan. Navê hemû gundên Kurdan bi navin Erebî guhertin. Ziman û rewşenbîriya Kurdî qedexe kirin. Li hemberî vê rewşê, erk û stûbarê tevgera Kurdî li binxetê çi ye?! Û çi jê tê xwestin!?.

Mexabin, rewşa tevgera Kurdî li Sûriyê dûrî van erk û stûbaran e. Ez nabêjim hemû Partî, û ne jî şerê hebûna wan dikim, lê belê pireya van Partiyan, reng e, mercê çêbûna xwe winda kirine. Tariyê xwe girtiye ser daxwaz û xwestekên wan. Di valayiyekê de diçin û tên. Ta bi vê rojê

daxwaz û xwestekên xwe li Sûriyê zelal nekirine û nakin, tenê çend simbolên girêkûtkî hatine hildan, bê ku ji gelê xwe re diyar û şirove bikin. Ne programekî hevgirtî ji bo pêşerojê, û ne ji bo rojevê jî diyar dikin. Mexabin, rojekê ev pirs: 'Ka em çi dikin?! Çi ji me tê xwestin?! Divê em çi bikin?! Nakokiyên me bi kêre ne?! Bi Kurdan re, yan bi rêjîmê re ne'?!. Ez bawer im nakokî û Kêferata bi dijmin re jibîr bûye. Ji bo şer û nakokiyên navxwe çêbûne. Hebûna xwe di nakokî, paşgotin û dijayetiyê de dibînin. Bê nakokî û dijayetî nikarin bijîn. Perwerdekirina endamên xwe jî li ser van sincan xwedî dikin; yê ne hevalê min be, dijminê min e. Gelo Partî ji bo vê yekê hatine avakirin?! xebatkarên mîna Dr. Nûredîn Zaza, Osman Sebrî,.. Partî ji bo vê xerabiyê avakiribûn?!. Na, tenê ji me tê xwestin em şerm bikin, û rûmeta wan xebatkaran bigirin. Rewşa tevgera me gihaye wê astê ku hejmara partiyên me ji hejmara tiliyên herdû destan pirtir bûye. Lê, hejmara Siyasetmedarên me ji hejmara partiyên me bi gelekî kêmtir e. Partîzanên me bûne dahol û zirne ji  wan kesên ko ji bo şexsê xwe dixebitin re. Ew kes miriyê şexsê xwe ne, ne miriyên Kurdayetî û serbestiyê ne. Partî bi xwe wesîleke ji bo tu pê bigihê akama xwe, mîna ko

tu li kerê siwar bibî û bi vê wesîlê bighê cihekî. Lê, heger ew ker li te siwarê, û ji dêvla wî tu bizirî û tîzka bidî…., ew malwêranî bixwe ye.

Gelo karên Partiyên Kurdan di rewşeke rast û dirust dene an na?!. Xebatê di ber armancên xwe de dikin an na?!. Ji rewşenbîriya Kurdî re çi kirine û çi divê bikin?. Birastî, ev pirsên han û gelekên dî di serê me de diçin û tên, û tev bê bersiv in, bi hewceyî şirovekirinê ne. Ez van pirsan li şûnê dihêlim û dadigerim ser mijara kalemêrê hêja û çîroka xwe û wî ji we re dibêjim.

Mijara me rewşa kalemêrekî helbestvan e. Ez bawer im zelalkirina çîroka wî wê bersiva gelek pirsan bide û wê gelek rewşan li ber çavan rax e û zelal bike.

Berî em dest bi çîroka kalemêrê helbestvan bikin, hêja ye em çîroka xwe û naskirina wî bibêjin: Di havîna sala hezar û neh sed û not û heftan de li bajarên Cizîrê min pirtûka (Şerefnameya Menzûm-Cegerxwîn) belav dikir.

Wek hûn dizanin, weşanxane û pertûkfiroşên me tune ne, ji neçarî nivîskarên me ne tenê berhemên xwe çap dikin, belê belav jî dikin. Ez jî yek ji wan nivîskarên ku berhemên xwe bi

nependî çap dikim û bi destê xwe jî belav dikim. Dixwazim hûn agahdar bin, neku me doz li partiyan nedikir an me xwe di ser wan re diqevast. Na, di belavkirina her pertûkekê de alakariya wan hatiye xwestin. Lê, tu partî rojekê bi vî karî ranebûne, û ne alîkariya rewşenbîran kirine. Ji neçarî bajar bi bajar, gund bi gund û mal bi mal digeriyam. Gelek caran min ji ber fedya ev gotin dida ber riwê xwe û digot "Bi rastî gera pertûkan ne karê nivîskaran e, lê mexabin em ketine şûna ‘Etaran. Bûye namûs û ketiye stiwê me". Hin kesan ji me re dikir kêmanî, û hin kesan rewşa me dida ber çavan. Lê, tiştê pir xerab hin partî di ser re jî şerê me dikirin û ji hevalên xwe dixwestin ku pirtûkên me ji dest me negrin. Kesên ji destên me jî digirtin, ji ber fedî û nasînê bû. Li vir pirsek xwe bera holê dide. Çima Partiyan şerê me dikirin?! Di baweriya min de berî her tiştî me ew li ber erk û stûbarê wan datanî. Em wek wan nediramiyan û ne jî hevalên wan bûn. Kêmasî û şaşiyên wan ber bi çav dibûn. Gunehê wan dihat diyar kirin. Qelsî û nekirina wan ji ziman û rewşenbîriya Kurdî re xuya dibû. Sed heyf û mexabin ku gotina wan ev bû: “Heger pirtûka te bi zimanê Erebî baya menê ji destê te bigirtana. Lê em bi

zimanê Kurdî nizanin bixwînin”. Vêca, bi gera me re me pir şevbiwêrkên rewşenbîrî jî digerandin.

Li Cizîrê, li (Girkê Legê), li mala (B.Goran) şevêrka me geriya ye, şev li me zîz bû ye, em ketine rewşa rewşenbîriyê. Me carnan xwe davêt çala ramyariyê jî, li wir me hin bi serdixist û me hinên dî binçal dikirin.

Birayê me (B.Goran) hinek gazin kir û ji min xwest ku em sibehê bi derketina rojê re berê xwe bidin kalemêrekî helbestan bi zimanê Kurdî dinivîse, û çend berhemên wî hene, pêwîst e bêne çapkirin, lê mexabin, tu kes ji Partiyan guhdariyê lê nakin, û xwedî lê dernakevin. Giring e em wî bibînin û alîkariya wî bikin. Birastî ez pir bi vê pêşniyara hevalê xwe kêfxweş bûm.

Di roja dî de, bi derketina rojê re, em birêketin, me berî da mala kalemêr. Em gihan gundekî mezin, xelkên wî tev Ereb bûn. Li wir, ez pir tirsiyam min got dibe me rê şaş kiribe, em derbasî sînorên Iraqê nav gundên Erebên Şemeran û Cibûran bûbin. Min ji xwe pirsî: Ma gelo ev gundê mezin tev ji Erebên biyanî ji ku ve hatine welatê Kurdan?! Me gundên ku ji Ereban

re hatine avakirin dîtine, lê ne bi vê susretê. Sawêran ez birim û anîm, û li ber pêlan ketim. Xirecira şeva çûyî, perçebûn û jihevketina partiyan, nakokî û berberiya di nav bera wan de, ji bêxwedîtî û bêsermiyaniya me, roj bi roj, em têne şilaftin û şûzkirin. Pêxwasan erdên me talan kirin. Zimanê me qedexe kirin. Navên gundên me guhertin. Ka rola Partiyan çi ye?!. Rêber û siyasetmedarên me çi dikin ?! Ev çi qurequra beqa ye......hoho..hoho...??!!...

Serê min giran bû, li ber çavên min reş hat, tevzînokin hatin laşê min, û ez gêj bûm. Min xwest xwîsiya xwe daqurtînim, lê zimanê min di devê min de zuha bibû û bi ezmandevê min re pûç bibû û xwîsiya min ne diçû xwarê.

Em pir serê hev ne êşînin û devên birînên hev bi giwîzanan telaş nekin, û pir ji hev re dirêj û pehin nekin, û çîroka kalemêrê xwe jî ji bîr nekin. Li ser dengê (B.Goran) ez veciniqîm û li xwe hay bûm bê ez ketime çi rewşê, tayekê ez dibirim û yekê ez tanîm. Ji min re got: "Çi bi serê te hat?. Diyar e tu pir westiya yî, va em gihane gund, ev mala kalemêr e". Lê min li xwe dernexist û em derbasî hundirê malê bûn. Kalemêrekî kejîsor, bi cilin gewr, û bi bejneke

orte hate pêşiya me. Bi kurdmanciyeke zelal û xweş silava me vegerand. Piştî silav û bixêrhatinê, me sedema hatina xwe jê re diyar kir. Kalemêrê me dest bi giliyên xwe kir. Me jî barê wî li ser barê xwe danî, û me xwe da ber çapkirina dîwana wî. Kalemêrê hêja bi dilşadî xwe sparte destê me. Bi vî karî, me barekî giran da milê xwe, lê, ji bo rewşenbîriya Kurdî merov çiqas kar û xebatê û bargiraniyê bibîne gerek merov dilşad be. Armanca min xebata rewşenbîriya Kurdî û arîkariya vî kalemêrê hêja bû. Lê mexabin, Beko ‘ewan bûne sedemê neçapkirina vî berhemê hêja, û ez ji vê xebata hêja bêpar kirim.

Birastî, naskirina vî kalemêrî ji bîra min naçe. kalemêrê hêja bi dilekî geş û zimanekî rewan ji me re dest bi xwendina çend helbestên xwe kir û çîroka jiyana xwe diyar kir.

Çîroka kalemêrê me pir dirêj e. Em nizanin gelo ji meşextbûna bav û kalên wî de an ji bêkesîtî û ne guhdana Partiyan jê re dest pê bikin. Lê, emê her tiştekî bi demê ve girêdin û ji vê pirtir hew bibêjim. Lê, bawer im wê dem ji qurequra beqan re nemîne. Kurdan gotiye:”Tişt xweş e di çaxê xwe de”.

Di baweriya me de Kalemêrê hêja yek ji gencîneyên devgirtî ye. De werin em bi hev re lê guhdarî bin. Kalemêrê zana û helbestvan bi van çend xêzan xwe dide nasîn:

"Navê min Nûredîn kurê Muhyedîn kurê mele Eliyê şêx Ebduleyê Ebdilmecîd e. Ez ji selaleta şêx Ehmedê Xanî me. Di bin navê Xemgînê Xanî de helbestên xwe dinivisînim. Ez li ber destê şêx Salihê şêx Ebdilhadî yê seyid Şêxmûs hînî Quranê bûme. Di sala (1904)-an de li gundê Bêrxo, qeza Wanê hatime dinê. Di şerê cîhanê sala 1914-an de, em hatine Cezîra Botan, û ji wir me berê xwe daye binya xetê gundê (Dêrûna Qulinga). Li vê dawiyê hatime gundê (Hemû Qûm). Aniha jî ez melê gundê ('Er'ûr) im.

Ez bi zimanê Tirkî, Erebî û Kurdî dizanim. Min dîwanek ji 225 helbestan nivisandiye û min pirtûka şêxê Sen'anî (texmîs) pênc rêz kiriye".

Vêca "Dîwaro ji te re dibêjim, bûkê tu bibihîz". Lawo "Ne dikin û ne dihêlin em bikin". Xwedê arîkarê me be!!

Şam / 9/ 2001

## Şêweyên Namo û Ne Naskirî

## Di Silav û Nîşankirina Bi Dest û Tiliyan

Silavkirina bi destan bûye riya pate û silavê di nav hemû gel û miletan de. Ji welatekî ta bi welatekî din û ji miletekî ta bi miletekî din ve, ne tenê cidayî û newekhevî heye, belê gelek caran jî dibin cihê sergêjî û dilmayînê.

Xelkê bakurî Ewropa û Emerîkayê, dema pêrgî hevûdû dibin, li çavê hev dinêrin û bi xurtî destê hev digrin û diguvêşin. Nemaze xelkên wîlayeta (Tiksas)ê ya Emerîkî. Lê li nik xelkê Yabanê û Kûriyayê, di silavkirinê de, nerîna li çavan; (bêtoreyî ye). Emerîkî ne tenê bi xurtî destê hev digrin û digivêşin, belê bi herdû destan jî silavê li hev dikin, destekî pê silavê dikin û yê din jî dispêrin yê dî û li ser hev digivêşin. Ev silava germ, nîşana nêzîkbûn û razîbûnê ye.

Li nik ramyariyan (siyasetvanan) bi (silava ramyariyê) tê naskirin. Lê tiştê xweş ev e, her ku Ferensiz pêrgî hev tên silavê li hev dikin. Heger silavkirina bi destê çepê nebû, dikarin silavê bi destê rastê an bi enîşkê bikin !.

Di nav miletan de, ne tenê silavlêkirina bi dest riya silavdan û xêrhatin û xatirxwestinê ye, li welatê Hind û Taylandê, riwê herdû destên xwe didin hev û dispêrin sînga xwe û pêre bejna xwe ji hev re ditewînin. Lê, li nik (Melîzyan) destê xwe dirêjî destê hev dikin û tenê serê tiliyên hevûdû digrin û vedikşînin sînga xwe. Li nav hin hozên Ereban silavkirina wan girtina dest û maçîkirina serê difin (poz) e. li nik hin hozên din, dema pêrgî hevûdû tên, çi jin û çi mêr, diçin riwên hev û hevûdû himbêz dikin. Li nav Kurdan, pêvî silavkirina bi dest hin caran piyên hev diramîsin.(Bi taybetî dema tu pêrgî mirovekî mezin an rîsipiyekî tê). Li başûrî Efrîqiyayê, û li nik hin hozên wan destê xwe li destê hev dixin û tiliyên hevûdû digirin. Lê, li nik hin hozên dî, tif li ber lingê hev dikin. Li welatê (Iskîmo)yê, zimanê xwe ji hev re derdixin û silavkirina bixêrhatinê ne wek ya xatirxwestinê ye. Pir cidayî di navbera herdiwan de heye, û gelek caran nîşankirin û silavkirin bi rengekî şaşî têye hevotin û lê varqilkirin.

Li welatê Îtaliya û Yûnanê mirov piyê xwe berbijêr ditewîn e û dide pêş û destê xwe li pêşiya hev çend caran digire û vedike... Lê heger

mirovê xatirxwestiyekî Emrîkî be, wê gavê ew xwe paş de vedikşîne, ji ber ku ev nîşan nîşana (were vir) e. Lê heger yê Emrîkî bi destê xwe ji xelkên bakurî Ewropa an ji Emerîka Latînî xatirxwestî be, wê çaxê mêvanê wî li ber gotina (na)... dikeve, ji ber ku Emerîkî herdû piyên xwe li hemberî mêvanê xwe hildidin û destê xwe ber bi rast û çepê dihejînin. Hemû Ewropiyên başûr tenê destê hildayî ber bi jêr û jor ve tê hejandin.

Di salên şêstî de, hin nîşanên nû diyar bûn. Mîna destgirtina hildayî ya ku nîşana (hêza reş) dide xuya kirin...Hê jî li pireya deverên cîhanê bi vê angoyê têye diyarkirin. Lê, ev destgirtina hildayî heger berê destgirtinê li hemberî mirovî bixwe be ne li hemberî xelkê din be, bi angoya berberî û qarîşê tê liberxistin.

Nîşana bê axaftin ne tenê li nav mezinan heye, belê hemû zarokên cîhanê çaxê herdû destên xwe dixin guhên xwe û tiliyên destên xwe li pêş dihejînin ev nîşana (Tu bê hişî) diyar dike!.. Lê, tiştê herî xweş ev e, di nîşankirina poz û guhan de, li nik Hindiyan girtina guh (lêbûrînê) dixwaze... û girtina bezê guh li nik Berazîlan (xêrxwaziyê) dixwaze..., û çaxê yê Berazîlî pir neçar dimîne û hêviya xêrxwaziyê dike, destê

çepê dirêjî serê xwe dike û bezê guhê xwe yê rastê bi destê çepê an vajî hev digire!. Lê, gava yê Ingilîzî dixwaze ji hinekan re bibêje: (Ev raz (sir), bila di nav me de bimîne), tiliya mezin (beranê) li serê pozê xwe dixe. Lê, heger yê li hemberî wî Îtalî be angoya vê nîşanê: (hayê te ji te hebe), dide xuyakirin. Çaxê ku ew mirov ji elfabeya nîşankirinê fêrkirî be. Jê tê xwestin ku zû hayê xwe ji derdora xwe bike. Lê, tiştê xuya ne lê varqilî û ne liberketina nîşankirinê dibe ku pir caran tevlihevî û nexweşiyan bixwe re bîne.

Tiştê herî namo û nenaskirî ne hevotin û ne wekheviya wan nîşana ye. Di xatirxwestinê de, çîroka herî xweş çîroka şandeya Siwêdî (Lîf Olman) ya sazûmana (Yonîsîv)ê ye. Dema diçe serdana bajarê Bengiladêşê... riya xwe bi pîrejinekê dixe. Di vegerê de, xatir jê dixwaze û wê himbêz dike. Lê, (Lîf Olman)ê lê hay dibe ku pîrejinê pir jê sil û nexweş bû... dipirse sedemê vê dilgiranî û nexweşiyê çiye?.. -di riya wergêr re- pîrejinê lê vedigerîne: Li welatê me xatirxwestin, maç kirina herdû lingan e. Wê gavê (Lîf Olman)ê xwe ditewîne û herdû lingên wê maç dike, û pîrejin jî bi germî wê himbêz dike.

Li Yabanê, mirovek Emerîkî diçe serdana malek Yûnanî. Ji ber ku herdiwan bi zimanê hevûdû nizanîbûn, bi nîşankirina tiliyan bi hev re dipeyivîn. Mirovê Emerîkî her ku tiliya xwe ber bi xwe ve vedikir (ez).., xelkê malê jî berê tiliya xwe ber bi cihê destavê (xaricê) vedikirin. Her ew nîşankirin dûbare dibû ewî ew bersiv werdigirt. Di dawiyê de mêvanê malê têgihişt ku nîşankirina tiliyê (ez).. li nik Yûnaniyan angoya: (ez dixwazim herim destavê) ye.

Nîşankirina bi tiliyan gelek caran sînorê têgihiştinê derbas dike û sergêjî û aloziyan çêdike. Di vî warî de bûyerek pir xweş tê bîra min.

Dema Rîtşard Nîkson cîgirê serok Izinhawer bû, diçe serdana dewletên Emerîka Latînî. Li wir, gotinekê li hember milet dixwîne. Piştî ku gotina xwe bi dawî tîne, bi tiliya mezin giroverek çêkir.. Milet tev zehî û matmayî man. Gelek pê êşiyan. Wêneya wî di hemû kovar û rojnameyên roja dî de belavkirin û ew şermezar kirin. Dipirsîn çima Nîkson miletê Emerîka Latînî şermezar dike?!. Diyar e, ev nîşankirin li nik wan angoya: (Herin dojehê) ye. Lê, li nik Emerîkanan nîşana (erê), (her tişt baş e) dide diyarkirin. Ev nîşan bi xwe li

nik Elmaniyan jî (Pîskirin-Îhane) ye nîşana (bê hişiyê) ye... li nik Ferensizan- bi taybetî xelkên Başûr- nîşana (xal=sifir), an (ne tiştek) e. Lê, li nik Yabaniyan, ev nîşana (pera) ye.

-------------------------------------------------------------------

*Di rojnameya Mîdiya-Erbîl-Hejmar:67,sal:2000î de hatiye belavkirin.

# Wêje Vejandin e!!

Wêje, mîna hemû heyîn û hebûnên mirovatiyê ye. Teqez afrîna mirov e. Azîn û rêzaniya xwe ji kûrahiya jiyanê werdigre, û hunerên wêjeyê haydar in bi can û bi rewan in. Li tevna sawêr, hest, sewdan û ramanên mirov ve divarqilin û lê dihingivin. Çi karê wêjeyê be, bi nivîsîna gotinê dest pê dibe, û xêzik û rêzikan jiber dike. Karê wêjeyê hunermandan hînî afrîn û afrandinê dike; bê çawa ji karê xwe hunereke bêhempa û ferzende bihûne… wêje razek ji razên qeşengî û sipehîbûna hunermendê xwedî berhem e.

Di dema Kevin de, wêjeya devkî bi berê xwe ye fireh di bîr, hizr û ramanên mirovan de cih digirt, û tenê bi helbest û nûçeyan dihat naskirin û ji nifşekî digihişt nifşekî din. Ew wêje, afrandêrê wê ne naskirî bû. lewra jê re dibêjin wêjeya gelerî. Ez bawer im ji ber nenivîsandin û netomarkirina zargotin û kelepora kurdî pareke mezin jê winda bû. Nemaze ji ber civaka kurdî ne civakeke rûniştî bû; penaberî, bêdewletî û şer û cengên li ser xaka kurdistanê ne aramiyek di

civaka kurdî de peyda kir. Di roja îroyîn de, nerîn ji wêjeyê hate guhetin. Nameya wêjeyê jî hate guhertin. Bi saya ronakbîran û peydakirina alavên ragihandin û çapemeniyê, bi xurtî di gasîna cîhana nivîskî û tomarkirinê de tirs ji windabûn û berzebûnê nema. **Edebiyata kurdî ya nûjen, bêtir xwe di roman, çîrok, helbesta serbest, şanoyên ku van salên dawîn hatine nivîsîn de, dide nasîn.** Pêwîstiya wêjeya kurdî bi nûjeniyê heye, wekî dara ku ji salan nehatibe avdan û dûrî ji xakxweşkirin û kesaxê ma be.

Berî hertişî pêwîstî bi ûştê zimanê nivîsînê heye. Eger ev ûştê sereke peydabû wêgavê, bi wî zimanî wê bikaribe ahîn û kulên xwe, ahing û fîxanên hundirê xwe û kovan û derdên xwe pê bîne ziman, hingê ew hunermend, nivîskar û wêjevan dikare hunera nivîskariya xwe ji xwendevanên xwe re diyar bike.

Bêdiro! wê gavê dîtin û nerînên nivîskar, rol û bandûra wî li civakê diyar dibe. Çiqas ew nivîskar xwedî rol û bandûr be, ewqasî berpirsiyariya wî di civakê de mezin e. Yûnanî ne bi navê fermandar û serokên cemhûriyatên

xwe hatine, belê bi navên nivîskar, dîroknivîs, helbestvan û zanyarên xwe hatine naskirin. Eger ne ji Homîros, Hîrodot, Fîdyas û Efladon baye qet Yûnaniyan nikarîbûn zora Firensizan bibirana, û bibûna serdestên derya Sipî. Rol û bandûra wêjeyê ji çekan dijwartir e.

Divê çekê wêjevan peyva rastgo, ramana azad, gotina xweşik û spehî be, ya ko bi wê şêwe, naverok, nerîn û dîtinên xwe ava dike, û bi zelalî û rexnegirî wan bigihîne rewanê xwendevanan. Wêje, zanîn û nasîn e, şaxek ji şaxên gulistana huneran e. Ziman gotinan ava dike û gotin wêjeyê çê dike û wêje civakeke hemdemî ava dike. Ne civaka li derdora me, belê civaka di hundirê mirov de. Ziman nasnama gelan e. Eger ûştê ziman winda bibe, ew wêje nasnama xwe winda dike. Nemûne gelek kesên navdar ku Kurd in, bi Kurdî nenivîsandine; berhemên xwe jî bi piranî Erebî, Farisî û Tirkî afirandine. Wekî mînak; Ebûl Feda, Ibn'ul Esîr û Ibn Xelîkan bi Erebî; Şeref-Xan û Mewlana Xalid bi Farisî û yên wekî Nefî û Nabî jî bi Tirkî nivîsandine. Iro jî gelek Kurdên navdar hene ku bi Tirkî, Erebî an jî bi Farisî dinivîsînin. Li

giringî û buhayê zimanê dayikê haydar nabin, an xwe di ser zimanê dayika xwe re dibînin. Lê herdû dîtin jî dibin baskê tajiyê ji xelkê re here nêçîrê dide xuya kirin.

Teqez ziman wêjeyê dike huner mîna deng û awazan mûsîqê çêdike û dike huner, weharenge reng hunera wêne û tabloyan çêdike. Bêguman wêje yek ji hunerên qeşengiyê ye.

Dîroka wêjeyê bi dîroka zanîn û têgihiştina mirov ve girêdayî ye. Pêşketina miletan bi pêşveçûna wêjeya wan ve girêdayî ye. Milet bi wêjeya xwe, ne bi serokên dewletên xwe têne naskirin. Bêdiro!, wêje çekek ji bo guhertina civakan û çêkirina mirovan e. Heger wêje ne ji bo çaksaziya gelan û nirxandina nexweşiyên civakê be, di warê neteweyî, niştimanî, sinçî, gerdişî û hişmendiya wê de, ew ne wêje ye û ne serbest û ne azad e. Wêje vejandin e. Gelo kanî ew wêjeya ku me vejîne, wekî ku Qurana pîroz Ereb vejandin û Homîros Yewnanî vejendin.!!

# Kelepûr, Nasnama Gelan e!!

Ji her netewe û gelî bêtir, Kurdan bawerî bi gotina devkî anîne, û bi toreya devkî, û kelepûr û zargotinê ve girêdayî mane. Em dikarin bibêjin, pêmaya wêjeya Kurdî ji kelepûr û wêjeya devkî û gelêrî hevedûdanî ye. Toreya devkî awayê vegotina çandeyî ya gel e... Bêguman, afrandêrê kelepûrê gel e; bi alîkariya gotina devkî, bûyerên dîrokê, serpêhatî, çîrok, çirçîrok, stran û govend, pend û gotinên pêşiyan, lîstik û gerdiş, pîşe û berhaweyên kurdî vediguhêzin nifşên nû û diparêzin. Bûyer bi bûyer, tevgerên nuh û nûjen jî tên vegotin û li hev têne hevotin, û mîna çavkaniyan dizên û diherikin, û dem bi dem li hev divarqilin û belav dibin.

Mezinahiya her gelî ji dewlemendiya kelepûra wî tê diyarkirin. Kurd miletekî xwedî kelepûreke dewlemend û bêhempa ye. Ew ne tenê xwedî şaristaniyeke kevin û dewlemend e, belê bi roleke mezin di avakirina gelek şaristaniyan de jî rabûye. Kultûra kurdî gencîneyeke pir dewlemend e, gulistaneke pir rengîn e. Bi dîroka hebûna mirovê kurd ve girêdayî ye. Bi xweberiya

welatê wî kurdistanê ve girêdayî ye. Cihê gelek efsane, perî û dêwan e.. cihê qehremanî, lehengî û Kawayê hesenker e. Welatê Memê Alan û Zîna Zêdan e.. Şûnwarê Idrîs û Şerefxanê Bedlîsî ye. Mêrgeha pezkoviyê Siyamendê Xecê ye. Warê Efno û Hejale ye. Mezra Mihemedê mîrê Botan e. Wargehê Mihemedê Emê û Kewa Dumilî ye. Kela Dumdum û Herekol e.... Welatê Hemdîn û Şemdîn e.. gasîna Beko û Tacdîn e.. Li riwekî xinizî, kêsbazî, pirgîrî û sîxurî ye. Li riwê din mêranî, qehremanî, dilsozî û dilpaqijiya gelê kurd e. Ciwanî û xweşiya xweristiya welatê me kurdistanê mîna tabloyekê bi çiya û efraz, dar û devî, deşt û newal, çem û kanî, pir rengîn û xemilandî ye. Weharenge, bi xelkê xwe bi danûstendin, gerdiş, rabûnûrûniştina xwe pir zelal e, bi wijdan û mêr e, bi bawerî û bi sinçî ye. Tucarî xiniziyê bi dijminê xwe re nake. Hevalê hevalê xwe ye. Merd e, ji kar hez dike. Wekî hatiye gotin: Şer ji betalî çêtir e. Şervanekî bi navûdeng e. Xwediyê efsane û siwarê dêwê sor e. Xwediyê kultûr, kelepûr û folklorekî pir bi pend, metelok, pêkenok, mamik, pêderxistinok, çîrok, çîvanok, çirçîrok, serpêhatî, lîstok,

cilûberg, stran û awaz, gerdiş, serhawe û berhaweyên xwe dewlemend e.

Kelepûr, toreya devkî û zargotin mîna çavkaniya şîrê dê ye. Lawên vê diyê, çi torevan û dîrokzan, çi ronakbîr û zimanzanên ko hene, tevan ji vê çavkaniyê vexwarine, di hiş û raman, bîr û baweriyên xwe de, di aşê yek zimanî de, meyandine. Meyandina zargotin, kelepûr û toreya devkî, afirandina berhemên nûjen e.

Di dema berê de, dîwanên mîr, axa û began hebûn. Di dîwanxanên mîr, beg û axan de, dengbêj û stranbêj şevbuhêrk û civat digerandin. Gelek serpêhatî, bûyer, çîrok, çirçîrok û efsane dihatin gotin. Li ber dengê wan dengbêj û çîrokbêjan gelek serî û hest dihejiyan û kêfxweş dibûn.. Gelek guhdarên civatê zehî û matmayî diman.. Gelek kes guhbel û çavziq dibûn... tevan bi hizir û mejiyê xwe, bi hest û dilbijokiya xwe, bi tevna hûnandina wê serpêhatiyê ve dihatin girêdan. Ewî dengbêjî/çîrokbêjî bandûreke mezin li guhdarên xwe dikirin, û gelek caran bi rojan çîrok û serpêhatiyên xwe bi dawî nedikirin. Girêdaneke nepenî di navbera pirsur û pirsuriyê

de hebû. Bêdudilî, em dikarin bêjin: kelepûr û kultûra miletekî nivişka raman û hizra wî miletî ya salan e. Qûnax, çerx û demên ku tê re derbas bûye, dîroka wî gelî bixwe ye. Gencîne û ferhenga zar û zimanê gel e.

Ewan mirovan, roleke mezin di parastina zargotina Kurdî de lîstin. Bi gera çerxa demê re, ji jîweriya nifşê her demekê re tiştek veguhestiye û gihandiye nifşê dema din, ta ko şilîta dîroka wê gihaye dema me. Di roja îro de, rewşa civakê nema mîna berê, tu dîwanxane nemane. Çîrokbêj, dengbêj û stranbêjên me jî, roj bi roj, destê cansitîn mîna dasê, wan ji jiyanê hildiqetîne. Mixabin, şûna wan gernasan vala dimîne, bi mirina her kalemêrekî re, gencîneyek ji zargotin û kelepûra Kurdî winda dibe. Windabûna zargotin, û kelepûr û toreya devkî, windabûna hîm û bingehê rewşenbîriya kurdî ye. Vêca, binema parastin û çareserkirina vê rewşê, komkirin û danheva kelepûr, toreya devkî û zargotina me ye. Parastina kelepûr û zargotina me, parastina dîrok, çande û zimanê me ye.

## Çirîska Dawîn

## Ji Agirê Sînema Amûdê Vemirî..!!

**Bi boneya pênciyemîn salvegera şewata sînema Amûdê.**

Dem: Roja yekşemê 13/11/1960-î li bajarê Amûdê- parêzgeha Hisiça.

Ev roj, rojeke dîrokî û bi nav û deng e. Ev roj, roja şewata Sînema Amûdê ye. Roja şewata 300 zarokên bê guneh e. Roja ko 300 nav ji dara jiyanê hatin weşandin û di goristana Amûdê de, li rex girê Şermola hatin veşartin.

Ev roj, roja ko hemû dergehên asîmanan hatin vekirin, tenê dergehê Sînemê li wan zarokên bêguneh hat girtin û kilîtkirin. Dergeh hate girtin û kilît di bêrîka xwedayê zemînê de bû. Di bêrîka qiral û fermandaran de bû. Xwedayên zemînê û asîmanan civîn gerandin.., li hev pirsîn..di guhê gurê Manco de xwendin.. û biryar dan.. . Vê carê gurê Manco ne tenê zarok tirsand.. ne tenê hate xewna wan.. Belê, bi rengê êgir li wan diyar bû.. û ew cih li zarokan kir dojeh û Amûdê bû tenûra êgir. Qêrîn û hawara zarokan li ber sira bayê êgir ket û çû, çû.. bû dûman û bi jor ket. Bû pêt û

rivîn û li ba ket. Bû xwelî û di çemê Amûdê re herikî. Zarok şewitîn.., dilê diyan peritî.., kezeba bavan şewitî. Xuh û biran.., xal û apan şîn gerandin.. Şîn û girî li her mal û deverê geriya!!!.

Lê, fincana qehwê li ber xwedayê zemînê ye, û bi berdana dûmana çixarê di herdû qulên poz û devê xwe re dida der, û hilma şewata laşan li pozê wî dida û pê re  pê re digirnijî, serî dihejand û serxweş dibû..!! Belê dayê.. dikeniya.. dengê kenê wî bû babîsok û digeriya.. bû icacok û li hev digeriya.. bû kirasekî reş û li bejna Amûdê aliya… Li bajêr bû qêrîn û hawar.. li ezmanan bû şer. Şerê Homan û Ehrîmanan.. li hev dan. Şeytan û perî bi hev ketin. Periyan agir vedimirand.., şeytan û iblîsan bi baskên xwe agir gûr dikir. Şeytanên erd û ezmanan li hev pirsîn… û li wan zarokên bê guneh bûn yek..!! Dêwên sor û reş bi poşan çûne hev… Ehrîman û hirmiz hev talan kirin. Bi narevînê em haş kirin…!!!! Bi nezanînê em gunehkar kirin…!! Tiştê bû, bû û çû.. Em ketin xewê.. em ketin temara mirinê…bê pirs û bersiv..!! Ka çibû…!!?. Çewa bû..!!??. Kê weha kir..?! Gunehê kê bû?!!.. Ka rêber û xwediyên vî miletî?!.. . Ka axa, şêx û..?!. Kanîn

ew qehreman..?!. Hertişt hate jibîrkirin!!. Homan û iblîs li hev hatin…!!..

Erê dayê.. ez qurban.. Te çikir..!?. Pêşiyan gotiye: (Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e)!!. Tu jinek bû.. lê ne wek her jinan!!.. te şer bi êgir, bi şeytan û iblîsan re kir. Te çend caran xwe avête nava pencên êgir..?! Te çand caran bi qeflan zarok ji nava êgir rizgar kirin..?!! Ez qurban.. Te karibû bi dehên zarokên bêguneh ji agirê sînemê riha kir ba, lê te nikaribû birayê min Ehmedê Îsmaîlê Emê ji wê dojehê riha kiriba.. Te digot: Lawo!.. ev tev zarokên me kurda ne.. ev tev berxên ber kêrê ne.. Li me ferman e.. Li me bêkesa hawar e.. hawar e..

Rast e dayê, ev tev zarokên me Kurda ne.. bi destê şeytan û iblîsên erd û ezmanan hatin şewtandin.. Li me ferman e.. zarokên bêguneh şewitandin, teyr û tulûrên buhiştê tev fetisandin, û bi xwendina lavija şeytanî re gihan armanca xwe. Lê me çikir ??!!... Em bi xwendina Sûreta Yasînê ve daketin.. Em bi gotegot û çiqeçiqa ber bayê aşê vala ketin.!! Em bi êşa 'mirîşk ji hêkê ye, yan hêk ji mirîşkê ye' ketin!! Ka rêber û serok, ka axa û maqûlên kurdan?!. Ka rewşenbîr û nivîskarên leheng û şêr?!.. Ka Kurdên …,..,…

Ne tenê wisa bû, belê dayê.. Lê, lawên Te wa Tu jibîr kirin. Dayîka pakrewanan.. erê Tu jibîr kirin.. Tenê wêneya te wek wêneyek bê can û rewan tê belavkirin. Ez bawer im tukesî nepirsiye.. ew wêneya kê ye?! Û xwediyê vê wêneyê kiye.. û navê wê çiye?! û çi kiriye?!..

Dayêêê…ji neçarî ezê hinek gazinan bikim. Di vê civata daholvanan  de, tenê navûdeng ji mêran re ye. Tenê salixdan û pesindan ji axa û maltêran re ye..!!. Bila dilê te bi halê te neşewite . Ez dizanim  nivîskar û rewşenbîran keda te nanîne ziman û Tu jibîr kirin..!!.. Ez dizanim hin bûn leheng û hin jî binpê kirin. Erê dayê, karê me Kurdan ev e.. Em dikarin dawetekê bê dahol û zirne lidar bixin. Em dikarin li dahol û zirna xelkê jî xin. Lê, dayê tu hatî jibîrkirin..!! Ne ji bo tutiştî, tenê ji ber ko tu jin bû. Tu ji malbateke xizan /feqîr/ û welatparêz bû. Lê sed aferîn ji wan rojnamevanên biyanî /Rojnama Elmûsewir-ya Mesrî/ re ko berî lawên te keda te anîn ziman û rastiya te ji xelkên te re diyar kirin. Lê dayê ew ne Kurd bûn!! Lê, ka Kurdan çi kir!!?..

Mexabin, di dema îro de, daholvan û zirnevanên me pirtir bûne bê ko rastiyê vekolin û lê bipirsin û wek bûyî.. wek heyî.. bibêjin û mafê

her kesî li gorî keda wî bînin zimên. Lê ez bawer im wê dîroka gelê te qet wê mêranî û lehengiya te jibîr neke. Wê li sedem û ûşt û gunehkarên wê qetilamê bipirse.. Wê xwedî li pakrewan û diya pakrewanan derkeve.

Di roja îro de, lawên te yên birûmet xwedî li dîroka xwe derdikevin. Belê, tu nema tê jibîrkirin.. Ez bawer im wê navê te li serê sernameya pirtûka dîrokê bi tîpên zêrîn bêye nivîsandin.

Erê…Erê…dayê, rast e birayê min Muhemd ji wê dojehê riha bû.. û laşê wî yê şewitî.. bi dem û rojê re.. ji wê şewatê rehet bû.. lê, ji pêt û agirê şewata ahing û derûna hundirê xwe riha nebû. Rabûn û rûniştina wî.. tevger û jiyana wî tev kul û derd û birîn bûn. Tirsa agirê sînemê û sawa iblîs û şeytanan xwe bera hundirê wî dabûn… Şewata birayê wî Ehmed ji ber çavên wî nediçû. Ev agirê sînemê her û her pê re ma, û xwe ji hizir û dil û hişê wî bernedida. Ew agirê di hundirê wî de, roj bi roj, mezin û gûrtir dibû. Bi dengê qêrîn û hawara zarokan re har û dîn dibû..

Tew kula mezin bavê min bû. Bavê min.. kuldar û xemxurê wî bû.. Ne bijîşk û ne hekîm

man.. ne derman û ocax man… qet tutişt bi lawê wî yê nesax kêr nekir. Bavê min bi wê kulê mir. Erê dayê.. Kula me bi kul be û di canê dijminan de der be, ew kul bi te re jî çû gorê... lê, diyar e we soz bi hev re dabû… Birayê min Muhemed jî pir dirêj nekir.. bê ko xatir ji min bixwaze, ewî jî ji vê jînê barkir…Tu bawer bike dayê, xatir nexwest û barkir…koçkir û ez bi tenê hiştim. Erê, ez bi tenê hiştim….

Ez tenê dizanim, bi çûna wî re.. bi mirina wî re.. bi mirina vî pakrewanî re.. di can û hişê wî de çirîska dawî ji agirê sînemê vemirî.

# Helbestên ku diyarî min bûne

## Ji Dilawerê ZENGÎ re

Li Şamê qebqeba kew tê

Li min da şewşen û şew tê

Hilavêtim nema xew tê

Ji rengê Dicle rûbar im

Hejandim nameya ZENGÎ
Ji xew rabûm bi wî dengî

Bi kêf û rewş û ahengî

Ji mihla wî evîndar im

Ji mihrê pertewek da min

Li min nûkir evîna min

Du mestanê bi yek cam in

Belav û sewsî û tar im

Kevanê Xan-Şeref da mil

Li min nêrî bi çavê kil

Perî kêşane cerg û dil

Bi sê tîran birîndar im

Li meydanê DILAWER bû
Di mihrê de li hev wer bû
Bi nîşana xwe bawer bû
Di fitrakê giriftar im
Çeleng û jîrek û têz e
CELADET vêge ew rêz e
Ziman û şêwe parêz e
Bi seyda re tebakar im
Ji endamê dibistan e
Tenê murxê gulistan e
Li dora wî piristan e
Digel wî hemdem û yar im
Li goşê bîr û zanînê
Di ferhengok û azînê
Bi endazî diraçînê
Li wê kamê xerîdar im

Enî jor û qelemgêr e

Sipas û aferîn jêre

Dijî dijmin ez im pêre

Li dengê wî hewadar im

Li baxê rist û awazî

Bi raman û qelembazî

dibînim wî bi ustazî

Ji bo mafî nigihdar im.

**Ehmedê Şêx Salih**

Cizîrê-Eyndîwar/1991

## Ji Dilawerê ZENGÎ re

Mizgîn li te be Cegerxwînê Kurd

Seydayê nemir, zana û rêber

Warê tu lê bû, nemaye xalî

Di pey te îro, maye DILAWER

Şehr û bajarê tora gelê Kurd

Nemaye vala, bêkes û xwedî

Barê te'y giran, daye milê xwe

Şopa te îro, ewî daye ser

Seyda de rakev, bê derd û bê kul

Ala te îro wa hildaye jor

Xortê çeleng û jîr û hinerbaz

Şahê evînê li textê Keşwer.

**Seydayê Tîrêj**

**Cizîrê/Hisiça** **22/6/1985**

# Dilawer…

Hey Dilawerê ZENGÎ   Lawekî çak û şengî
Hem tu comerd û zanî   Hem tîkoş û lehengî
Girnas û dilawerî   Ji bo welat perwerî
Îro ji gelê Kurd ra   Hozan û rewşenberî
Kurd bi hewcî wek te ne   Ên wekî te çande ne
Kurd di şevên tarî da   Li ber ronahî we ne
Gelê Kurdê pehlewan   Mabûn ne xwendî nezan
Gelê Kurd zana kirin   Xortên wekên te hozan
Gelê Kurd raketi bûn   Sed salan paş keti bûn
Bindest kevneperestan   Bend bend bihevketibûn
Ji ber dijmin zan kuştin   Heçî ên nezan hiştin
Xwe firoş kirin padşah   Wan Kurd bihev dan kuştin
Hozan rabûn ban kirin   Gelê Kurd şiyar kirin
Kurdan riya çewt berdan   Wan riya rast naskirin
Yek Cegerxwînê nemir   Wî bi rista xwe şerkir
Kirk ji dest xwe berneda   Wî nivîsî heya mir

Yek ji wan Osman Sebrî    Zanê manî nemirî
Li pişt mê xema mexwin    Zanyarî ezber kirî
Tu û seydayê Tîrêj    Hûn du devên hingivrêj
Hûn di pê Cegerxwîn ra    Şewq didin wek gilawêj
Em milên xwe bidin hev    Binvisînin roj û şev
Wek Cegerxwînê nemir    Bê çewtî badan û rev
Hozanên li çar birran    Ji Sor û Lor û Goran
Ji Badîn û Zaz em tev    Hilgirin barê giran
Hevalê min Dilawer    Ez dibêjim bi bawer
Kurd nagên armanca xwe    Bê tore û rewşenber
Heçî gelê bê hozan    Wê tim bimîne nezan
Ne şiyar û raketî    Bindest, hejar û xizan
Ê hozan û tore bê    Dibê yara wî hebê
Nizanê binêvêsê    Di evînê wernebê
Ji eşqê bûm Bêbuhar    Ez pir geryam war bi war
Kurdistana xwey rengîn    Min jê rindtir nedî yar.

**Bêbuhar   (Yûsifê Berazî)**

## Diyarî ji bo helbestvan û torevanê mezin Dilawerê ZENGÎ re.

**Ebdurehîmê Mûşî**

Ji deva gul dibarin
Bi pênûsa wêjekar
Xortê leheng û zanyar

Dirêse derdê xedar

Heta bihara me bê
Bêje tu wek bilbila

Saet xweş be Dilawer
Te pêtek berda dila
Ronakbîrê, rewşenbîr

Birêje derd û kula

Silavên xwe dişînim

Bi derya baxê gula

Tu gewherek biha ye

Ey ezîzê wênedar

Destbirakê xoşewîst

Tu pir ciwan e, kubar
Tu wek Cegerxwîn şêr e
Polat in dil û ceger
Belê mêrxas gişt şêr in
Ji ber ku zehf bi wêr in
Ne wek hinek xewêra
Nezan in, an jî newêr
Hewl didin wekî mîra
Ji bo azad'ya xweser
Ta'j koletî rizgar bin
Natebitin ew yekser
Rê ya gel ronî dikin
Bi wan Helbestên ramyar
Ne ku pesnê te didim
Di te da pir in gewher
Dilawer xortê Zengî
Li ser welat tu bengî

Vê Helbesta'm dîyarî

Lê hinek ma dereng î

Ez jî wek cenabê te

Bûme bilbilê şeyda

Bindestî dil dihêre

Derd û kul lê bûn peyda

Wek Cegerxwîn gotî ye

Divê em rizgar kin war

Bibîrtînim ez „Seyda"

Hesret pêr çû xaka sar

Em ê mizgîn bidin wî

Roja em bibin rizgar

Welatê me wêran kir

Sitemkar dikin fişar

Di bin zilma zalim de

Stûxwarin hemû yar

Rabin hûn hemû leheng

Di cîhanê bidin deng

Ji bo ku em azad bin

Divê hemî bibin yek

Di bin sîwana welat

Kom bin nemînin dereng!

Di  cîhana  bêfedî

Em in îro ne rizgar!

Lewra gişt penaber in

Manin em bê cih û war

Yek bi yek em dimirin

Bi hesreta dost û yar

Kulmek lêxin li zilmê

Bes e! Ji zilma neyar

Her roj ew me dikujin

Wan zalimên koledar

Divê  ji  holê  rakin

Êdî em zilma zordar

Heta kengê bindestî?

Bes e! Fîxan û hewar!

Rom û fêris, ecema

Li me xistin dor bi dor

Me kirin Qebra tarî

Van zalima qor bi qor

Pesta ku gelê me dî

Fîxan çû ezmanê jor

Cîhanê çavê xwe girt!

Navîn Kurdistana sor!

Welat bi xwînê avdan

Wek laleyan kirin mor

Ji bo Libya çarçav in

Ji bo kurda ker û kor!

**Almanya, 23.03.2011**

## Ji Dilawerê Emê re (ZENGÎ)

Qebqeba Kewê Gozel
Ji mêj da, ta ji ezel
Me sondxwarî bi Furqan
Heta em herin mezel

Bernadin em azadî
Rêber Şêx Seîd, Qadî
Tu wext namirin Serwer
Dijîn di dil ebadî

Dema birayêm xweş be
Bira Tu'b xeml û rewş be
Tu her hebî Dilawer
Dil û cergên te geş be

Silav, rêz û giramî
Tu her bijî b'aramî
Birayê ezîz, kubar
Dilawerê Zeng Emî

Mij ter nivisî helbest
Bi raman û fikr û dest

Destbirakê kurdewar
Te li min rakirî best

Min girt destên biratî
Bi dostî, bi hevaltî
Di rêya azadî de
Dilawer Tu b'xêr hatî

Bilbil im ez Dilawer
Dixwînim li seranser
Mêrekî bi xîret im
Ji bo azadya xweser

Li ser Gulê dixwînim
Dil bi kul û evîn im
Heta azadya me bê
Xewê çava d'revînim

**Ebdurehîmê Mûşî**
**Almanya, 21.05.2011**

# BİLBİLÊ KURDİSTANÊ

Bes e bikî Tu Fîxanê
Ey Bilbilê Kurdistanê
Te cîgerê min peritand
Wekî mîsala biryanê

Zarê te sêva l‘ dikanê
Dengveda heya Îranê
Têrnabim ji awaza te
Ey Sorgulê dibistanê

Xweda bide emrê dirêj
Me azadke j‘ zilma qirêj
Xwe biparêze Dilawer
Neşewtîne wekî kirêj

Min bihîst fîxana Bilbil
Birîndarim birîna dil
Wele te dilêm peritand
Dihelim ez ji nava dil

Kesê pêre parvekim derd
Nîne yekê wekî te merd
Di dilê min de şêrînî
Tu her bijî biray' comerd

**Ebdurehîmê Mûşî**
**Almanya 05.12.2011**

## **Dilawer Tu  Ş a `i r î**

Dilawer Tu Ş a i r î
Di bin zilma gawirî
Zilma zalimê xedar
Dîsa dilê min b i r î

Xema dilê min xwarî
Ji pesta wî barbar î
Ewan kafirên bêđîn
Cîhan li me kir t a r î

Aqûbeta xwînxwara
Li serê hemû hara
Mitleq tê dawiya wan
Wan wawik û keftara

Dema fersendek çêbû
Hûn azadkin wî warî
Eger rêkî j‘ wer nebû
J‘ holê rakin wî harî

**Ebdurehîmê Mûşî**
**Almanya**

## Ji bo Dilawerê Zengî

Baqê gulan jîna dil e

Zarşiranî banga dil e

Zêrîn sîmpel rewşa dil e

Azadî daxwaza dil e

DILAWER hevalê jînê

Reng dida rewşa civînê

Bijartin navê evînê

Qelem ji gerdena Zînê

**Birayê we**

**Qehar Silo**

**Qamişlo 18.11.2016**

# Diyarî ji bo Dilawerê Zengî

Min bibûre ger nikarim bême serdanê bira

Ez bi hêvî me cîhan bo te bibî find û çira

Lê ezê qefdek gulê sor kek DILAWER rê bikim

Vêgre çend malik ji hestê xwe bihûnim ji te re

Zû tu rabî ser piyên xwe êş û azar dûr kevin

Rewşa tey çak û durist tim doz û omîd ji me re

Vegerî kar û xebatê têkoşîna xwe bikî

Tim hebî bona neviyên xwe ji van qîz û kura.

**Hadî Behlewî**

09-02-2017

Qamişlo

**Kurtejînenîgariya Dilawerê ZENGÎ:**

*Ew bixwe ji xelkê Kurdistana Bakur e, ji (Qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik), û ji êl û eşîra Dumila ye.

*Di dema şerê Dewleta Osmanî û Qeyser de, û ji ber sedemên ramyarî yên wê demê kalkê wî (Mihemedê ‘Emê) tevî malbata xwe ji gundê xwe derdikevin û berî didin binya xetê. Bi rê de, û li gundekî ji gundên Wêranşehrê Mihemedê ‘Emê dimre. Lawên wî (Isma’îlê Mihemedê ‘Emê û birayê xwe Mihemed) meşextî binya xetê dibin û li bajarê Amûdê bicî dibin.

*Dilawerê Zengî, piştî şewata Sînema Amûdê bi heşt mehan tê ser rûyê dinê. Di sala 1961-ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinê.

*Ji ber rewşa xizanî û feqîrtiyê xwendina xwe ya bilind kuta nekir. Lê, xwe ji xwendina pertûkan û çûn û hatina linik mirovên rewşenbîr, siyasetmedar û zanayên Kurd û civatên wan bêpar nekir .

*Di sala 1979-an de, li Amûdê bavê wî diçe ber dilovaniya Xwedê, di wê salê de dest bi nivîsandina helbestan dike.

*Li ber destê diyeke welatparêz û miletperwer mezin dibe. Evê diyê (Ferîde Elî) akameke (bandûreke) pir mezin li jiyana wî ya nivîskarî û ramyariyê dike. Diya wî Ferîde Elî gelek zarok ji nav agirê sînema Amûdê xelas kirine û bi navê diya Pakrewanan tê naskirin.

*Bandûra Şêxê welatparêz û miletperwer (Şêx Sedredînê bavê kal) pir lê dibe, û li ber destê wî dest bi nivîsandina Kurdî dike.

*Du salan li gundê (Girê Sor) mamosteyî dike.

*Di sala 1979-an de, li ber destê seydayê Tîrêj hînî nivîsandina helbestê dibe, û ji wê rojê de heta roja koçkirina seyda hevaltiya wan berdewam kiriye.

*Di sala 1980-yî de, ji neçarî berê xwe dide bajarê Şamê, û li Zangoya Şamê kar dike. Piştî heşt salan ew dûrî karê xwe dikeve. Ji wê rojê de, xwe ji nivîsandin, lêkolîn û xebatê re vala dike.

*Di sala 1983-an de, li ber destê Osman Sebrî hînî nivîsandina serbest dibe. Ji wê rojê de, li dora deh salan, têkilî di navbera wan de berdewan dibe ta ku Apê Osman ji nav me koç dike.

*Li bajarê Şamê gelek qursên fêrkirina zimanê kurdî li nav kurdên Şamê lidar dixe, û bi sedan xort û keçên kurd fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dike.

*Di warê ramyarî û siyasetê de, li dora 35 salan kar kiriye, û di vî warî de gelek keda wî heye.

*Di sala 1987-an de, Rewşen Bedirxan nas dike.

*Piştgiriya Rewşen Bedirxan di wergerandin, amadekirin û weşandina çend pirtûkên wê û yên malbata wê de kir. (bîranînên Salih Bedirxan. Name bo Mustefa Kemal paşa. Mîr Bedirxan. Û....hwd)

*Di sala 1991-ê de, piştî serîhildana Kurdên başûr, diçe Kurdistanê û li wir çend semînerên rewşenbîrî û toreyî girêdide.

*Di hin rêdaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dike.

*Ji bilî nivîsandina lêkolîn û helbestan, karê rojnamevaniyê jî dike. Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de nivîsandiye û dinivisîne.

*Gelek dîwanên helbestvanên Kurd ên navdar ji tîpên Erebî veguhestine Latînî û pêşgotin ji wan re nivîsiye, ji wan: (Seydayê Tîrêj: dîwanên wî: Xelat, Zozan û Cûdî), (Seydayê Bêbuhar: dîwana wî: Zindan)...û du dîwanên helbestvan Ebdurehmanê Mizûrî (Ji evîna çirayên kevin û li xelkê tehlê li min şêrînê). Li dora (200) pirtûkên li ser tore, çande, dîrok, û folklorê Kurdî li Sûriyê dane weşandin.

*Di sala 1985-an de, jin aniye. Sê kur û keçeke wî hene: (Royar, Rodî, Ronî û Rewan).

*Di sala1999-an de, ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li Başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di 12/7/2000-an de, li ser navê Komîta (Xelata Osman Sebrî) diçe bajarê Enqerê û xelatê pêşkêşî prof. Ismaîl Beşikçî dike.

*Di sala 2004-an de, li ser navê Komîta (Xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide xanima hêja Danyêl Metran.

*Di sala 2008-an de, li ser navê Komîta (Xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide mamosteyê gewre Munzir Elfedil.

*Di sala 2011-an de, careke din ji hêla Rojnameya Mîdiya, ya ku Partiya (YNDK), li Başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di sala 2012-an de, ji hêla komela Celadet Bedirxan ya çandeyî li bajarê Qamişlo hate xelatkirin.

*Di sala 2013-an de, ji hêla komela Şawişka li bajarê Qamişlo, hate xelatkirin.

* Gelek caran serdana başûrê kurdistanê kiriye, û ji aliyê serokê kurdistanê Mesûd Barzan û Celal Telebanî û gelek serkirdayetiyên partî û rêxistinên siyasî û rewşenbîrî li başûrê kurdistanê ve dihate pêşwazî kirin.

*Têkilî, danûstendin û hevaltiya wî bi van navdaran re pir xurt bû: Seydayê Tîrêj, Seydayê Cegerxwîn, helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), ronakbîrê mezin Osman Sebrî, wêjevana gewre Rewşen Bedirxan, dîrokzan Hesen Hişyarê Serdî, helbestvan Keleş, helbestvan Hamid Bedirxan, helbestvan Umerê Lelê, Zimanzan Ehmedê Palo, helbestvan Hadî Behlewî, zimanzan Rezoyê Osê, helbestvan Mihemed Elî Heso, helbestvanê hêja Ehmedê Şêx Salih.. û htd.

* Berhemên wî di warê Helbest, Çîrok, Ziman, Dîrok, Wêje, Folklor û wergerandinê de, li dora (35) pirtûkan weşandine. Gelek pirtûkên wî destnivîs hene..

*Ji sala 2013-an ta bi 2017-an ew serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriyayê ye, Hîn jî, li ser serê karê xwe ye.

**Berhemên Dilawerê ZENGÎ yên çapkirî ev in:**

*__Mem û Zîn, Ehmedê Xanî__, Veguhestina tîpan ji Erebî bo Kurdî, Dilawerê Zengî û Seydayê Tîrêj. Şam, 1984

*Dîwana (**Pêdarî**), Helbest. Sal:1985.

***Gramêra Ziman-**Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko -wergerandin-1990.

***Ji Mesela Kurdistanê- Celadet Bedir-Xan**-wergerandin-1990.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî **(Ji evîna çirayên kevin**) veguhestina tîpan 1991.

* Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (**Li xelkî tehlê li min şirînê**), veguhestina tîpan 1991.

***Mîr Bedirxan:** Lutfî, wergerandina: E.S. Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ.

*Alîkariya Rewşen Bedir-Xan kir, di weşandina hin pirtûkan de, ji wan:

-Bîranînên min -Salih Bedir-Xan.

-Name bo Mistefa Kemal Paşa. (Celadet Bedir-Xan).

-Bîranînên Jinekê (perçê didiwan).

***Şerefnameya Menzûm-** Cegerxwîn-veguhestin ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî, û lêveger, ravekirin û serastkirin.1997.

***Bîranînên Celadet Bedir-Xan-** komkirin û wergerandin bo zimanê Kurdî.

***Ez û Agir**- Dîwana helbestvan Hizrevan-Veguhestina tîpan ji erebî bo latînî- 1998.

***Stran, berf û baran** -helbestvan Mûeyid Teyib Veguhestina tîpan ji erebî bo latînî.

***Bedirxanî di Cezîra Botan de-**Malmîsanij-wergerandin: Gulbuhar Bedir-Xan û D.ZENGÎ. 1998.

***Berî Heyv Hilê** -çîrok- wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebî. Ji weşanên Mîdiya-Erbîl. 2001.

***Qedrî Can-Helbest. Gotar. Çîrok û wergerandin-** amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Erebî). Çapxana Aras, Hewlêr 2001.

*Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Erebî-2001.Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

* Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral.

*Şerrên Sasûnê -Osman Sebrî-.komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral. Careke din li Istanbol, weşanxaneya Pêrî, 2005- hate çapkirin.

*Dîroka Kelepora mîrnişîniya Botan. –Mele Xelefê Bafî-Veguhestina tîpan. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*Qedrî can -helbest. Gotar. Çîrok û wergerandin- Amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana komal, Istenbol-2004. Careke din ev pirtûk li çapxana Emîral, Beyrît-Libnan. 2005-an de hate çapkirin

*وثن للعشق Dîwanek ji helbestan- Wergerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî. Weşandina Dar -Kîwan-Şam -2005.

*Mewlûda Pêxember –Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral. 2006.

*Serpêhatiyên Kurdan-Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût- Libnan. Çapxana Emîral.2009. Di sala 2010-an de, ev pirtûk hatiye wergerandin bo zimanê Erebî, digel nivîskar Tewfîq Huseynî -Şam.

*Muxtarat (Lîqaat we Hîwarat), D. Zengî, Perçê 1-ê û 2-an. Beyrût-Libnan.Çapxana Emîral. 2009.

*Etyaf El-Madî, Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.2009.

*Bînahî- (Gotar û Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), D.Zengî, Beyrût – Libnan. Çapxaneya Emîral.2010.

*Ebdulrezaq Bedir-Xan, wergerandina D.Zengî, Beyrût - Libnan 2010

*Bîranînên Celadet Bedir-Xan. Komkirin û Wergerandin: D.Zengî. Bi herdû zimanan /Kurdî-Erebî/. Çapxana: Emîral. Beyrût-Libnan. Çapa: didiwan. 2010.

*Çîrokên Kurdî, Danheva: Rojê Lîsko, Wergerandin ji zimanê Kurdî: Tewfîq Huseynî û Dilawerê Zengî, Şam, 2010.

*__Ji Wêjeya Dozê__. Amadekirin û komkirina D.Zengî û Ehmed Şihab. Elmanya- Berlîn- 2011.

*__Osman Sebrî.__ (Jiyan, Tekoşîn û Berhem), Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana: Emîral.Sal: 2012. Bi zimanê Kurdî-Erebî.

*__Çîroka alaya Kurdî__. Qamişlo. 2012.

*Pirtûka (**Wêjeya Kurdî- Di navbera Rastî û hêviyan de**)- Daner: D.Zengî Qamişlo, 2014-an.

*Pirtûka (**Kurd û Kurdistan**) Daner: D.Zengî. Qamişlo, 2015-an.

*__Nivêjên Êzîdiyan-__ Celadet Bedirxan- Veguhestina tîpan ji erebî bo latînî: D.Zengî- Qamişlo, 2017

*__Xwendina Kurdî__, Kamîran Bedir-Xan. Wergerandin bo zimanê erebî: D.Zengî. Qamişlo 2017

*__Rewşen Bedir-Xan__, (Jiyan û Berhem). Dilawerê Zengî, Qamişlo 2017

*__Ji Xunava Bîranînan__, (Dîtin û Hevpeyivîn), Qamişlo 2017

# Naverok


-Pêşgotin..................................................11

-Em û zimanê me!..........................................17

-Dîroka zar û zimanê Kurdî..............................25

-Danasîna kovara Agahî...................................39

-Destpêka avakirina komele û..........................47

-Danasîna komela Xoybûnê..............................71

-Celadet Bedir-Xan .........................................87

-Qedrî Can (1911-1972)..................................103

-Osman Sebrî (1905-1993)..............................135

-Rewşen Bedir-Xan (1909-1992)....................171

-Seydayê Tîrêj (1923-2002)...........................185

-Yûsifê Berazî -Bêbuhar- (1931-2009)...........197

-Hesen Hişyarê Serdî (1907-1985)..................207

-Ismaîl Umer (1947-2010).............................227

-Ne dikin û ne dilên em bikin?!......................239

-Şêweyên namo û ne naskirî..........................251

-Wêje vejandin e............................................257

-Kelepûr, nasnama gelan e............................261

-Çirîska dawîn..................................................265

**Helbestên ku diyarî min bûne**

-Ji Dilawerê Zengî re....Ehmedê Şêx Salih.....273

- Ji Dilawerê Zengî re...Seydayê Tîrêj............277

-Dilawer ......................Bêbuhar......................279

-Diyarî ji bo ..............Ebdurehîmê Mûşî.......281

-Ji Dilawerê Zengî re... Ebdurehîmê Mûşî......287

-Bilbilê Kurdistanê..... Ebdurehîmê Mûşî.......289

-Dilawer tu şa'irî......... Ebdurehîmê Mûşî.......291

-Ji bo Dilawerê Zengî.. Qehar Silo.................292

- Diyarî .....................Hadî Behlewî...............293

-Kurtejînenîgariya Dilawerê ZENGÎ...............295

-Berhemên Dilawerê ZENGÎ yên çapkirî........301

-Naverok.........................................................307